# Fîl Hemdî

**Azîz Nesîn**

Werger: Mustafa Aydogan





Hey efendîno!...
Ma min kiş kiriye mirîşka kê ji we ku hûn ew qasî li min hatine xezebê.

(Ji çîroka bi navê Cenewarê Babialiyê.)

Azîz Nesîn · **Fîl Hemdî**

Weşanên Doz
Pelîn · Rêza Edebiyata Kurdî - 3
*Çîrok - 1*

**Fîl Hemdî**
**Azîz Nesîn**

*Werger*
Mustafa Aydogan

*Pergala bergê û rûpelan*
Fuat Dündar

Wêneyê Bergê
Erkal Yavi

*Çapxane*
Ceren Matbaacılık

*Çapa Yekem*
1999 Gelawêj, Stenbol

ISBN 975-6876-10-7

*Doz Yayınları*
*İstiklal Caddesi*
*Orhan Adli Apayadın Sk.*
*Oba Apt. Kat: 4*
*80050 Beyoğlu - İstanbul*
*Tel/Faks: (0212) 2925605*
*E-mail: doz@turk.net*

Azîz Nesîn

# Fîl Hemdî

Werger
Mustafa Aydogan

Doz

# Bazarek

Ger kincên kevin a niha bi rexbet bûna, bazara kevinan dê di nûrê de bima.

Ger we mîna bazirganê zigurt dest bi tevdana defterên kevin kiribe, hûn ê heq bidin vê gotinê.

Gava hûn ji serê kolanê dengekî ku dibêje "ez tiştên kevin dikirim" dibihîsin, dilê we dike gurpe gurp, hêviyek bi we re çêdibe.

Ez ji van dostên rojên xerab pir hez dikim.

- Begefendî, îro tiştek heye?

- Qapût heye, tu ê bikirî?

- Demsal derbas bû, begê min. Ma kinc tune ye?

Ger hûn çakêt bidinê, ew ê li şalan bipirse, ger hûn şêl bidinê, ew ê li êlekan bipirse, ger hûn êlek bidinê, ew ê li şewqeyan bipirse û hîn di destpêkê de hemû hêviyên we dişikên.

Ji bo ku cîran mîran bi kincên me yên kevin nehisin, em yê kevinfiroş tînin hindur.

- Şalek heye, ma tu nakirî?

- Ka em lê binihêrin...

Radihêje şêl û ji bo li ber ronahiyê lê binihêre, di derî re derdikeve.

- Were hindur!

Tê hindur. Bi vî alî û wî alî de diqulipîne û dîsa xwe çeng dike kolanê.

- Li hindur lê binihêre, yaho.

Nêviyê laşê wî ji binderê bi hindur de û nêviyê din jî li derve, li devdeling, nav û navrana şêl dinihêre.

- Ma nabe ku tu li hindur lê binihêrî?

- Hindur tarî ye.

Em lampeyan vêdixin, perdeyan didin alî, pere nake. Mirov dibêje, qey ji bo ku me li taxê rezîl bike, sûnd xwariye.

Li wê mala hember keçikek heye. Navbera we û cîranê ku xaniyê wî bi yê we ve ye, baş e. Yê di xaniyê din de, dewlemendekî bazara reş e û yê li aliyê çepê, malbateke ji paşgotiniyê hez dike... Ma yê kevinfiroş vana fêhm dike?

Bi herdu devdelingên wî şalê ku du saet berê çîp û hemû eybên we dinixumandin, digire û radikişîne. Her ku ew şêl dixe himbêza xwe û radikişîne, ez dibêjim, qey ez ji navê û berjêr de tazî me, ez paş û pêşiya xwe bi kefên destên xwe vedişêrim.

- Li hindur lê binihêre, yaho!

Begê min, em mal dikirin. Bi çavgirtînkê nayê kirîn. Em lê dinihêrin, bê tu qul mul tê de hene, riziyayî ye, qetiyayî ye.

Dîsa xwe çeng dike kolanê. Dawiya şêl tam dide pencereya keçika ku mirov jê hêz dike û ji hevdu vedike. Û mîna ku nîşanê bigire, çavê xwe dixe quleke şêl û ji wê derê li keçikê dinihêre.

- A... Vê dera bi qul e.

- Bi qul mul, têkeve hindur, lo!...

Nayê hindur, tew ji bo îsbat bike ku şal biqul e, tilîya xwe di wê qulê re radike û dilivîne. Ma qey eyb e, xurîka min tê, ger bi şalê min jî bileyizin, xurîka min tê. Keçika di pencereya hember de dikene û ji tirs û fediyê xwêdana sar bi min dikeve. Yên dibihîsin ku ez û yê kevinfiroş di ber hevdu de didin, li ber pencereyan kom dibin. Keçika li hember dikene, jinik dikene, keça miteahîd dikene, pesikanê cîrên dikene. Ji her pencereyekê pênc serî bi hevdu re dirêj dibin. Wey qeda pê

keve!...

- Kuro, te ez rezîl kirim, were hindur, lo!

Beskura yê kevinfiroş di destê min de, destê wî jî bi devdelingê şêl ve û em di binderê de hevdu dikişkişîne.

- Dirêj meke, tu ê çi qasî bidî?

- Ji bo xatirê te yê hêja... Ew jî ji bo te... Du lîre... Bi namûs ji min re deh quriş jî namîne. Lê meqsed kirîn û firotin e... Du lîre.

Wey xatirê te serê te bixwe! Ez bi zorê wî ji ser serê xwe diqewirînim. Piştî bîstikekê, kevinfiroşekî din tê. Ew jî piştî ku kêfa cîran mîranan baş tîne, lîre û nîvekê tê dide. Yê sisiyan, fîyet dadixe lîreyekê. Hemûyan tif bin zimanê hevdu kiriye. Her carê, piçekî din li bihayê şêl dişikînin.

Asoxî, piştî bîstikekê dengê kevinfiroşê yekem tê bihîstin:

- Ez tiştên kevin dikirim!

- Were, were!

Xwe vir de û wê de dibe û delalî dike û tê.

- De ji te re bikire.

- Bi çi qasî?

- Ma bi çi qasî heye? Te bîstika din, du lîre tê da...

- Bi duduyan? Tahta te lê rî, baranê şuşt, begê min. Ew bîstika din bû. Min ehmeqî kiriye.

- Niha dê çawa bibe?

- Piyase ketiye, ez ê pêncî qurişî bidim te.

- De ka bide.

- Ger tu bixwazî, ez ê çeqçoqan bidim te. Çeqçoqên kincan... Çawa ye?

- Ka wî pêncî qurişî bide min, yaho...

- Ger tu bixwazî, ez ê sênikan bidim te, qedehan bidim te.

- Qeda Xwedê bi te keve, tu çi didî, bide, tu wî pêncî qurişî

bide.

Dîsa radihêje şêl û di derî re derdikeve. Herdu devdelingan radikişîne û çavê xwe dixe quleke minasib û dest bi temaşeya pencereyên hember dike.

- Têkeve hindur!

- Li hindur xuya nabe.

Ez hişk bi devdelingê şêl digirim, devdelingek di destê yê cihû de û yek jî di destê min de ye. Ha ha, çîîîr!... Ez ji binderê digindirim hindur û yê cihû digindire orta kolanê, di destê heryekî ji me de, perçeyek dimîne. Dengê tîqe tîqê ji pencereyan bilind dibe, li taxê kêf û şahiyek dest pê dike.

Yê kevinfiroş ji cîhê ku gindiriyê, dipeyive:

- Te ez betilandim, niha nema pêncî jî dike. Ez ê bîst û pêncan bidim te.

- Bide... Bide, ka bîst û pêncan.

Ger weha biçe, em ê şêl diyariyî wî bikin. Rezîlbûna me jî bi ser de...

Belasebeb nehatiye gotin ku feqîrî rezîlî ye.

# Maşaleh ji kirêdêr re

**"Bûyera di vê çîrokê de ji kevin de çêbûbû,**
***lê mixabin ne diyar e, bê çi qas ji kevin de..."***

Ezbenî, ma tu hereketeke weha bêexlaqî ji min hêvî dikî? Ez rica dikim, begefendiyê min î hêja, ne hedê min e, ez sermiyanê malekê me û xwedî zar û zêç im. Ez li vî welatî sermiyanekî weha me ku min qet ne bi alîkariya cîran mîranan, hemû bi xwêdana eniya xwe çêkirine. Tu carekê lê binihêrî, bes e, bibuhure, hemûyan jî mû ji min bernedaye.

Ma ez mirovekî weha me ku ji derveyî urf û adetan hereket bikim û bibuhurin li pêş çavên herkesî wê hereketê bikim? Min tu deverên xwe dernexistine û rê xelkê nedane. Ma mirov li zarok marokan qet tiştekî weha dike?

Li ba min derew tune ye, begefendî. Lê min bi destê xwe, heşayî civatê, hew hereketeke weha kir. Ezbenî, ez ê sedemên wê jî pêşkêş bikim. Ger tu heq nedî vî feqîrî, ez li ber cezayê xwe sekinîme. Ger ez meseleyê ji serî heta binî nebêjim, nabe ezbenî, bibuhure, bêguman sedemek hebû ku min ew hereket kir.

Xwedê wî bi rehma xwe şad bike, ji rehmetiyê bavê min li Zeyrek Yokuşê wêranxaneyek mîras mabû. Ji sê sitûnên vî xaniyê ji textan yek jê a min bû. Yek jî a birayê min bû. Bila situyê wî bişikê. Li Defterdariyê memûr e. Li ser sitûna sêyem pevçûn hebû. Bila cîhê wê bihuşt be, piştî ku xweha min emir da haziran û me ew veşart, sê zarokên bêkêr û sêwiyên apê me li ser vê sitûnê qet li hevdu nedikir.

Haaaa... Bibuhure, min ji bîr kir ku ez xwe bidim naskirin.

Ma aqil di serî de maye, ezbenî. Ev delalên ha, weleh ne êqil di serê mirov de dihêlin û ne jî fikirê... Di van rojên dawiyê de, kavilên min ew qasî belav in ku...

Ez koleyê we Hasbî me ku ev bîst û pênc sal in, li Gerînendeya Goristanan a Belediyeyê bi bîst û pênc lîreyên meaşê eslî dixebitim.

Feqîrxaneya min a li Zeyrekê pênc ode bû. Li du odeyên wê, ew birayê min î rezîlê heram rûdinişt. Welehilezîm, mêrik di destê jina xwe de pepûk bû. Ger hêja ba jî, begê min... Ji xêra Xwedê re, te jinik jî bidîta, ma jinik jî jin bûya, bibuhure, hotireke jinan e.

Jinik odeyan qet naecibîne. Çavên xwe bivê nevê, berdane odeyên ku em lê rûdinin. Ji bo ku huzûra me xerab nebe, em dibêjin:

- Kerem bike, were tu tê de rûnî.

Tê rûdine, çend rojên din careke din poşman dibe. Em salê çend caran di hindurê xênî de bar dikin.

Ezbenî jina min, ne ku ji ber pîreka min e, ez dibêjim, tu rastiyê bixwazî, ew xatûneke dilpak, milahîm û di halê xwe de ye. Tu pariyê wê ji destan bigirî, dengê xwe nake....

Ez rojekê ji daîreyê hatim, lê ezbenî, haho ez çi bibînim... Wê qahpika jinbira min cêriya te dide ber pihînan û bi awayekî ecêb lê dixe. Dest û lep, şîrmaq, pihîn, şimik, hutik.... Xwedê mirov bisitrîne...

Ez ê xwe bigihînimê, xwe bigihinîmê, lê ... Ez ê çawa xwe bigihînimê? Ez hema weha kuxiyam, min dikira bigota:

- Jinbira delal!... Jinbira delal!...

Lê ez negiham ku bibêjim, begefendî çawa bû ez jî nizanim, firaxa min a sifir a ku min firavîna xwe tê de biribû daîreyê çû aliyekî û çenteyên min î ewraqan çû aliyekî din... Min xwe li erdê, cêriya te be, li ba jina xwe dît.

Piştî wê ezbenî, ez ji te re bibêjim, min çi digot? Haaa... Ji wê rojê û vir de, min ruyê wî birayê xwe yê qebrax î bêşeref û yê jinbira xwe- Wey înşaleh ji nav jinbirayan hilê- ya jina wî nedît. Xwedê bela wan bide wan...

Begefendiyê min, ez dirêj nekim... Di du odeyên xênî de, em rûdinin. Em ne ew qasî qelebalix in jî... Xulamê te be ez, cêriya te be pîreka min, xulamê te be kurê min, kola te be keça min û dişa min... Min pisîk ji bîr kir. Pisîka me jî... Hemû malbata me ew qas e. Li odeyên din, kirêdar rûdinin. Li odeyekê memûrê gumrukê Zatî Beg û kufletên wî, li yeka din Simaîl Efendiyê mêwefiroş û jina wî, sê zarok û xwesiya wî rûdinin.

Gava mirov ji derî dikeve hindur, ferşikên maltayê xuya dibin, hêla devera kevirî ya rastê jî metbex e. Li odeya binî Safînaz xanim rûdine. Li odeya din, malbata Necatî efendî ya ji şeş kesan pêkhatî rûdine.

Çend caran ji Belediyeyê, memûrên ji avahiyan berpirsiyar in, hatin. Raporên ku dibêjin; wêranxaneya me ji ber nifûsa xwe ya zêde nikare xwe bigire, nivîsîn. Wan dê em ji xênî biavêtana. Eyb e ku mirov pesinê xwe bide, bi qasî ku ji me qediya, me dilê wan xweş kir. Weha ye, ezbenî... Ma hûn ji bo çi guh didin hejmara me? Ger hûn her bîst û neh kesên ku li vî xaniyî rûdinin, li qantarê bixin, bi qasî heyşt zilaman nayên... Em wek balona ku hindurê wê bi hewayê hatibe dagirtin, pir zeîf in. Ya rastî, em di qeyda xwe ya nifûsê de însan tên xuyakirin. Êh, em çi bibêjin, piştî ku wan ew paye da me, divê em jî dengê xwe nekin. Ma ne weha ye?... Qey em arzûhalekê nadin û qeyda xwe ji mirovatiyê xerab nakin...

Hatin û çûn... Hatin û çûn. Di dawiyê de, got:

- Ji we re deh roj mohlet. Heta deh rojan divê hûn ji xwe re li çareya serê xwe binihêrin...

Ger ev tiştê ku mirov jê re dibêje çare, li ba Faîq Efendiyê etar heba, mirov ê bigota, ka pêncî dîrhemî... Çare li kî derê?

Ma mirov bibêje ya Xwedê, xanî tê peydakirin? Em zar û zêç li rêyan pahn bûn... Ji daîreyê îzinê nadin. Ger bidin jî ew ê carekê bidin, du caran bidin... Ma herroj îzin dibe?

Ez nizanim bê min behs kiribû, cêriya te be, pîreka min li Aksarayê çêbûye û li wê derê mezin bûye. Lê ji mizgefta Valdeyê û wê de, tu deveran nas nake. Tu dizanî, bê zarokên vî zemanî çawa ne... Keçikê û lêwik ji aliyekî destên xwe vemaltin...

Min ji xwe re got ku de Hasbî Efendî destên xwe vemale, kar ket situyê te. Haho begê min, ma xanî? Mirov nikare xwe nêzîkî wan bike. Çîroka gera me ya ji bo peydakirina xênî qet naqede. Hîn em li xênî digeriyan nedigeriyan, demokrasî hat welêt nehat welêt, azadî hat nehat, tam di wê gavê de, sibehekê ezbenî, tev qazme û bêrên xwe negirin ber derî? Mîrê min, ger cenabê te bî, tu ê çi bikî? Tu ê li ber wan bigerî. Em jî li ber wan geriyan.

- Ji bo Xwedê, nekin... Em giş evdên Xwedakî ne. Me tevî zar û zêçan bera kuçan nedin...

Got:

- Nabe... Emir carekê hatiye dayin.

Hey ji dê şêrîntirno û ji bav qenctirno, lê fêhm nakin.

Ji nişka ve, hişê min hat serê min. Carinan ez weha dibim, ezbenî hişê min ji nişka ve tê serê min.

Min got:

- Hîn mohleta we daye me, neqediyaye.

Lê ezbenî, niyeta ên ku vê carê hatibûn, cuda bû... Xwedêgiravî van deveran ne ji bo ku li ber hedimandinê ne, lê ji bo bikin mêrg hildiweşînin.

Ruhê min, mîrê min ezbenî, ma mirov dikare bi belediyeyê

re derxîne serî? Ger carekê niyeta hilweşandinê bi wan re peyda bû, ew ê bibêjin li ber hedimandinê ye û hilweşînin, ew ê bibêjin ne li ber hedimandinê ye û hilweşînin, ew ê bibêjin, mêrg e û hilweşînin, seha tirapêlk e û hilweşînin... Wê hilweşînin û hilweşînin. Ger bi sedema hedimandinê bê hilweşandin, ma çi nayên hilweşandin... Hemû jî maşaleh wek Birca Pîzayê bi kêlekê de xwar bûne, sipîsaxlem li cîhê xwe ne. Ma tiştek hema piçekî bi kêlekê de xwar bibe, divê bê hilweşandin?...

Her çi qas me got ku hûn li sekinandina xaniyê me nenihêrin, maşaleh wek hikûmetê saxlem e, lê kî guhdar dike, begê min!

Em çûn ba qeymeqêm ku em xwe biavêjin dest û lingên wî. Me qeymeqam di sê rojan de, li meqamê wî peyda kir. Min zar û zêç wek leşkerên teftîşê li gora bejinê xistin rêzê. Ma nabêjin ku aqil ne di rîhan de, di seriyan de ye. Lawikê min î herî piçûk ket serî.

- Qeymeqam begefendî, Xwedê kêmaniya dewleta me û miletê me nede. Ma em di vê qiyameta zivistanê de, di vê sir û seqema dijwar de li kuçan bimînin?

Me got û perdeya ruyê xwe qetand. Qeymeqam zilamekî pir baş bû. Dibêjin ku dinya li ser qiloçê gê disekine, bi navê Xwedê, derew e. Li ser van mirovên qenc disekine. Belê ezbenî, min çi digot? Haaa... Qeymeqêm di destpêkê de got:

- Qanûn qanûn e!

- Helbet Qeymeqam Beg, helbet qanûn qanûn e. Baweriya me pê heye û em qebûl dikin... Hûn bixwazin, ne xaniyê me, hûn dikarin me bi xwe jî îstîmlak bikin û bikin mêrg.

Dibêjin peyva xweş mêr ji qulê dikişîne. Xwedê jê razî be, Qeymeqam beg wek ku piçekî nerm bû.

Got:

- Ji we re hefteyek mohlet. Em ji kêfan dîn bûn. Zar û zêç em bi pesin û diayan bi ken û reqisê bûn wek mendexaneyê. Ma êdî çavên min kar û daîreyê dibînin. Xwedê baweriya te bîne, di bîst û pênc salan de, ez rojekê bîst û pênc saniyeyan jî bi derengî neçûme daîreyê. Lê ya rastî, vê carê bila hikûmet gunehê me efû bike, ezbenî min dev jê berda, min dev ji daîreyê berda.

Xwedê kêmaniya wî nede, li daîreya me, bi navê Misbah Efendî memûrekî qeydkirinê heye. Wî ez şandim ba dostekî xwe, delalî, simsariya xaniyan dikir. Ez çûm ba wî kesî. Min bi gilî û gazin behsa rewşa xwe kir.

Got:

- Welehî kekê min î hêja, di vî zemanî de ji bo ên wek we xanî tune ne, belasebeb lê negere.

Xwîna min dawerivî mejiyê min. Baş bû ku xwîna min kêm bû û tişt bi min nehat. Min di tevaya jiyana xwe de, zerar nedaye gêrîkeke kulek jî.

Min bi wê hêrsê got:

- Bira, ji bo çi, ji bo ên wek me xanî tune ne... Ma em ne ji umeta Mehemed in? Em jî elhemdulilah misilman in. Eyb e ku mirov pesinê xwe bide, lê em jî ji vî miletî ne.

Bibihure Begê min, çi hat ber devê min, min got.

Delêl got:

- Ne xeyide, keko, yên wek min û te jî em xwe zilam dihesibînin û dipesinin, lê tu dibînî ku tu kes me naxe şûna zilaman.

Dû re, ji min pirsî:

- Ma tu diçî sînemayê?

- Sînema li ku?

- Tiyatro?

- Naaaa...

- Tu tu carî diçî maçan?

- Ez di emirê xwe de neçûme maçan.

- Tu rojê çend kîlo goşt dikirî?

- Eyb e ku mirov behs bike, ji meêş heta meêş.

- Ma tu piştî her xwarinê şêraniyê dixwî?

- Êh... Ger ez peyda bikim, ez serê sibehan bi qahweyê re nefsa xwe dibirim.

- Tu pirtûk û kovaran dikirî?

- Na yabo. Mehemediyeyeke ku mîrasa rehmetiyê bavê min heye. Ez carinan wê vedikim û dixwînim.

- Tu salê ji xwe re çend qat kinc dide çêkirin?

- Salê? Xwedê şahidê min be, ev şalê ku niha li min e, pênc sal berê ji bazara kevinan hatiye kirîn. Baş e ku Xwedê li gora dilê mirovan dide wan, pîreka min jî jina malan e...Ez sala yekem kincan li xwe dikim, ew sala duyem boyax dike, sala sêyem berevajî dike, sala çarem berevajiya wan careke din boyax dike, sala pêncem pîne dike, sala şeşem xera dike û ji lêwik re çêdike, sala heftem ger halê firotinê tê de mabe, difiroşe kevnefiroşan, ger nemabe, dike kevnik û bi kar tîne.

- Ma tu rojên yekşeman diçî plajan?

Êdî ji ber van pirsên beredayî, ez gêj bûm.

Min got:

- Birayê min ger ne eyb be, tu nexeyidî, ez dixwazim bipirsim, gelo tu ji bo çi hema her dipirsî?

Got:

- Te peyv vekir, min jî pirsî. Tu nizanî sînema çi ye, tiyatro çi ye, tu naçî plajan, nagerî. Tu bi hesreta şêranî û goşt î. Ê baş e, ka ji min re bibêjî, ma tu jî zilam î?

Weleh min got, qey dinya bi ser serê min de hilweşiya. Tu

nabêjî, ez çi zilamekî bêhiş im. Ger vî mêrikî jî neaniya bîra min, min ê xwe hîn jî zilam bihesibanda.

Min got:

- Bibuhure, birayê min î hêja, ez niha çi bikim?

- Tu ji bo çi ji min dipirsî? Ger melhema gurî hebuya, wî dê di serê xwe de bida... Di vî zemanî de, helal be ji yê ku ji heqê xwe derdikeve. Xwedêgiravî em simsariyê dikin û ji herkesî re xaniyan peyda dikin. Ka xanî li ku ne? Karê me ev e ku kî derkeve hember me, em wan bixapînin. Êh, em wek mêşa li ser qûna hespê jiyana xwe didomîne.

Min lê nihêrî ku nabe. Ez çûm ba delalekî din. Lê ezbenî, li vê dinyayê çi qas mirovên baş hene.

Delêl ji min pirsî:

- Tu xaniyekî çawa dixwazî?

- Bila sê-çar odeyên wî hebin.

- Bila metbex jî tê de hebe?

- Ê Begê min, tiştê ku ez dixwazim xanî ye, ne dikane... Ma xaniyê bêmetbex qet çêdibe?...

- Ma bila daşir jî hebe?

Tu nema bû ku min terbiyeya xwe xera bikira. Ev mêrik dê min dîn bike.

Min got:

- Begê min, ez azib bûma, bibuhure min ê qaîde bi kar bianiya, lê pênc nifûs...

- Tu elektrîkê jî dixwazî?

- Helbet.

- Serşok?

- Ger hebe, baş e.

- Kalorîfer?

- Êh, hey me daye nav, bila ew jî hebe.

- Tu apartmanê dixwazî, an xaniyekî bi serê xwe.

- Ne layiqî me ye, lê bila apartman be...

- Menzera wê?

- Ji bo Xwedê, bila ne devereke ku mirov ditengijîne be, ger kêleka deryayê be, em ê kêfxweş bibin.

- Hewadar...

- Ox, ox...

Ya rastî av ji devê min diçû...

- Bila nêzîkî keştî, tramway, sûk û bazarê be.

- Minasib... baş...

- Tu telefonê tê de dixwazî?

- Ez nizanim. Em çawa bikin, bila bi telefon be.

- Bila raxistî be?

- Bila qe...ezbenî, çi hebe ez razî me. Bila deverek hebe ku em tê de bisitirin...

Piştî ew qasî pirs û îfadeyan, mêrik çi bibêje, baş e?

- Bavê min, ka ew xaniyê ku tu lê digerî, li ku ye? Ma mêrik nebêje ku ka navnîşana xwe bidî min, ez ê li defterê binivîsînim?

Min got:

- Wey înşaleh çavên te birijin!

Min got, lê ji ber ku terbiyeya min destûr neda, min di hindurê xwe de got.

Min paş situyê xwe xurand û ez ji wira hatim? Ax Begê min, ez behsa kîjanî, kîjanî ji wan bikim? Xulamê te yî Hasbî li Stenbûlê deverek nehişt ku lê negeriya, ma taxa ku lê nehatiye gerîn, rêya ku lê nehatiye nerîn û kolana ku lê hatiye pirsîn ma? Tune, tune, tune...

Heye, lê tiştekî minasib tune ye.

Delalekî got:

- Xaniyek heye, kiriya wî jî erzan e, du sed lîre...

Hişê min ji serê min çû.

- Çii?.. Du sed lîre?

Mêrik got qey ez ji ber erzaniya kirê weha şaş mame, got:

- Du sed lîre, lê kiriya salekê jî pêşîn dixwaze.

- Êêêê?

- Du hezar jî çîk...

- Çi?

- Çîk... tamîr kiriye. Dû re, ji bo kirêdarên tê de ne derxîne jî... Tu dizanî ku kirêdarên vî zemanî heta ku avanta xwe nestînin, dernakevin. Xwediyê xênî ji te wî pereyî dixwaze.

- Heqê wî ye, ew ê bixwaze.

- Wekî din jî ezbenî, cenabê te jî pê dizane ku niha li gora qanûna nuh, kirê nikare bê zêdekirin.

- Belê?...

- Ew ê di kontratê de du sed lîreyî binivîsîne, lê mehê pênci lîreyî ferqa wê jî ji bo salekê çi qasî bike, dixwaze.

Hesabê min pir xurt e. Min hesiband, tam pênc hezar lîre... Xuya ye ku mêrik aqilê xwe wenda kiriye. Pênc hezar in ev... Bi gotinê hêsan e.

Min ji mêrik re got:

- Li min binihêre, birayê min, ma dirûvê zilamên xerab bi min dikeve?

Got:

- Estexfurulah.

- Te got qey ez, bibuhure ezbenî, pêzeveng, ticarê eroînê, an jî qaçaxçî me? Tu qumarxaneyên min tune ne... Ez ne kabzimal im, li tu deveran navê min ne qeyidkirî ye. Ma te fahm kir? Şikir ji Xwedê re, ew qas sal in ku ez bi şerefa xwe jiyame.

Got:

- Ji halê te xuya dibe, lê ez nizanim bê tu ji bo çi hêrs bûyî.

Min got:

- Ez ê çawa hêrs nebim, tu dibînî ku dest û lingên min wek pelên çilo dilerizin, sinirên min tev rabûn. Ma ez dişibim zilamên xerab? Xwelî li serê te be. Ma li ba zilamekî wek min î binamûs pênc hezar çi digere?...

Ez ew qasî pir hêrs bûm ku min negot bi xatirê te jî û min deriyê wî girt. Mêrik şaş mabû û her li dû min dinihêrî.

Ez qet ji bîr nakim, min wê rojê meaş stendibû. Meaşê min di bordroyê de, du sed kusur lîre ye, piştî bacê û tişt miştên din, di destê min de, sed lîre ya dimîne ya namîne. Heta ku ez digihêm malê, ez wî jî didim beqal meqalan, komirfiroş, qesab û mêwefiroş û beşekî deynan pê safî dikim. Çend qurişên mabin jî gava ez digihêm malê, zar û zêç wan ji min distîne. Bi vî awayî, tu tişt di destê xulamê te yî Hasbî de namîne û ez riq û rût dibim.

Vê carê, gava min meaşê xwe stend, min biryar da ku berî pere biqedin, ez ê li xênî bigerim. Tiştên ku Xwedê pê dizane, ez ê ji bo çi ji evdan veşêrim? Niyeta min ev bû: Min ê xaniyekî minasib peyda bikira û bi limêja sibehê re mal li erebeyekê bikira û ez ê bireviyama. Ger deriyên dikanan bihatana vekirin, êdî mala min dê bişewitiya. Hemû esnafên taxê dê bigirta ber derî. Em carekê bêyî ku tu kes me bibîne birevin, dû re Xwedê kerîm e. Dibêjin; deyndar ji kîsê xwe dixwe, em ê jî deynên xwe hêdî hêdî bidin.

Me li ser rêya tramwayê, dikaneke simsariyê dît ku bibuhure, bi qasî avdestxaneya me teng bû. Li ser camekanê tije îlan bû: "Xaniyê firotinê" "Qatê kirêkirinê" "Daîreya apartmanê", "Pansiyona vala", "Taqîbata her cûre ewraq", "Arzûhal tê nivîsîn","Dersên fransî û piyanoyê yên taybetî tên dayin", "Xwendekarên ji dersan mane, tê gîhandin", "Buroya kar peydakirinê"...

Min serê xwe hêdîka di deriyî re xist hindur:

- Bira, ma yê delal tu yî?

Min çawa got, mêrik li xwe girt û çavên xwe girtin û devê xwe vekir.

- Ezbenî, ezbenî! Li vira delal tune ye. Li vira resmen simşar heye!... Te fahm kir?

Defterek vekir:

- A va, qeyda me ya li odeya ticaretê, va sicîla me... Em bacê didin hikûmetê.

Heta ku xwe vala kir, peyivî.

Dû re ji nişka ve nerm bû û got:

- Bibuhure, li piyasayê qahwe peyda nabe, serê min diêşe. Ji ber vê yekê, ez piçekî esabî me. Li qusûrê nenihêre.

Min got:

- Estexfurulah, birayê min, ez te fahm dikim. Bike bire bir, biqêre!... Xwe rehet bike!... Ji bo xatirê Xwedê, tu ê hêrs bibî û bikî bire bir. Ma ger em bi ser hevdu de nekin bire bir, em ê bi ser kê de bikin bire bir, kekê min?...

Mêrik got:

- Ez spas dikim.

Bi qasî pênc deqîqeyan gilî û gazin kirin û qêriya.

Qet israr neke, ez nikarim bibêjim, bê mêrik çi got... Naaa... Min bibexşîne. Çi ji min re, serê mêrik dê têkeve belayê. Hem ezbenî, te ji xwe fahm kiriye, bê wî çi gotiye...

Ax ezbenî, ji hazira ne çêtir be, miroveki pir baş bû. Di vî zemanî de, gava mirov çav li miroveki weha baş dikeve, bi rastî, bi mirov ecêb tê.

Got:

- Xaniyekî tam li gora te heye. Ne pêşînat tê xwestin û ne jî avanta.

- Gidî, em bibînin.

Îlana li dîwêr nîşan da:

"Ji bo ku em xaniyan nîşanî mişteriyan bidin, pênc lîre pêşîn tê stendin. Ji bo xaniyên ku nayên ecibandin, berpirsiyarî nayê qebûlkirin!"

Min pênc lîre pêşkêşî wî kirin. Em ketin rê. Bi rê de, delêl digot:

- Xaniyekî piçûk, lê rehet e. Mirov dibêje, qey ji bo we hatiye çêkirin. Rast, bê nêrdewan. Hêwana wî dirêj û fireh, ode jî tam li gora dilê mirov...

Ez dirêj nekim ezbenî, em hatin apartmanekê. Em hilkişiyan qatê duyem. "Zirr, zirrr!..." Em li zîlê dixin, lê deng ji dîwêr te, ji hindur nayê.

Simsar beg got:

- Êh, em çawa bikin, ne li malê ne, em vegerin.

Min got:

- Gidî, ez di bextê te de me, birayê min î delal, ma tu xaniyekî din tune ye?

Got:

- Çawa tune ye? Heye, lê tu pê dizanî ku ji bo nîşandana her xaniyekî, em komîsyona xwe pêşîn distînin. Em jî debara xwe bi vê rêyê dikin. Em tabiî defterê ne, bacê didin hikûmetê.

Min berê jî behs kiribû, ji ber ku min wê rojê meaş stendibû, min pênc lîreyên din jî pêşkêşî wî kirin. Em çûn xaniyekî din. Ew jî girtîbû. Pênc lîreyên din... Tu ji xwe re li şensa me binihêrî, ma ew xanî jî negirtîbe?... Tu kes ne li malê ye. Piştî ku bîst û pênc lîreyên min ji bo heqê komîsyonê çûn, ez kelogirî bûm û li ber wî geriyam:

- Ji bo Xatirê Xwedê, tu dê wek yanesîbê, vala-tije, vala-tije, min mal bi mal negerînî.

Hingî em li xaniyan geriyabûn, binê lingên min av girtibû.

Sîmsêr got:

- Weha be, sibehê kerem bike.

Ez çûm malê û min xwe tam dirêj kir. Ez wek miriyan heta serê sibehê razam, serê sibehê ez bi zorê ji xewê şiyar bûm.

Ez sibehê zû ji malê derketim. Ax begê min, ez kîjanî bibêjim û kîjanî nebêjim. Giliyê min li ba te hatiye kirin ku min bi destê xwe bi awayekî bêexlaqî ji zarok marokan re hin îşaret kirine. Ka ji kerema xwe re raweste, ecelê neke!... Ez ê yek bi yek behsa hertiştî bikim. Destê xwe deyne ser ûjdanê xwe û ger ez ne bi heq bim, ez li ber cezayê xwe sekinîme.

Ez çûm ba sîmsarekî din.

Min got:

- Begê min, em do, her li xaniyên vala geriyan. Delalekî ez xanî bi xanî gerandim. Lê şensa me tune bû, hemû xanî girtî bûn. Ez ji te rica dikim, min belasebeb negerîne!...

Mêrikekî bi ûjdan derket.

Got:

- Binihêre, ma herpênc tilî wek hev in? Niha, hin kes ji bo ku pênc lîreyan komîsyonê bistîne, weha dikin. Navnîşanên xaniyên girtî peyda dikin û mişteriyan belasebeb digerînin. Wê gavê wek ku serê min li kevirê gorê bikeve, min fahm kir ku ez hatime xapandin.

Min pênc lîre bêyî dilê xwe dirêjî mêrik kirin.

Min got:

- Kerem bike, ev heqê te ye.

Me da ser rê.

Bi rê de mêrik digot:

- Tu ê bibînî... Qatekî şehane ye. Ez bi ser pereyan de nemirî me. Bila bi tenê karê te bimeşe.

Min jê pirsî:

- Xaniyekî çawa ye?

- Sê ode, metbexeke fireh, hêwaneke rohnî, balkoneke mifereh...

Em ji cadeyê ketin kolanekê, ji wê kolanê me berê xwe da kolaneke din. Em ji wira jî ketin nîvkolanekê. Em di kaşekî re hilkişiyan. Em di meydaneke ku bûyê cîhê çopê re derbas bûn. Em di serberjêrekî re daketin. Em li aliyê rastê zîvirîn, dû re li çepê zîvirîn... Tam di wê gavê de, em gîhaştin dawiya kolaneke ku rê jê naçe.

Got:

- A va, ev der e!...

Min li wê devera ku wî nîşanî min dida, nihêrî. Xanî manî tune bû. Erd kolane, dîwarên bingehîn bi qasî du bihustan bilind bûne. Dîwarên kiremîtan piçekî hatine lêkirin. Wek ku mirov ji xwe re bi qutîkan bilîze, xetên dîwarên hindur diyar bûne. Kiremît, çîmento û qûm li ortê hatine rûkirin. Karkerek û du hosteyên dîwaran dixebitin.

Ji min pirsî:

- Çawa ye, dikeve serê te?

Min bersiva wî neda. Wî kiremîtên ku bi qasî bihustekê ji erdê bilind bûbûn nîşan didan û digot:

- Ev dera ha, odeyeke razanê ya mikemel e... Ev jî hêwan e. Serşok li vî aliyî ye.

Mirov digot qey mêrik xeyalan dibîne.

- Daşir fireh e. Hêwan rohnî ye... Tu dixwazî, vî qatî kirê bikî... Ger tu ji hilkişandin û daketinê eciz nabî, mala xwe têxî qatê sêyem...

Min jî serê xwe bi wê tiliya mêrik a ku rakiribû hewa re, ber bi jorê ve bilind kir. Li wê devera ku wî digot, qatê sêyem e, ji

derveyî ewran tu tişt nexuya bû.

- Menzeraya qatê çarem pir xweş e, lê ew hatiye kirêkirin. Qatê pêncem jî hatiye kirêkirin.

Min jê pirsî:

- Ma tu xeyalan dibînî? Ka qatê sêyem, ka qatê pêncem?... Ka derî û pencere?... Ma qey te esrar kişandiye?... ma te afyon vexwariye? Tu wek dinyanedîtiyan, hema diçirînî...

Simsêr qet di eynê xwe de dernexist got:

- Şeş heft meh derbas nabin, apartman tekmîl temam dibe.

- Kuro, ma te ji min re negot ku xanî hazir e?

- Hazir e, le...

- Ka kî dera wî hazir e?...

- Niha, êdî xaniyan bi vî awayî bi kirê didin. Ma tu di guhê gê de yî, Begê min? Xanî hîn berî ku bên çekirin, tên kirêkirin.

Tu nabêjî, Begefendiyê min, yê ku eraseyek bi dest xistiye, ji xwe re planeke apartmanê jî daye çêkirin. Hîn berî ku esasê wê deyne, planê nîşan dide û qatan li ser planê bi kirê dide. Kiriya salekê du salan jî pêşîn distîne. Yê maye jî ji bankayê deyn dike û ser temam dike. Dû re dest bi lêkirina apartmanê dike. Di pêvajoya avakirina apartmanê de, tu lê dinihêrî ku mîx ji piyasayê rabûne. Êdî şeş meh in, çi ne, li bende ne ku ji Almanyayê dê mîx bên. Almanya înadê dike û dibêje ku heta hûn deynên xwe yên kevin safî nekin, ez ne mîxan, derziya bi kumik jî nadim we. Dû re ên me dibêjin ku ka em beruyan bifiroşin we, tûtinê bidin we, şeytanokan îxracî we bikin û bi vî awayî heyeta wan a ticaretê dixapînе. Ji ber ku em yek; di warê ticaretê de, dudu; di siyasetê de, wekî din jî di çêkirina helawa tahinê de, pir bi pêş de çûne. Mîx tên. Îcar hesinê înşaetê namîne. Îcar em jî tirsa di Amerîkayê de difirînin û jê re dibêjin ku ya tu ê alîkariyê bi me bikî, ya jî em ê têkevin

rewşeke pir xerab û wê gavê tu ê jî ji vêya zerarê bibînî!... Sedem çi ye, ez nizanim, dilê Amerîkayê razî nabe ku em têkevin rewşeke pir xerab û dibêje, ger hûn hesinan di karekî din de bi kar neînin, ez ê bidim we. Saleke din, du salên din hesin tên. Tam gava ku apartman çêdibe, îcar boyax û çîmento diqedin. A, bi vî awayî apartman tên çêkirin û welatê me tê avakirin. Kirêdarên tevî ku ev pênc sal in, li ser planan kirê dane û hîn neketine hindurê xaniyan hene. Niha, gava kirêdar di destê mêrikekî de plana xanî an apartmanekê dibîne, li gora wacibên medeniyetê dikevin dorê.

Ê min, hişê min nagihê van tiştan, wî efenfiyê sîmsêr behsa van hemuyan dikir.

Got:

- Niha, ka ew xaniyê hazir ku mirov bikaribe têkevê?

Min ji wî jî hêviya xwe birî. Ez çûm ba sîmsarekî din.

Min ji mêrik re got:

- Ji te re pêşîn pênc lîre, lê bi tenê rica min a ji te ev e ku ez binê lingên te maçî dikim, ez xulamê te me, tu ê min nebî xaniyê ku xelas nebûye û bi derewan li xaniyên mirovên ku çûne havîngehan negerînî...

Mêrik got:

- Baş e.

Lê devê min ji şîr şewitiye, min nikarîbû bawer bikira. Ma tu bawer nekî, tu ê çi bikî?.. Mirovê ku ket avê, ji bêçaretiyê xwe bi kevzê digire.

Mêrik ez birim xaniyekî. Lê çi xanî... Wêranxaneya me ya li Zeyrêkê, li gora wî seray e... Gava mirov tê de digere, dîwarên wî dihejin. gawûkan qelîştekên dîwaran ji xwe re kirine mekan. Mirov ê çi bike, min ji bêçaretiyê ew ecibannd.

Dora bazara bi xwediyê xênî re hatibû. Bi ser de jî pîreka

pirpeyv... ji min ne pirse, bê ka ez zewicî me, an na.

Min got:

- Xanimefendî, di sêzdehê Payizê de, bîst û du salên min diqedin ku ez zewicîme.

Jinikê çav berdaye min, çi ye?

Mahdê xwe tirş kir û got:

- Belkî zarokên te jî hebin?

Gava ku wê weha got, êdî min xwe nema dît.

Min jê re got:

- Xanim xanim, berê xwe bide min. Ez naşibim wan zilamên ku tu wan nas dikî. Ma ew qas sal in ku ez zewicîme û zarokên min dê çawa tune bin?

Îcar jinikê got:

- Ez nikarim bidim yê xwedî zarok.

Ez wê bikujim, xwe bikujim?

- Keçê, ev ne zarokên pêçekê ne, yek qîza berzewac e û yê din jî esker e...

- Ez nikarim bidim.

Ax Begefendiyê min, ax, ji bo vî xaniyî çi hat serê min û ne hat serê min.

Bibuhure, min paş situyê xwe xurand û min ji wê derê jî da rê.

Min got:

- Kekê min î simsar, em ê niha çi bikin?

Got:

- Xaniyekî din jî heye, em lê binihêrin?

- Em lê binihêrin.

Destê xwe dirêj kir. Min pênceke din jî dayê.

Bi rastî, peyv ji vî xaniyî re tune bû. Em ê hemû endamên malbatê tam bi awayekî gelekî xweş û bextiyar tê de

rûniştana.

Gava dor hat bazarê, mêrikê xwediyê xênî got:

- Ezbenî, em ne ji wan kesên bêinsaf û bênamûs in.

- Ez rica dikim, ezbenî.

- Em ne ji wan kesan in ku mala kirêdaran xerab dikin.

- Estexfuruleh, begê min.

- Te dît, hin xwediyên xaniyan hene ku dinyanedîtî ne, ji kirêdarên xwe bi qasî fiyetê firotinê pera distînin, me ji wan nehesibîne.

- Tu şika min jê tune ye, ezbenî. Ez bi xwe serafê însên im. Ji eniya te ya pîroz, ez tê derdixim ku bê dilê cenabê te yê mezin çi qas qenc...

- Me ev apartman wek hinan bi bertîl û diyariyan ava nekiriye. Bi xwêdana eniya xwe...

Tiliyên xwe ber bi eniya xwe birin û mîna ku xwêdana xwe ya diherike paqij dike, kir û qêriya:

- A weha, şir şir... Min li Belediyeyê li Defterdariyê şeş mehan memûrtî kir. Malbata me ya şeş nifûs, me nexwar û venexwar, me got ku qezenc çi qas pir dibe bila bibe, ger em destê xwe lê negirin, em ê nikaribin pera bidin ser hevdu...

Hilmek veda:

- A, me ev apartmana şeşqatî ava kir.

- Ez jî ev bîst kusur sal in ku memûr im...

- Em ne mirovên dinyanedîtî ne. Min ji te jî hez kir. Ji ber vê yekê, kiriya salekê... Ez ji kesên din a pênc salan dixwazim. Dûûû re, hezar û pênc sed lîre jî, tu pê dizanî ku hîn deynê hosteyan... Em ê di meseleya kirê de, çawa be li hevdu bikin. Tu ne xerîb e, lê mehê, pêşîn du sed û heyştê lîre...

Min li ruyê sîmsêr nihêrî, wî destên xwe di hevdu de didan. Taqeta ku ez bikaribim devê xwe vekim, nemabû.

Min got:

- Ez we disipêrim Xwedê, ezbenî û ez di derî re derketim.

Li dû min hîn jî digot:

- Min bi şerefa xwe şeş mehan memûrtî kir, min xwe mehrûm kir û da ser hevdu...

Gava ez derketim kolanê, hîn sîmsêr devê xwe venekiribû, min pênceke din xist destê wî.

Got:

- Naa... ez nikarim qebûl bikim. Namûsa min ew qasî tehamul nake.

Dû re dest pê kir û got:

- Begê min, keko, ez lê dinihêrim ku tu miroveki pir paqij î. Xwedê ji te razî be. Me bi saya te, yewmiyeya xwe derxist. Ez nikarim tehamul bikim ku hinin din te bixapîne. Ax birayê min, ruhê min ax, ma di vî zemanî de, ji bo ên wek me û we xaniyê bi kirê li ku peyda dibe? Êh em jî simsar in, em ê qey devê xwe li ber bê venekin... Êvarî, zar û zêç li benda rizqê xwe ne. Me û hin xwediyên xaniyan li hevdu kir. Ez axa binê lingên te bim, tu ê li xwe negirî. Ez çawa bibêjim, çawa behs bikim...

Min peyva mêrik birî.

- Min fahm kir, keko, ez bibêjim; hûn li benda kawik û bêhişan in.

- Wey rehme li bavê te be.

- Ew tên ba we û ji we re dibêjin, ma xaniyê bi kirê heye...

- Wey ez bi qurbana devê te bim.

Hûn jî dibejin ku heye û wan dibin xaniyên ku we û xwediyê wan berê li hevdu kiriye. Lê hûn pêşîn pênc lîreyan dixin bêrîka xwe.

- Wey ez çavên te bixwim.

- Wey qeda bi te keve.

Min ê bigota, lê terbiyeya min destûr neda.

Min serê te êşand, begefendiyê min, ez tam hefteyekê weha simsar bi simsar geriyam.

Meaş jî qediya, ezbenî. Beqal meqal jî herroj dihatin malê û diçûn.

Ji meêş di bêrîka min de, tevde du lîre û nîvê dawiyê mabû. Min destên xwe li ber Xwedê vekirin. Ez çûm Beyogluyê. Min ji kolana mezin, berê xwe da kolanên nav taxê yên ku min ew nas nedikirin. Li ser camekana dikanekê kaxizên nivîsandî hatibûn daliqandin:

"Her cure miamele tê kirin."

"Her cure pêwîstiyên hevwelatiyan tên pêkanîn."

"Daîreya bi kirê, qat, pansiyon."

Min got, bismilah û ez ketim hindur. Piştî selamun aleykum û aleykume selamê, min got:

- Kurê min, ma li ba we, tiştekî li gora me peyda dibe?

Mêrik di bin simbêlan re pîs pîs keniya.

Got:

- Tu li gora xwe dixwazî?

- Helbet.

- Bila teng be, an fireh be?

- Êh, bila ne zêde teng be, kurê min, bila bêhna me tê de rehet derkeve.

- Zerî an esmer?

- Yanî qesda te kilsa wê ye, kurê min, çawa be ferq nake. Ez bi xwe sipî dikim, lê ger pembeyê vekirî be...

- Bila heta çi qasî be?

- Gidî, bila avanta tune be, berxê min, bîst, sî.

- Heye bavo... Tam li gora te, di siyê xwe de.

- Ox, ox, înşaleh qismetê me ye.

- Kî pera bide, qismetê wî ye.

Min serê te êşand, begê min, me li ser bazarê li hevdu kir. Ax ezbenî, ax piştî vî emirî çi tê serê însên. Ez bi yê delal re ketim rê? Me berê xwe da kolanên Beyogluyê yên dawiyê ên birutûbet, çiravî û tavê nabîne. Baweriya te bi Xwedê be, ez gîhaştime vî emirî, tew ez jî heta heft sulala xwe Stenbûlî me, lê ev ne deverên ku min dîtibûn.

Delêl xaniyek nîşan da:

- Li vê derê, tam li gora te hebû, lê bavo, do bi şev hat mohrkirin.

- Ji bo çi?

- Di ser sûc de hatin girtin...

- Ox baş bûye. Ma ji xelkê avanta xwe distîne? Ne xwe, xwe daye dest ha?...

Asoxî em ketin hindurê xaniyekî. Ax ez çawa bibêjim, çawa behs bikim? Ji ber fediya, ji xêra Xwedê, erd biqelişiya û ez têketamayê. Keçikên bejin bi bejin, rengareng, cur bi cur. Tu nabêjî, min ji berdêla, bibuhure, delalê xaniyan bera dû pêzevengekî daye. Xwedê li min negire, ew dizane ku tu xerabî di dilê min de tune ye...

Min bang kir û got:

- Wey tifîîî li we be, rezîlên heram!

Û min xwe bi zorê avêt kolanê. Ez mêrikekî weha me ku ez gîhaştime vî emirî, hîn doxîna min li heramiyê venebûye û destê min bi tu pîrekan nebûye.

Ez axa binê lingên te bim, ger tu eciz bû, bibêjî. Gava derdê însên pir dibe, însan pirpeyv dibe. Peyva kurt, li Stenbûla zirecêb me qulek peyda nekir ku em tê de bisitirin. Rojekê, êdî gîha vê dera min.

Min ji xatûna xwe re got:

- Keçê!

Got:

- Çi ye, mêro?

- Rabe, çarşefa xwe li xwe bike.

- Ji bo çi, ezbenî?

Ma ne pîrek e, por dirêj û aqil kêm e... Bila situyê pîreka herî baş bişikê. Guh mediyê ezbenî, a me xwe bi çarşef kir. Em ketin rê... Ez çûm çûm, lê li kî derê apartmaneke mezin hebû, min li deriyê wê xist.

- Ma ev daîre ya kirê ye, ezbenî?

- Belê, ezbenî....

- Bi çi qasî ye, ezbenî?

- Bi pênc sedî ye, ezbenî.

Ez û xanimê, em bi hevdu re dikevin hindur.

Xwediyê xênî dibêje:

- Salekê pêşîn, ezbenî.

Em li hindur xênî, ji serî heta binî digerin û dû re jî ez dibêjim:

- Weleh, min ê ne pênc sed, hezar jî bida, heta du sal pêşînat jî bida, lê mixabin, di xaniyê we de tertîbata hewa sar tune ye.

Ez terq derî digirim û derdikevim.

Xatûn bi tirs dibêje:

- Mêro, ji bo xatirê Xwedê, ma te aqilê xwe wenda kiriye?

Ez bi wê re dixeyidim û dibêjim:

- Tu deng meke, qismê pîrekan...

Îcar em dikevin apartmaneke din; meha wê bi hezarî. Em di hindurê wê de têra xwe digerin.

Gava em derdikevin, piştî ku ez ji xwediyê xênî re dibêjim:

- Ê, ev çawa xaniye, lo? Berê serşoka wî ne bi başûr ve ye.

Ez derî digirim. Asoxî, xanimê jî mesele ferq kir. Gava em li

apartmanê digerin, firsetê nade min ku ez devê xwe vekim.

Dibêje:

- Ezbenî, êêê... ev çawa apartman e?... Kulîlkên mûşembeya wê pir demode ne...

- Weleh, me dê ne hezar, pênc hezar bidana, lê boyaxa muslixa kalorîferê jê çûye...

Wê rojê, me heta êvarî pir kêf kir. Cêriya te be, pîreka min çi bibêje, baş e?

- Mêro, ev ew qas sal in ku tu mêrê min î, nayê bîra min ku te tu carî dilê min weha şad kiriye.

Lê heq bide me, ma hertim xwediyên xaniyan dê henekên xwe bi me bikin, ezbenî! Em êvarî pir westiyayî hatin malê. Firingekî me jî nemabû. Xwedê çavên wan birijîne, delalan meaşê ji bo debara me ya mehekê, bi hinceta peydakirina xênî, ji min stendibû. Roja piştî wê, hîn min qahweya xwe venexwaribû, min bangî xanimê kir:

- Heydê, bilezîne, beqal û qesab dê aniha bigirin devê derî.

Em ketin rê. Êdî me karê xwe spartibû Xwedê. Di rojnameyan de hin îlanên xaniyên bi kirê tên weşandin. Min pereyên bêrîka xwe yên talî jî dan û pê rojnameyek kirî. Xatûnê serê xwe rakiriye û çavên wê li pencereyên bêperde digerin. Min jî got, ez hela li rojnameyê binihêrim. Wey, xwezîka min lê nenihêrîba. Tiştekî piçûçik, çawa bi ber çavên min ket? " ........... a ku Gerînendeyê me yê Giştî tesdîq kiriye û ji me re şandiye, tê îlankirin: Hasbiyê lawê Abdulrezaqê mirî ku di 1289an de ji Safînaza mirî çêbûye, ji ber ku ev panzdeh roj in, bêyî ku tu mazerat û sedeman nîşan bide, nehatiye ser karê xwe, li gora hikmê benda ........... a qanûna ........... îstifakirî hatiye hesibandin."

Serê min gêj bû, ber çavên min reş bû. Ez li ber memûrtiya

bîst û pênc salan nakevim, lê ez li ber meaşê eslî, rizqê zar û zêçan dikevim. Tew ez li ber peydanebûna xênî jî nakevim. Lê, de ka mirov dê ji vê îlanê re çi bibêje? Lawê Abdulrezaqê mirî ha... te dît, bibuhure, heşayî cemaetê, wek ku mirov bibêje; ker lawê keran. Ji Safînaza mirî ha... Te dît, wek ku ji qûna mirîşka mirî hêkê derxîne... Mirî ha, wey rezîlên heram! Ez axa binê lingên te bim, bibuhure, ez gîhaştim vî emirî, lê min tu carî sixêf nekirine.

Jina min pirsî:

- Mêro, çi bi te hatiye, wech bi te ve nemaye..

- Wê çi bibe, tu lê nanihêrî ku ez qewirandime!

Em vegeriyan malê. Mêrikek ji sibehê de li benda min e.

Min got:

- Tu çi dixwazî?

Got:

- Ez ji bo qenciyekê bi te bikim, hatime vê derê.

Çavên min ji qenciyan ew qas tirsiyane ku min ji mêrik re got:

- Min tu xerabî bi kesî nekiriye, lê ez nizanim, bê ji bo çi herkes dixwaze qenciyan bi min bike...

Mêrik got:

- Ew ê xaniyê we îstimlaq bikin, ma te heqê îstimlaqa xênî stendiye?

- Na, min hîn nestendiye. Ez newêrim bistînim, ez ditirsim ku ji destên min here...

- Çi qasî didin?

- Pênc hezaran didin, lê para min hezar du sed û pêncî ye.

- Ger ez du hezaran bidim te, tu ê para xwe bifiroşî min?

Ez dirêj nekim ezbenî, piştî ku mêrik serê pelê hezarî nîşanî min da, dest û lingên min lerizîn. Min wê rojê, tavilê miame-

leya firotinê çêkir. Ma qey eyb e, min di jiyana xwe de, hezar lîra nedîtibû. Gava min herdu hezar xistin bêrîka xwe, min xwe wenda kir. Karê min î yekem ew bû ku min deyn meynên xwe safî kirin. Piştî wê, me bi lezeke nuh dest pê kir û em li xênî geriyan. Deh roj çûn neçûn, me binê pereyên xwe anî. Qet neba, me xanî peyda bikira, lê ka xanî...

Me ji bêçaretiyê, dev ji peydakirina xênî berda û ji bo ku dilê me bi halê me şewitî, me berê xwe da mîrasa bavê xwe, wê feqîrxaneya li Zeyrekyokuşê ya ku em miweqet tê de rûdinin. Ax ezbenî, ax, ez kîjanî bibêjim. Em hatin malê, lê çi mal... Xanî bûye pariyek û ji erdê hilatiye. Xaniyê me tune. Hertişt li bin guhên hevdu ketiye. Alavên me li ber derî kom kirine. Zebtek jî bi kirêdaran daye îmzekirin. Li welêt cenderme nemaye, ê ku qazme û bivirek bi dest xistiye, hatiye xaniyê me hilweşîne. Ew jî çi qas ji dil dixwazin xênî hilweşîne, birayê min! Di hindurê saetekê de, xanî bi erdê re bûye yek. Gava çav li min ketin, kaxizek dirêjî min kir û got vê kaxizê îmze bike.

Li gora plana bajarê Stenbûlê ya îmarê, divê ev xanî ji bo mêrgê, îstimlaq bibe. Tevî ku bala xwediyê xênî gelek caran hatiye kişandin ku divê xênî vala bike û di agahdariya dawiyê de, di hindurê maweya qanûnî de...

Di encamê de ezbenî, belgeyeke ku dibêje; di esnayê hilweşandinê de, tu zerar û ziyana min çênebûye.

- Îmze bike.

Min xwe bixudand û îmze kir.

Çawa be, êdî xanî ne xaniyê me ye. Xwedê kêmaniya wan nede, me alavên xwe li cîran mîranan par ve kirin û em jî li vî alî û wî alî, li malên dostan belav bûn. Ez bê rawestan li xaniyekî digerim. Êdî gera me ya ji bo peydakirina xênî, deng da. Gava ez bi rê de diçim, zarok marok, çi qas beredayî,

bêedeb hebin, bera dû min didin û bi yek awazî bang dikin:

- Ji kirêdêr re, maşaleh!... Ji kirêdêr re, maşaleh!... Ew ê xaniyekî bibîne, înşaleh!...

Ez wê rojê jî agahdariyê werdigirim ku mêrikê ku para min bi du hezaran ji min kiribû, nizanim li kî derê nasekî wî yê xurt hebûye, îtîrazî heqê îstimlaqê kiriye û rêyek peyda kiriye û xanî bi bîst hezaran firotiye Belediyeyê.

Ax Begefendiyê min, ax!... Ma min ew bêedebî hema weha bi rehetî kiriye?

Roja ku min ev agahdarî wergirtin, ez û jina xwe, em dîsa ji lixanîgerandinê vedigeriyan. Taqet di çîpên min de nemabû, ez ji hal de ketibûm, perîşan û pir hêrs bûbûm. Ger min çênî bi çênî bikira jî piçeke xwîn ji min nedihat xwarê. Gava ez di vî halî de bûm, bêjiyên taxê, bi dû min nekevin û pê li damarên min nekin û nebêjin:

- Ji kirêdêr re, maşaleh, ew ê xaniyekî bibîne, înşaleh!...

A wê gavê, min xwe wenda kiriye, min çi kiriye, min kiriye. Belkî jî wek ku dibêjin, min bi destan îşareteke weha kiriye ku ji derveyî urf û adetan e. Ger min bi zanebûn kiribe, bila peydakirina xaniyê bi kirê, nebe qismetê me, Begefendî.

# Xaniyê li ser sînor

Roja duyem bû ku me mala xwe bar kiribû vî xaniyî. Li aliyê me yê rastê, cîranekî me heye. Rê di ber mala wan re derbas dibe. Kaloyek li pêşiya pencereyê rûniştibû, got:

- Ger we ev xanî kirê nekira, dê baş bûya.

Min awirin tûj dan kalo.

- Tiştê ku ez dizanim, gava kirêdarek bar dike xaniyekî, cîran hemû tên û dibêjin; "li ser xêrê tê de rûnin". Ger we bar nekiriba dê baş ba, çi ye? Ma mirov ji cîranê xwe re weha dibêje?

Kalo di eynê xwe de jî dernexist û got:

- Nebêje negot, diz dikevin wî xaniyî, min ji ber vê yekê got.

Ma diz dikeve xaniyê me û nakeve yên din? Bêhna min teng bû û ji bo kirîna cixareyê, ez ketim hindurê dikana qoziyê.

Min got:

- Çi zilamên ku bergiya devê xwe nizanin, hene.

Beqêl got:

- Xêr e?

- Li kêleka xaniyê me yekî xurifî rûdine. Gava ez di ber mala wan re derbas bûm, ma nebêje "Diz ê têkeve xaniyê we. Ger we bar nekiribayê dê baş bûya"?

Beqêl got:

- Rast gotiye, ger we bar nekiribayê, dê baş bûya. Diz dikeve wî xaniyî.

Ez bêyî ku gotinekê bibêjim derketim derve. Wê rojê, heta êvarî bêhna min teng bû. Bi şev, cîranên me yên aliyê çepê hatin mêvantiyê. Nîvê şevê, tam gava ew ê biçûna, cîranê me got:

- Ev xanî baş e, lê diz dikevê.

Ji ber ku gava di derî re derdiket gotibû, nedibû ku ez jê bipirsim bê “ Ji bo çi diz dikeve vî xaniyî û nakeve xaniyên we?”.

Jina min dît ku ez tengijîme, keniya û got:

- Kuro, ma tu fêhm nakî ku niha ji bo kirêdaran ji xaniyan derxîne, hezar rê peyda kirine. Ne xwe, reyek jî ev e. Ew ê me bitirsîne û bibêjin ku diz dê di mala we keve û me ji xênî derxîne. Ji ber ku kiriya xênî erzan e, ya ew ê têkevinê ya jî nasekî xwe têxinê.

Ket serê min, lê dîsa bi şev xewa min nehat. Ez li benda yê diz bûm; wek ku civan hatibe dayin, ha hat, ha ew ê bê. Di wê gavê de, ez di xew re çûbûm. Ez bi teqe reqekê çeng bûm ser xwe. Bi çengbûnê re, min rahişt devançeya bin bahlîfê û ber bi tariyê ve bang kir:

- Tev nelive, na na ez ê te bikujim!... Ji ber ku me nuh bar kiribû xênî, min dikir û nedikir, min nikarîbû bişkoka elektrîkê bidîta. Bi hêviya peydakirina bişkoka elektrîkê, ez gah li bin guhê vî dîwarî û gah jî li bin guhê wî dîwarî diketim. Di wê navê de, lingên min li tiştekî aliqî û bi şingîniyekê re, min xwe li erdê dît. Min got, qey yê diz ling avêt ber min, ji ber vê yekê, tu nemabû ku min dikira hemû fîşekên ku di devançeyê de hebûn, di zikê wî de vala bikirana. Lê gava ez gindirîm, devançe bi aliyekî de çûbû û ez jî bi aliyekî de... Ji nav tariyê dengê tîqe tîqeke ku muyên mirov gij dikirin, bilind bû:

- Tîq, tîq, tîq!

Ez bi ser de qêriyam:

- Kuro, ma em fîlimê welêt î tirsê çêdikin, namerd, ger tu mêr bî, derkeve hember min!

- Hebe tune be, tu li bişkoka elektrîkê digerî. Li hêla deriyî rastê ye. Kirêdarên nuh ji bo rê bibin ser bişkoka elektrîkê,

hertim weha zehmetiyê dikişînin.

Deng ji nav tariyê dihat. Min bang kir:

- Ma tu bi min dizanî, bê ez çi dikim ji mere?

Zilamê ku min di tariyê de, ew nedidît, got:

- Ez nizanim. Ger destûra te hebe, ez ê lampê vêxim û alîkariya te bikim.

Dengê bişkoka elektrîkê "çiq" hat bihîstin, ode rohnî bû. Gava ez li erdê ketime, ez ketime bin maseyê û jina min jî ketiye bin qeryoleyê. Li hember min, zilamek weha çik sekiniye ku bejina wî du caran li ya min e. Ger ez rabim ser xwe, ez ê nikaribim mêrik bitirsînim. Ji bo ku ew nizanibe bê ez çawa me, min dengê xwe qalind kir û ji cîhê xwe, jê pirsî:

- Tu kî yî?

- Ez diz im.

- Li min binihêre, tu nikarî min bixapînî, tu ne diz î. Tu ê bibêjî, ez diz im, me bitirsînî û ji xênî derxînî. Tu li çavên min binihêre...

Mêrik got:

- Ez diz im, ne diz im, tu ê niha bibînî.

Wek ku mala bavê wî be, her der tev dida û alavên ku jê re dibûn, didan hev.

Ji aliyekî ve jî digot:

- Ne xwe, we ev der kiriyê odeya razanê. Kirêdarên beriya we, ev der kiribû odeya rûniştinê. Ên beriya wan jî...

Min got:

- Li min binihêre, tu diziyê dikî, lê dû re, ez ê li te gilî bikim.

Bêyî ku serê xwe ji karê xwe rake, got:

- Tu dixwazî, giliyê min li ba bavê xwe bikî, bi ser de jî silavên min lê bike...

- Lê heta ku ez biçim qereqolê, tu ê birevî.

- Ez narevim.

- Bi Xwedê, tu ê birevî. Li malê çi hebe, tu ê bidî hev û birevî. Ji ber vê yekê, ez ê te girê bidim û biçim hayê qereqolê jê bikim.

Jina min kir qêrîn:

- Hahoooo!...

Rûniştevanên taxê jî qey li ber derî hazir bûn, bi carekê re ketin hindur. Cîranan bêyî ku bûyerê cidî bigirin, digot:

- Waaa... Dîsa diz ketiye vê malê...

Hinan jî ji hevdu dipirsî:

- Ka em binihêrin bê kîjan ji wan e?

Di nav cîranên me de, heta hin hebûn ku wan û yê diz hevdu nas dikir û li halê hevdu jî dipirsî. Yê diz qet di eynê xwe de dernedixist, bê rawestan tişt mişt didan hev.

Min got:

- Cîranno, alî min bikin, da ku ez vî dizî girê bidim. Ez ê biçim, hayê qereqolê bigihînimê.

Yekî ji wan got:

- Weleh, tu dizanî, lê ez dibêjim ku tu belasebeb zehmetê li xwe dikî.

Ez şaş bûm, me bar kiriye cîhekî çawa. Jina min benê kincan anî. Yê diz qet di ber xwe de neda. Me mêrik baş girê da û xist odeyekê. Min derî li wî girt. Me tavilê bazda û em çûn qereqolê. Jina min hertişt ji qomisêr re got. Qomisêr li cîhê xênî pirsî, me jî jê re behs kir.

Wî got:

- Haaa... Ew xanî?

Min got:

- Belê, ew xanî.

Got:

- Em nikarin têkilî wî xaniyî bibin. Ew ji derveyî herêma me ye.

- Baş e, em ê çawa bikin? Ma me mêrikê reben belasebeb girê da?

- Ger hûn li xaniyê kêleka wî ya jorê rûniştibana, ew ê têketa herêma me. Wê gavê em ê pê elaqadar bibana.

Jina min got:

- Xaniyê li kêleka jorê ne vala bû, em çawa bikin...

Xaniyê me, tam di sînorê herêmên ewleyiyê ya du qereqolan de ye.

Qomisêr got:

- Xaniyê we di bin berpirsiyariya Qereqola "........" de ye.

Qereqola ku wî digot jî dûr bû. Heta ku em gîhan wê derê, bû sibeh. Me ji ên wê derê re behs kir. Li cîhê xaniyê me pirsî. Me ji wan re behs kir.

Polîsekî got:

- Haa... Ew xanî?

Min got:

- Belê, ew xanî.

- Ger xaniyekî bi jêr de bûya, me dê lê binihêriya. Xaniyê we ji derveyî sînorê herêma me ye.

Jina min got:

- Wax, wax, me mêrik jî bi şid girê dabû.

Min pirsî:

- Ma xaniyê me dikeve kîjan herêmê?

Yê polîs got:

- Xaniyê we dikeve herêma qereqola cendermeyan. Polîs nikare têkilî wira bibe. Hûn ê biçin qereqola cendermeyan.

Em ketin rê. Jina min got:

- Gidî, em berê biçin malê, li yê diz binihêrin. Mêrik mir, ma?

Helbet... Ji ber ku me ew bi şid girêda bû, le ku xwîna wî negere û bimire. Me got, em ê yê diz bigirin û bi ser de jî em

bibin qatil û herin.

Em çûn malê. Diz, bê me ew çawa girê dabû, weha bû.

Min got:

- Tu çawa yî?

Got:

- Ez baş im, lê ez birçî bûme.

Jina min ji yê diz re xwarin anî. Ji xwe re lê binihêre, li malê tirşika bamyayê heye. Diz jî bamyayê naxwe. Jina min ji ba qesêb goştê golikan kirî, tavilê çêkir û danî ber yê diz. Em ji bo gilî çûn qereqola cendermeyan. Me ji wan re hertişt got. Fermandarê cendermeyan li cîhê xênî pirsî, me jî jê re behs kir.

Wî got:

- Haaa... Ew xanî?

Herkesî xaniyê me nas dikir. Fermandarê cendermeyan got:

- Xaniyê we ne di bin berpirsiyariya cendermeyan de ye, di bin berpirsiyariya polîsan de ye.

Min got:

- Ez di bextê te de me, ezbenî, çawa dibe. Em diçin ba polîsan, ji me re dibêjin, di bin berpirsiyariya cendermeyan de ye, em tên ba cendermeyan, ew jî dibêjin, di bin berpirsiyariya polîsan de ye. Ev xaniyê me, helbet divê di bin berpirsiyariya hinan de be.

Fermandarê cendermeyan nexşeyek derxist û got:

- Lê binihêre, ma tu ji nexşeyan fêhm dikî? Ev, xeta ku raqima wê 140 e. Ev jî depoya avê ye. Ev der jî girê ku raqima wî 208 e. A, sînorê herêma cendermeyan di vê derê re derbas dibe. Ger xaniyê ku hûn lê rûdinin, bi qasî du metreyên din li aliyê bakurê rojhilat hatiba avakirin, wê gavê diket herêma me.

- Ruhê min, ma ji bo du metreyan? Lê binihêrin, ma ew ê çi

bibe?

- Ew ê çi bibe? Em dizanin, dê çi bibe, ne hûn. (Li ser nexşeyê nîşan da). Binihêre, xaniyê we, a li vê derê ye. Li ser sînorê ku herêma cendermeyan û ya polîsan ji hevdu vediqetîne. We fahm kir? Du metre ji bexçeyên we dikevin herêma me, lê dizî di bexçe de çênebûye.

Dîsa bêyî ku em biçin ba polîsan, tu çareya me tune bû.

Jina min got:

- Gidî, em careke din biçin malê û li yê diz binihêrin. Xwedê me bisitirîne, ger bimire, serê me dê têkeve belayê.

Em çûn malê. Min ji yê diz pirsî:

- Tu çawa yî?

Got:

- Hindurê min dişewite, zû avê bîne...

Piştî ku av vexwar, got:

- Binihêre, ez ji we re dibêjim, hûn bergiya azadiya min digirin. Heqê we û vê yekê tune ye. Ger hema ez ji vira xelas bibim, ez ê daweyê li we vekim.

Min got:

- Baş e, em çi bikin, birayê min. Ne diyar e, bê xaniyê me dikeve kîjan herêmê ku em jî giliyê te li wira bikin. Ma mirov li devereke weha xerab xaniyan ava dike, ruhê min? Tam li ser sînor hatiye avakirin.

Got:

- Êêê... ma min negot? Min berdin, na na, ez ê ji ber sûcê sînorkirina azadiya xwe, we mahkeme bi mahkeme bigerînim.

Min got:

- Heta êvarî, destûrê bide min, em ê dîsa biçin ba polîsan û bên...

- A çûyinê, biçin, lê em ji zû de, bi vê meseleyê dizanin. Ew

ê berê biryarê bidin, bê xaniyê we dikeve kîjan herêmê. An jî ew ê sînorên herêman biguherînin. Heta wê gavê, teeew...

Em dîsa çûn ba polîsan. Qomisêr jî nexşeyek derxist.

Got:

- Binihêre, sînorê cendermeyan, ev der e. Bexçe dikeve sînorê wan.... Beşekî xênî dikeve sînorê me, beşek jî ê cendermeyan.

Min got:

- Odeya razanê dikeve sînorê herêma we. Dizî jî li odeya razanê bûye.

Got:

- Belê, lê divê bê tesbîtkirin û wekî din jî ma ev diz nefiriya û neçû odeya razanê, ji bexçe ketiye. Bexçe ê cendermeyan e... Ev ne tiştekî nuh e. Hîn li ser tê minaqeşekirin. Ka em binihêrin, bê xaniyê we dixin kîjan herêmê, em ê jî li gora wê, hereket bikin.

Em vedigeriyan malê. Ji pencereya mala li kêleka me ya rastê, dîsa wî kaloyî bang kir:

- Derbasbûyî be, diz ketiye xaniyê we.

Min got:

- Ketiyê.

- Kirêdar qet nakevin wî xaniyî, ji ber wê yekê, erzan didin. Xwediyê xênî bi xwe, nikare tê de rûne û nikare kirêdaran jî peyda bike. Wî dê xaniyê xwe xerab bikira û du metreyan bi hindur de bianiya. Wê gavê ew ê tam têketa herêmê. Dû re, gava hûn peyda kirine, bi kirê daye we.

Jina kalo got:

- Sûc ne yê we ye, yê xwediyê xênî yê. Gava xênî ava dike, li ava wî, elektrîk, gaz û menzereya wî difikire, lê nahesibîne, bê ew dikeve kîjan herêmê. Ma mirov xaniyan qet li ser sînor ava dike?

Ji ber ku me kiriya salekê pêşîn dabû, em nikarîbûn ji xênî derketana. Em ketin hindur. Me benê ku pê diz girê dabû, vekir. Diz li hember me rûnişt. Me bi hevdu re şîv jî xwar.

Dû re got:

- Niha, bi xatirê we, ez ê dîsa bêm.

Niha, çar-pênc diz bûne ji malê. Li taxê herkes wan nas dike. Tew me bi wan re li hevdu jî kir. Ji bo ku dizên xerîb jî neyên nekevin xênî, em bi hevkarî xaniyê xwe diparêzin. Ka em binihêrin, bê dê çi bibe. Ya heta ku peymana me biqede, şeş diz û dudu jî em, em ê heyşt kes bi hevdu re bijîn, ya jî ew ê xaniyê me têxin herêmekê. Wê gavê jî ger em dizan bigirin, em ê giliyê wan li ba qereqola ku li herêma me dinihêre, bikin. Em baş jî hogirî hevdu bûn, êdî gilî jî eyb e... Ji ber ku ew hin mesrefên malê jî dikin.

# Fîl Hemdî çawa hat girtin

Ji aliyê Gerînendeya Ewlehî ya Stenbûlê ve, ji bo hemû wilayetên derveyî Stenbûlê ev telegraf hatibû şandin: Yekî sîh û pênc salî, bejindirêj, du sed kîlo giran, kej, sê diranên wî kêm, di çenga wî ya jorîn de diranekî wi yê kursiyan dagirtî, qîlê wî yê jêrîn ê hêla çepê zêrkirî, kincên xetxetî û qehweyî lê, porweşiyayî, rûgirover, çavqahweyî, bi navê "Fîl Hemdî", sûcdarekî dijwar î sextekar, ji destên du polîsên me yên ku di kulûbeya nobetê de sê şev û sê rojan bi baldariyeke mezin nobet girtibû û ji ber wê, bê xew mabûn û bi rê de razabûn, firsetekê peyde dike û direve. Piştî lêkolîn, lêgerîn û lêpirsina me, reva Fîl Hemdî bi temamî hatiye fahmkirin.

Ger bê qereqola wîlayeta we, an qereqoleke ji wan qereqolên qezayên ku bi wîlayeta we ve girêdayî ne, an jî ji polîsekî rê, navnîşanê bipirse, ji kerema xwe re jê re bibêjin ku çavên me li rêya wî ne. Em rica dikin ku bila ew me zêde di întizarê de nehêle û di wexteke minasib de bê Gerînendeya Ewlehî ya Stenbûlê û teslîm bibe.

Sûretê sûcdarê dijwar Fîl Hemdî bi vê telegrafê re ye."

* * *

Li îstasyoneke wîlayeteke derveyî Stenbûlê, du polîs dipeyivin:

- Remezan kekê min, ev mêrikê ku salebê vedixwe, miheqeq Fîl Hemdî ye.

- Hii... Dişibê... Sûretê wî derxîne, em lê binihêrin.

Sûretekî derdixîne û rê hevalê xwe dide.

- Ne ev e, lo Remezan. Ev sûretê te ye.

- Hii... Min di roja eydê de kişandibû, çawa ye?

- Baş e, lê tu hebekî bikeniya, lo!.. Wî sûretê Fîl Hemdî bibîne.

Remezan ji bêrîka xwe gelek sûretan derdixîne û lê dinihêre.

- Ev sûretê lawê min e... Ev bîranîneke eskeriyê ye... Ev kî bû, Mehmûd?

- Ev? Çiko ye...Qaçaxçiyê eroînê Dûman Elî...

- Ev jî mişkê otêlan Suphî... Sûret tev li hevdu bûne.

- Vî fîlî peyde bike, lo Remezan!.

Mehmûd û Remezan sûretan tev didin û li sûretê Fîl Hemdî digerin.

- Zû Mehmûd... Mêrik saleb vexwar, ew ê bireve...

- Lê binêre, bê çawa li dora xwe dinihêre.

- Va min dît, ew ê ev sûret be. Temam ev bi xwe ye!

Herdu diçin ba wî merikê ku jê şikê dikin.

- Birako, hela weha bisekine...

Geh li sûret dinihêrin û geh li rûyê mêrik dinihêrin.

- Carekê jî kêleka xwe bide me.

- Wey, naşibê, lawo Remezan.

- Bila qomiser beg jî wî bibîne Mehmûd, belkî ew wî bişibînê.

- Birako, de heydê... Tu ê bi me re bê qereqolê...

*  *  *

Li bazara wîlayeteke derveyî Stenbûlê ya din, du polîs dipeyivin:

-Pir eyb e, lo kekê min î Şukrî. Em heta êvarî geriyan jî me ev Fîl Hemdî zevt nekir.

- Ev mêrik ne ew be?

- Belkî jî ew e. Ka em jê bipirsin.

Ew diçin ba mêrik...

- Begê min, navê te çi ye?

- Mistefa...

Di guhê hevdu de:

-Dibêje, Mistefa...

- Ê, qey nabêje Hemdî... Navê xwe vedişêre.

- Ji wî heye ku ew ê me bixapîne.

- Begê min, ka were vê derê...

*  *  *

Li qehwexaneyeke wîlayeteke din a derveyî Stenbûlê, du polîs dipeyivin:

- Min do sê Fîl Hemdî girtin, lê qomisêr yek ji wan jî ne eciband.

- Ev qomisêrê me jî çi qasî mişkulpesend e, ha...

- Hişşş!... Hêdî bipeyive. Bila pê nehise. Di bin çavan re li vî mêrikî binêre!...

- Ew e kuro... Ew bi xwe ye...!

- Lê di wî ewraqê hatibû de, dibêje ku qelew e. Ev zeîf e, mêrikekî wek darikekî ye.

- Zeîf bûye, keko. Ma gera bi mehkûmî ew qasî rehet e?

- Ew jî weha ye... Lê ev esmer e. Fîl Hemdî kej e.

- Hingî li çol û çiyayan geriyaye, rengê wî hatiye guhertin.

- Heqê te heye. Lê keko, porê viya reş e û tof e. Di wî ewraqî de dibêje ku porê Fîl Hemdî weşiyaye.

- Ê, êdî ew qasî jî dibe. Mêrik belkî ji bo ku neyê naskirin, perûk xistiye serê xwe.

- Ma em ji bo çi sekinîne? Em wî bigrin.

Xwe nêzikî mêrik dikin.

- Navê te çî ye?

- Hemdî...

Ew bi mahne li hevdu dinihêrin û dikenin.

- Heydê qereqolê... Heydê!..

- Çi heye?... Çi bûye?...

- Zêde mepirse! Tu ê li qereqolê fahm bikî.

* * *

Li ser rêya wîlayeteke din ya ku bi qasî çend kîlometreyan asfaltkirî ye, wek ku li hemû wilayetên din ên derveyî Stenbûlê dibe, du polîs mêrikekî ku bi rê ve diçe, digirin.

- Devê xwe veke!

- Di devê min de tu tişt tuneye.

- Madem tune ye, tu ê vekî.

Mêrik devê xwe vedike. Herdu bi hevdu re li diranên mêrik dinihêrin.

Polîsek ji yê din dipirse:

- Li vî ewraqî binihêre, çend diranên wî tune bûn?

Yê din ewrêq dixwîne:

- "Sê diranên wî kêm in, di çenga jorîn de diranekî kursiyan dagirtî û di çenga jêrîn de, li aliyê çepê diranekî wî yê qîl

zêrkirî..."

Polîs diranên mêrik dihejmêre:

- Yek, dudu, sisê, çar... Tev melive lo, te ez şaş kirim. Yek, dudu, sisê, çar, pênc... bîst û çar. Bîst û çar diranên wî hene.

- Bîst û çar? Çend heb kêm in? Ma tu dizanî, bê çend diranên te kêm in?

- Heyşt.

- Rakirine. Ji bo delîlan ji ortê rake, diranên xwe rakirine.

- Diranên min taxim in. Di devê min de tu diranê ku yê min bi xwe be, tune ye... Tew çar heb jî gava min garis xwar, şikestin.

- Ma di ewrêq de dibêje ku taxim in, an na?

- Na, nabêje. Hatiye jibîrkirin. Ev e ruhê min, ev e... Ev bi xwe ye. Tu li diranê wî yê qîl binihêre. Zêrkirî ye. Begê min, bi me re were.

- Bi ku de?

- Heydê qereqolê! Bimeşe...

* * *

Ji Gerînendeyên Ewlehî yên wîlayetên derveyî stenbûlê, rojê bi sedan telegraf dihatin Gerînendeya Ewlehî ya Stenbûlê:

"Bersiva telegrafa falan tarîxê û bêvan hejmarê ye:

Di wîlayeta me de çardeh heb Fil Hemdiyên ku kincên wan qahweyî û xetxetî û heyşt kesên ku diranên wan ên qîl zêrkirî ne, hatine girtin. Em bi rêzdarî tika dikin ku di warê besbûn an nebesbûna hejmarê û domandin an devjêberdana lêgerînê de, emir bête dayin."

"Bersiva telegrafa we ya hêja ya filan tarîxê û bêvan hejmarê ye:

Ez bi rêzdarî pêşkêş dikim ku di wîlayeta me de, yên ku

giraniya wan di navbera 180 û 220 kîloyan de, du duzîne Fîl Hemdî hatine girtin. Ferqiya di warê kîloyan de, ji ber bêa-yarbûna kantaran tê. Li gora ku çavên hemuyan qahwerengî ne, di warê Fîl Hemdîbûna wan de, cîh ji gumaneke herî piçûk jî re nemaye. Fîl Hemdiyên girtî, hatine şandin, ger yên ji ber çavan reviyabin, hebin, li wan jî bi diqet tê gerandin û em ê wan jî hêdî hêdî bişînin."

Telegrafa ku Gerînendeya Ewlehî ya Stenbûlê ji bo hemû Gerînendeyên Ewlehî yên wîlayetên derveyî Stenbûlê şand:

"Ji ber ku hemû cîh hatine dagirtin, Fîl Hemdiyên ku niha di destên me de ne, têr dikin. Ez bi spasiyên xwe ve rîca dikim ku heta emirê duyem, divê ji bo girtina Fîl Hemdiyan û lêgerîna wan, navbirek bête dayîn."

**Not: Fîl Hemdiyê ku firar kiribû, hatiye girtin.**

# Basriyê Strîp-tîz

Beqalê taxê, Basrî beg ji xewa sibehê şiyar kir. Rojeke yekşemê jî rehetî tune bû.

Basrî Beg bang kir:

- Ez ê bi çolê kevim, ez ê destê xwe bi serê xwe dim û bi çolê kevim!

Jina wî got:

- Tu ê bi çolê kevî, bi çolê keve!... Ez ê berî te bi çolê kevim. Tu niha ka bibêbêje, bê em ê çi bersivê bidin beqêl!

Ev du meh in ku me nikarîbû şêst û du lîre û sîh û çar quriş bigîhandana hevdu û deynê xwe bida.

- Heqê mêrik heye.

- Ji xwe, heye...

- Bibêje, ne li malê ye.

- Nabe, ez nikarim bibêjim. Ew ê bêedebiyan bike.

- Ji diya xwe re bibêje, bila ew jê re bibêje.

- Ma bila jinika pîr, piştî vî emirî derewan bike?

Basrî beg xwe da ser hevdu û ber bi derî ve çû:

- Tanaş efendî, li qusûra me nenihêre. Weleh, birayê min, tu çi bibêjî, heqê te heye. Me pev nexist, ha...

- Lê Basrî Beg, te got serê mehê. Çend serên mehan derbas bûn...

- Rast e.

- Ji vî şêst û du lîreyî, du lîre jî ji min re namîne.

- Heqê te heye.

- Her yekşem, her yekşem. Ez êdî of bûm.

- Soz Tanaş efendî, soz birêz Tanaş. Vê hefteyê... Înşaleh vê hefteyê...

- Ev soza çenda ye, Basrî Beg?

- Soza dawiyê ye.

Tanaş bi hêrs vegeriya. Basrî beg di ber xwe de peyivî û çû hindur.

- Wey qeda bi vê jiyanê bikeve...

Xwesiya wî got:

- Serê sibehê, nifira meke.

Mêrikekî pir milahîm bû. Ev bîst û du sal bûn ku zewîcîbû. Xwedê tu zarok nedabûyê.

Li derî ket. Jina wî got:

- Xwediyê xênî ye.

- Wey Xwedêyo...

Xwe bi ser hevdu de civand. Heta ku xwe ji xwediyê xênî xelas kir, di nav xwêdanê de ma.

- Ez ê bi çolê kevim. Ez ê biçim devera ku tu kes min lê nas neke. Ez ê destên xwe li ber xelkê vekim, lê! Ez ê parsê bikim... Ma jê wê de heye?... Yanî çi ye, navê me Basrî beg e... Wey Xwedêyo... Xanim! Qahweyekê bide ser.

- Ma qahwe heye, lo? Ne qahwe heye û ne jî şekir...

- Wey Xwedêyo... Ez di jiyana weha...

Xwesiya wî ji hindur bang kir:

- Hiş!...Hiş!... Wê Xwedê li te bê xezebê...

- Tê xezebê, bila bê xezebê... Bila bê xezebê... Tobe... Tobe estexfurulah... Bila bê xezebê!... Tobe ya rebî, tobe...

Jina wî pirsî:

- Yê avfiroş dê bê, em ê çi bikin?

- Hûn çi dikin, bikin... Ma hûn dixwazin min dîn bikin? Avfiroş, beqal û xwediyê xênî, we hemiyan destên xwe dane hevdu û hûn ê min dîn bikin, lê!

Li derî ket.

- Ma yê avfiroş hat?

- Na, ne ew e. Yê komirfiroş şagirtê xwe şandiye.

- Bibêje, ne li malê ye. Bibêje ku Basrî Beg ne li malê ye... Bibêje, mir, mir... Basrî Beg emir da haziran, mir. Tobe estexfurulah... Ez di jiyana weha...

Gava tehsîldar û bi dû wî re jî qesab hat, êdî nema îdare kir. Şalê xwe kişand xwe û çakêtê xwe li xwe kir.

- Xanim, di bêrîka min de, du lîre û nîv hebûn. Çi pê hat?

- Min derxist.

- Xwedê jê razî, ji bo çi tu ji min re nabêjî û derdixî?

- Êêê... Îcar ev ji me kêm bû. Ma min ê çi bikira? Ma em birçî bimînin?

- Wey Xwedêyo... Wey Xwedêyo!... Ez di jiyana weha... Ez di jiyana weha... Tobe estexfurulah...

Xwe avêt kolanê. Qurişek di bêrîka wî de tune bû.

Di ber xwe de got:

- Gelo ez çi bikim? Gelo ez çi bikim?

Hemdî hat bîra wî. Bi salan e ku wî ew nedîtibû. Bihîstibû ku Hemdî dewlemend bûye. Hevalê wî yê bi salan bû. Ew ê biçuya ba wî û jê re bigota rewşa min weha û weha ye û pere bi deyn jê bixwesta. Ma wî dê pêncî lîreyek jî nedayê, yanî?...

- Ez ê bixwazim... Ruyê min dê sor bibe. Yê ku bixwaze ruyekî wî reş û yê nede herdu ruyên wî...

Ne heqê tramwayê û ne jî yê otobusê pê re hebû. Ew qas rê peya meşiya.

- Ger bi ser de jî ne li malê be... Tifî... Ez di vê jiyanê.. tobe, tobe...

Tu nemabû ku bûbûya êvar.

- Ma qey nakeve serê te ku mala xwe bar kiribe? Wey Xwedêyo...

Ez di jiyana weha...

Bi tariyê re, xwe gîhand mala Hemdî...

- Wey Basriyê min... Wey ruhê min! Wey canê min!... Tu li ku yî? Tu ji ku derketî?

Hemdî çawa be jî hevalê wî yê kevin bû, kêfa xwe ji hatina wî re anîbû. Maseya xwe li balkonê danîbû û hêdî hêdî vedixwar.

Ji westanê, taqet di çîpên Basrî Beg de nemabû. Ji nêza jî bêhna wî çikiyabû.

- Baş bû ku tu hatî. Ev ziqûm jî bi tenê nayê vexwarin. Noş!...

Li ser sifreyê ne meze û ne jî xwarin hebû. Bi tenê nok hebûn... Araqê agir bi zikê Basrî Beg î vala xist.

Basrî Beg bi şermokî pirsî:

- Yaho Hemdî, ji bo xatirê Xwedê, çi bi xanima te hat? Min bîstikeke berê, jineke din dît.

Hemdî destê xwe li ba kir û got:

- Teeeew!... Min ji zû de bera wê daye. Min piştî wê, çar jin guhertin. Xwedê mala te ava bike, Basrî. Ma ez mirovekî weha kawik im ku ez emirê xwe bi jinekê bi tenê re derbas bikim? Ma tu min ew qasî bêhiş dibînî? Ma ez ker im? Li min binihêre, ma ez ji wan ehmeqan im ku ez qîma xwe bi jinekê bi tenê bînim? Ka em vexwin!... Noş!...

Serê Basrî Beg dest bi gejbûnê û madê wî jî dest bi xelandînê kir. Araq venedixwar. Carekê di daweta xwe de, carekê du caran jî di ziyafetan de, ji bo xatiran nîv-qedehek vexwaribû. Lê nûha, bi mebesta ku ber dilê wî bigire, her ku Hemdî qedeh dirêjî wî dikir, wî jî bi ser xwe de dadikir. Çavên wî birûsk vedidan.

Wan heta saet yanzdehan vexwar. Tu nemabû ku madeyê Basrî Beg di devê wî re derketiba. Wî xwe bi zorê digirt. Gelo

bi çi awayî bixwesta? Çi bigota? Bi deyn xwestin jî tiştekî çi qasî zehmet e!... Niha bi yekcarî ji desthilanîn ketibû. Ger hindikî bixwaze, Hemdî dê feqîrtiya wî fêhm bike, ger pirî bixwaze... Le ku neda?

- Tifî... Ez di vê jiyanê... Ez di jiyana weha... Tobe, tobe...

Hemdî pirsî:

- Çi bû?

Basrî Beg li xwe hay bû.

- Qet... Qet ne tiştek...

Dev ji pêncî lîreyî berda. Qet nebe, du lîre û nîv bidayê... Ew ê şev nîvê şevê, heta malê çawa peya biçuya?

- Ez ê bi çolê kevim, lo!... Ez ê destê xwe bi serê xwe dim û bi çolê kevim!... Wey Xwedêyo... Tobe, tobe... Ez di vê jiyanê...

- Tu çi dibêjî, lo Basrî? De ka em vexwin... Noş!...

Dev ji pereyan berda. Qet nebe, xwarinek bianiya.

Hemdî got:

- Heydê em biçin. Em ê niha li erebeya min siwar bibin û biçin pavyonekê. Piştî demeke dirêj, min rûyê te dîtiye, ez îşev te bernadim. Ma te bihîstiye ku dansozek hatiye? Dibêjin, ku ew xwe şilfîtazî dike û direqise. De qedeha xwe bi ser xwe de dake...

Du şûşe qedandibûn. Bi vir de û wê de kil bûn û li erebeyê siwar bûn.

- Dibêjin, jinik direqise û xwe tazî dike. Şilfîtazî... Tişt lê namîne... Jê re dibêjin, strîp-tîz, nizanim çi.

Gelo jê re bigota? Wî dê çawa bigota? Ma ew ê nebêje; "Ew qas wext e ku tu li min negeriyaye, îcar tu ji bo pêncî lîreyî ji min bixwazî, hatiyî?".

- Wey Xwedêyo... Ez di jiyana weha...

Pavyon heta ber dev tije dibû. Bi zorê maseyeke vala peyda kir.

- Garson, şûşeyekê veke! Meze ne lazim e, hinik findiq, fistiq û nokên şor bîne...

- Îdare bike, Basriyê min... Noş!...

Pêncî lîre... Ger bidayê, ew ê tavilê rabûya û biçûya.

- Noş!... De Basrî!...

Orkestrayê lê dixist. Lampe vemirîn. Projektoran pîst rohnî kir. Jinik derket ortê, direqisî. Robê xwe derxist. Yabo! Basrî beg westana xwe ji bîr kiribû, birçîbûna xwe ji bîr kiribû, deynxwestin jî ji bîr kiribû.

Jinik direqisî. Pêlava xwe ji pê kir, bazin û guharên xwe derxistin.

Beriya ku Hemdî bibêje, "Ka em vexwin!", Basrî hişk bi qedehê girt û bi ser xwe de dakir.

Jinik direqisî. Jartiyerê xwe derxist, goreyên xwe ji pê kirin. Bi tena pêsîrdank û derpî ma...

- Noş!...

- Noş, Hemdiyê min! Noş, lo Hemdî!...

Jinik direqisî. Kincên ku ji xwe dikirin diavêtin maseyan. Pêsîrdank... Belê, bizmika pêsîrdankê vekir, derxist û çeng kir. Pêsîrdankê zer li hewa daîreyek çêkir û xwe wek zerîleyekê li orta herdu destên Basrî beg danî.

Jinik direqisî. Û... Xwedêyo!... Û derpiyê xwe...

- De, lo Hemdî!... Xwedêyo!... Noş!...

Basrî beg pêsîrdank di kefa destê xwe de guvaşt.

Jinikê çi hebû, ji xwe kir. Temaşevan coş bûbûn. Çepik, fîkandin, qêrîn, dengê çetel û qedehan... Jinik direqisî. Basrî beg jî dîn dibû.

Bi wî qasî jî nema. Ew... Ew xweşika şilfîtazî hat, hat... hat û serê Basrî beg î tazî yê birqokî maçî kir. Qîr û qiyamet rabû.

Lampe vemirîn. Gava lampe vêketin, artîst li ortê tune bû.

Herdu hevalan xwe sipartin hevdu û derketin. Nedihat bîra Basrî beg, bê li ku û çawa ji erebeyê peya bûbû. Xwesiya wî dikir xire xir. Basrî beg kir qîre qîr:

- Rabin kerno, rabin... Ez ji we re dibêjim, rabin!

Çi bi vî mêrikê ku wek milyaketekî nerm û nazik bû, hatibû? Jina wî ji xew çeng bû.

- Xwe tazî bike!... Xwe tazî bike, kerê!... Pîrejinê, tu jî xwe tazî bike!... Na na, niha... Ez ê we têxim bin lingên xwe, haaa!... Ez ê we bidim ber terikan, xwe tazî bikin!

Herdu pîrekên ji tirsa, wek pelên çilo dilerizîn, xwe tazî dikir. Basrî jî xwe tazî dikir. Hemû kincên xwe ji xwe kirin. Fanêrê xwe yê hirî yê pembe yî mildirêj jî ji xwe kir. Di dawiyê de, derpiyê xwe yê dirêj î pînekirî ku devdelingê wî pizîkirî bû jî ji xwe kir.

- Hûn jî ji xwe bikin... Ji xwe bikin, kerno!...

Çiçikên xwesiya wî yên lewliqî, kil dibûn.

- Bimeşin kolanê!... Ez dibêjim, bimeşin, na na, ez ê we bişewitînim... Na na, ez ê we bixeniqînim...

Sê laşên zeîf î şilfîtazî xwe çeng kir kolanê.

- Bireqisin!...

Basrî beg li çepikan xist, kir şeq şeqa tiliyan û dest bi reqisê kir.

Basrî beg ji wê rojê û heta niha, hîn jî şilfîtazî direqise. Niha li timarxaneyê, jê re dibêjin; "Basriyê Strîp-tîz".

# Keçikek roja mahrbirînê reviyabû

Emela şanzdehsalî tam sibeha roja mahrbirînê, ji ortê wenda bû. Lê geriyan, her dever sax kirin. Ji cîranan, ji hevalên wê û ji hemû deverên ku ew dikarîbû biçuyayê hat pirsîn, lê dîsa jî nehat peydakirin. Çû, peyda nabe... Namzedê zavatiyê girt devê derî.

- Kuro, ma qey hûn min bê hiş dihesibînin?... Keçikê bînin, hûn nikarin min bixapînin!... Malek carekê tê firotin, lo!... Rûyê we derket ortê... Ne xwe, hûn keçikê nîşan didin û lawên vî welatî wek qazan dirûçikîne, ha!...

Her ku dê û bavê Emelê digot:

- Gidî, Silêman Efendî, li ber derî neke bire bir, were hindur, em li hevdu bikin!

Zavayê ku çar-pênc salan ji bavê Emelê mezintir bû, bi awayê ku hizûra wan xerab bike, dikir bire bir:

- Em ne ji bo ku bêne şêlandin, hatine vî welatî, lo!.. Şerefa min heye, kuro!.. Min bi kulman pere xerc kirin. We ez mahf kirim. Min dikarîbû bi wan pereyan heyşt jin bianîna. Çi bû, me got ku bila jineke me hebe ku hîn çavên wê venebûbin.

Diya Emelê ya ku hêsir wek baranê dibarandin, li ber wî digeriya û digot:

- Silêman Efendî, ji bo xatirê Xwedê, were hindur, tu çi dixwazî bibêjî!

Silêmanê ku li Mahmutpaşayê tevinkerî dikir, bi awayê ku wan bê hizûr bike, dikir bire bir:

- Yê ku bikaribe fenan li min bike, hîn Xwedê nedaye. Ez zilaman...

Cîran hemû ketin navberê.

Silêmanê tevinker got:

- Bila ew wan pereyên min ên ku min bi wan dane xwarin bidin, ez ê dev ji wan berdim!.. Na na...

Bavê emelê:

- Em çawa bikin, Silêman Efendî, ji xwe, em ê bidin... Qey ez ê keça xwe bidim yekî ji te çêtir... Lê vê qahpikê namûsa min anî perakî. Em xwediyê peyva xwe ne...

Diya Emelê got:

- Bila Xwedê tu kêmaniyê nede te, me çi got, te bi a me kir... Me got şerpe, te şerpe kirî, me got pêlav, te pêlav kirî...

Silêmanê tevinker got:

- Hem jî çi pêlav!.. Gelo silala wê tu pêlavên weha dîtine? Ez ji vira sax dernekevim (paketa çixareya îkincî maçî kir), lawo, a ev na'met li ser pişta min be, min heqê hefteya xwe da wê pêlavê, lo! Gava mêrek bizewice, divê çavê jina wî ne li destan be! Ma ne weha ye, lo?.. Ez beni?.. Ji ber vê yekê, min çi ji keça we re kirîbe, divê hûn hemuyan li min vegerîne...

Bavê Emelê got:

- Ji xwe... Em ê hemuyan li te vegerîne...

Ji jina xwe re got:

- Silêman Efendî, ji wê bênamûsê re çi kirîbin, bîne vê derê!..

Diya Emelê hemû tiştên ku di himbêza xwe de anîbûn, bera erdê dan. Silêmanê tevinker dest pê kir û alavên li erdê yek bi yek jimartin.

- Cotek şimikên bi kabik... Lê binihêre, bê min şimikên çawa kirîne, lo!.. Yên herî biha... Min wê rojê, Mahmut Paşa ser-obinî hevdu kiribû...

Diya Emelê nifir li qîza xwe kir:

- Înşaleh, ber çavên wê bigire...

- Sê metre, ez ji efendimê xwe re bibêjim, navê wê heramê çi bû?... De bila ew jî careke din bibîne û li xwe bike.. Mala min

xerab bû... Min derbeke mezin xwariye, kuro!... Ez van goreyan qebûl nakim, ev hatine lixwekirin.

Diya Emelê got:

- Weleh, bileh, carekê bi tenê xistine pê...

- Bila qe... Malê ku hat lixwekirin, nayê vegerandin. Divê hûn heqê wan bidin, heyşt lîre û nîv... Xwerû naylon e, yanî... Ger hûn bawer nakin, ez ê navnîşana devera ku min jê kiriye bidim we, biçin û li bihayê wê bipirsin... Peşkîrek... Du derpî... Ez van derpiyan jî qebûl nakim. Wek malê bavê xwe li xwe kirine, lo!... Ez ê van derpiyên ku hatine lixwekirin, çawa bidim jina ku ez ê pê re bizewicim?... Şerpe... Qermiçî ye, de tişt pê nayê...

Gava Silêmanê tevinker malên xwe bi şûn de distendin, pîrekên cîranan ji bo ku Emelê mêrekî weha ji destê xwe revandibû, hêrs dibûn.

- Min jê re bi du lîre û nîvan guharek kirîbû, ka ew li ku ye?

Gava hemû mal temam bûn, Silêmanê tevinker, dest bi hesabkirina pereyên ku li Emelê xerc kiribûn, kir:

- Min ew carekê biribû dikana mihalebiyan. Ger tu bibêjî, ji bo çi, min got, bila hertiştî li ba min bibîne. Ger çavên pîrekan neyên dagirtin, çavên wan dê hertim li destan bin... Ezbenî? Min got ku bixwe keçê, dilê te dibije çi, bixwe... Wê got ku ez ji vana dixwazim; qedayifên nên ê biqeymax... Ez bi vê keçikê mahf bûm, lo!.. Min ew sê caran jî bir sînemayê. Min got, bila dinyayê bibîne û ji ber vê yekê, min wê rojê, tew ew li dolmîşê jî siwar kir. Ax ev hişê min, ax!... Kuro Silêman, te çawa pê li feqê kir, lo!... Tifî, lahnet li bavê wê bê... Ez qebûl nakim, mala min şewitî... Min bi qasî heqê apartmanekê pere lê xerc kirin, ez pereyên xwe dixwazim.

Bavê Emelê got:

- Heqê te heye, Silêman Efendî, tu çi bibêjî, heqê te heye, birayê min...

- Ka raweste... Niha, hemû nayên bîra min. Ma hiş maye? Haaa... Min ew carekê jî biribû matîneya malbatan a bê alkohol. Wê rojê, min tam deh banknot lê xerc kirin. Ma li zilamekî wek min, ev tişt tê kirin, lawo?... Ma tê kirin, lo!...

Zîvirî ser bavê Emelê û got:

- Tê bîra te, te dît, gava min êvarekê araqa Qulûbê anîbû malê... Ez masiyê palamîda û bahcanê sor jî nahesibînim. Hey min daye nav, bila ew jî ji kîsê min bin...

Silêmanê tevinker tiştên ku li Emelê xerc kiribûn, li ser hevdu hesibandin, 218 Lîre dikirin.

Bavê Emelê got:

- Em ê hêdî hêdî bidin!...

Silêmên got:

- Ez qebûl nakim. Ez ê we bidim mahkemeyê. Ez ê bibêjim ku wan got, em ê keça xwe bidin te û ez mîna qazan rûçikandim, ez xapandim. Û dû re, ez ê tezmînata manewî jî ji we bistînim... Weha le, we bi şerefa min leyizt...

Di wê navberê de, erebeyek li ber deriyê xirbekê ku bi qaçaxî hatibû avakirin, rawestiya. Emela ku ji erebeyê derket, ketibû rewşeke weha ku nema dihat naskirin. Di hindurê du rojan de, bûbû yeka din. Gava diya wê, bavê wê û Silêmanê tevinker ew di wî dilqî de dît, şaş man. Diya wê ya ku digot, ger ez wê bigirim, ez ê porê wê hilkim, bavê yê ku sûnd dixwar û digot ku ez ê wê bikujim, sar mabûn. Tew devê Silêmanê tevinker ji hev çûbû. Fîstanekî hevirmêş î emprîme yê bêmil lê bû. Destên wê bi bazin... Por ondulekirî, zer boyaxkirî...

Cîranan di guhên hevdu de dikir pise pis:

- Qey bûye artîst...

Gava Emel ket hindur, Silêmanê tevinker hîn diqîriya:

- We pereyên min xwarin... Min bi kulman pere li qîza we xerc kirin, ez 218 lîreyên xwe dixwazim!...

Emelê ji diya xwe pirsî:

- Ev zamote çi dixwaze?

- Pereyên xwe...

- Pereyên çi?

- Te biriye dikana mihalebiyan, gore ji te re kirîne...

Silêmanê tevinker got:

- Na lê, ma ez yekî ku bi qasî behsa pereyan bikim, şîrheram im?... We eyb kir, ew milyonêkî min jî bixwe, li oxira wê ye, ji aliyê min ve, bila hertişt lê xweş helal be...

Emelê serê xwe rakir, birûyekî xwe bilind kir û got:

- Min heta niha dengê xwe nekir, lê ez niha dixebitim. Ger dinya û axiret li min bibin yek jî ez dîsa bi te re nazewicim...

Ji çenteyê xwe yê çerm ê li milê wê bû, sê sed Lîre derxistin, avêtin ber Silêmanê tevinker û got:

- Patronê min 218 Lîreyan wek bexşîşê dide garsonê otêlê, te fahm kir? Ji te re, pereyan bibîne, bila çavên te têr bibin!..

Emelê pişta xwe da wan. Serê xwe bi xezeb zîvirand û careke din di ser situyê xwe re li Silêmanê tevinker nihêrî. Dû re, derî bi hişkînî girt. Gava li erebeya ku li ber derî bû, siwar bû, ji şifêr re got:

- Biajo Beyogluyê!....

Silêmanê tevinker ji diya Emelê re got:

- Min şûşeyeke kolonyayê jî kirîbû, wê jî bidin min, ez ê êdî biçim.

# Polîsê ruhamator

Ez di her cejna Qurbanê de, wê bûyerê bibîr tînim. Hezar û neh sed .... û çi bû? Li gora texmîna min, dê hezar û neh sed sîh û çar be. Apê min sax e. Ez xwendekarê lîseyê me. Li Erenkoyê koşkeke apê min heye. Wî hertim em dawetî koşka xwe dikirin. Apê min dewlemend û koşk jî xweş bû... Lê apê min qet navbir nedidayê û her behsa bîranînên xwe yên eskeriyeyê dikir û em gêj dikirin. Tiştên ku wî behsa wan dikir, ne bîranînin weha hayelah bûn. Gava wî behs dikir, tu kesî nikarîbû îdare bikira. Li vê dinyayê du karên apê min î heyştêsalî mabûn. Yek jê razan bû û yê din jî behskirina bîranînên eskeriyeyê bû. Gava behsa bîranînên xwe nedikir, radiza û gava ranediza jî behsa bîranînên xwe yên eskeriyeyê dikir. Bûyerên ku wî behsa wan dikir, me çil, pêncî heta sed carî li wan guhdarî kiribû.

Lê ger wî carekê got; "Hafiz Paşa" û dest pê kir, êdî dawiya peyva wî tu carî nema dihat.

Apê min di ordiya Hafiz Paşa de, nizanim di alaya topavêjê ya liqa çendan de, fermandarê bataryaya duyem bû. Gava behs dikir, kelecanê ew qasî ew digirt ku wî digot qey ew li eniya şer, li ser serê bataryaya xwe ye, xwe çawa digîhand şûrê li dîwêr daliqandî, ew ji kalên dikişand û bang dikir:

- Mesafe du hezaaaar... Heqê sê kîsik barût... Berdê!...

Rojekê dijmin dora bataryaya apê min digire.

Apê min digot:

- Ne sûcê me bû. Em çar roj û çar şevan ranezabûn.

Min jî dipirsî:

- Apê min î Paşê, we çi kir ku hûn ranezan?

Apê min ji yuzbaşîtiyê teqawît bûbû, lê li gora wî, heqê wî hatibû xwarin. Ji ber ku hevalên wî ji paşatiyê teqawît bûbûn, wî jî digot ku ez paşa me û hem jî jê bawer dikir. Apê min î ji yuzbaşîtiyê teqawît bûbû, piştî heftê û şeşsaliya xwe paşatiya xwe bi herkesî dida gotin. Yên ku ew dû re nas kiribû, digot qey ew bi rastî paşa bû.

Apê min î paşê digot:

- Em çar roj û çar şevan ranezan. Ma me çi kir? Cebirxaneya me qediyabû. De ew ê ha îroj bê, ha sibehê bê, bi vî awayî em çar roj û çar şevan li benda cebirxaneyê mabûn. Hingî em li benda cebirxaneyê mabûn, em hemû batarya di xew re çûbûn. Em bi xirecirekê şiyar bûn. Kêfa me hat, me got qey cebirxane hatiye. Lê em li çi binihêrin, ma dijminan dora me negirtibe!...

Min bi meraq pirsî:

- Êêêêê... Dû re, Apê min î Paşê?

- Dû re, em xelas bûn. Dijminên ku dora me girtibû, ji me bêtir bêxew mabûn. Wan em hêsîr kirin, lê piştî wê, tavilê di xew re çûn. Me jî xewa xwe baş stendibû. Vê carê, me dora wan girt û ew hêsîr kirin. Ji ber vê bûyerê, wan ez kirim paşa. Ez terfiyî ferîqê yekem bûm, lee... Di dema me de, eskerî karekî zehmet bû, ne wek aniha lîstika zarokan bû.

Gava ev digotin, coş dibû, şûrê xwe ji kalên dikişand û wek şêran digurmijî:

- Mesafe du hezaaaar... Heqê sê kîsik barût... Berdê!...

Ji ber ku em ji bîranînên apê min of bûbûn, em ancax ji cejnê heta cejnê diçûn mala wî; şevekê li wira diman û vedegeriyan.

Di wê cejnê de, lawê apê min î piçûk got:

- Ez jî dixwazim bi we re bêm, ev deh sal in ku min apê xwe nedîtiye.

Em bi hevdu re çûn. Ji bo ku tiştekî ne li rê neke, me bi rê de

ew temî dikir:

- Nebî nebî, tu jê re nebêjî apo. Tu ê bibêjî Apê min î Paşê. Apê me bîst salan piştî ku ji yuzbaşîtiyê teqawît bû, rutbeya paşatiyê wergirt.

Em herheyşt endamên malbatê di roja cejnê ya yekem de çûn koşka Apê xwe yê Paşê. Apê min heta raza, behsa bîranînên xwe kir ku kî dizane bê me çend caran li wan guhdarî kiribû. Koşk mezin bû. Bi şev, her yek ji me çû odeyekê.

Wê demê, li Stenbûlê, malên bitelefon pir kêm bûn. A, mala Apê min î Paşê yek ji wan malên bitelefon bû. Ez nîvê şevê, bi dengekî şiyar bûm. Dengê wek ku dibêje; diz heye, ber bi guhên min ket. Min ber bi hêwanê ve baz da. Jina Apê min î Paşê jî ahîze ji destê xwe danî.

- Çi ye, jinapê?

- Gidî, dengê xwe meke, ev çend saet in ku di hindurê malê de xişte xişta yê diz e. Min telefonî qereqolê kir û min got ku diz ketiye koşkê.

Hîn jinapa min peyva xwe qedandibû neqedandibû, bû teqe reqa yekî û ji nêrdewana qatê duyem heta ber me gindirî. Me lê nihêrî ku lawê apê min î piçûk e.

Min got:

- Ev çi halê te ye?

Got:

- Nepirse, gidî zû daşirê nîşanî min bide. Min di hindurê vê zirkoşkê de hew daşir peyda nekir. Ez cîhê bişkokên elektrîkê jî nas nakim. Ev du saet in ku ez di tariyê de li daşirê digerim. Min hemû derî vekirin, keko, ji derveyî deriyê daşirê hemû derî vebûn. Lê daşir li ku ye?

Yê ku jinapa min gotibû qey diz e, lawê apê min î piçûk bû. Gava jinapa min ev fahm kir, got:

- Heywaaax, ew ê ji qereqolê polîsekî bişînin. Em ê niha çi bikin?

- Ger em careke din telefonî wan bikin, ew ê neşînin.

Gava me cara duyem telefon kir, qomisêr got:

- Me polîsek şand, niha di rê de ye. Gava bê mala we, jê re bibêjin ku şaşiyek çêbûye.

Gava hîn em li ser van tiştan dipeyivîn, berê kûçikê koşkê kir ewt e ewt, dû re dengê du fîşekên devançeyan hat bihîstin. Bi dû wan re jî bi hişkînî li zîla derî ket. Bi vê xirecir û teqe reqê, li koşkê ji derveyî Apê min î Paşê, herkes şiyar bû. Berê, ji min û pismamê min pê ve, tu kes şiyar nebûbû. Baş bû ku Apê min î Paşê şiyar nebû. Ger ew bi dengê devançeyan şiyar bûbûya, wî dê bigota qey dijmin hat û şûrê xwe bikişanda û êrîşî me bikira.

Heçî kesê ku şiyar dibû, ji tirsa ji nav nivînan çeng dibû û dipirsî:

- Çi ye? Çi qewimiye?

Li ser hevdu li derî diket. Em hemû bi serê tilikan meşiyan û bi tirs daketin jêrê. Xaltîka min ji pişt derî bang kir:

- Kî ye?

Me dengekî sert bihîst:

- Bi navê Qanûnê, derî vekin!

Gava mêrikê li ber derî, lê nihêrî ku deng ji me dernakeve, bang kir:

- Ez dibêjim; bi navê Qanûnê derî vekin... Na na, ez ê derî bişkînim...

Îcar min pirsî:

- Tu kî yî?

- Gava tu vekî, tu ê bibînî. Wextê derbas nekin, derî vekin.

Gava me derî vekir, me mêrikê polîs li hember xwe dît. Polîs

bi gava xwe ya hindur re bang kir:

- Tev nelivin! Bila kes tev nelive!...

Em li hember wî sar sekinîbûn. Dû re, em bi çavan yek bi yek saxtî kirin.

Got:

- We telefonî qereqolê kiriye.

Min got:

- Belê, şaşiyek... Me got qey diz ketiye koşkê. Lê ne diz bû. Bibuhure, me zehmet da te.

Yê polîs weha bi mahne keniya:

- Hi hi... Şaşî ha... Ne xwe, şaşî çêbû?

Ez jî keniyam:

- Belê... Şaşî le... Me pêjina yekî kir. Me got qey diz e. Bibuhure.

Yê polîs ji nişka ve bang kir:

- Dengê xwe meke... Diz ketiyê neketiyê, ez ji te baştir dizanim. Derkevin jorê!...

Wek ku mirîşkan diqewirîne, em di nêrdewanê re derxistin jorê. Mêrik pir sert bû. Em hemû xistin odeyekê.

- Diz ket malê, we ew girt, dû re giriya û li ber we geriya. Dilê we pê şewitî... We yê diz veşart, ne weha?

Min got:

- Naaa... Weha çênebû.

- Çi? Ma qey we diz ji ber min revand?

- Na lo! Em ê ji bo çi yê diz ji ber te birevînin?

- Ger we ew nerevandibe, diz derxînin. Ez wekî din tu gotinan qebûl nakim.

Jina apê min î Paşê ya pîr dest bi libergerînê kir:

- Welehî û bilehî, diz tune ye, lawê min. Ma ger hebûya, me dê teslîm nekiriba?

- Hi hiiii... Tu vêya ji kê re dibêjî... Em dizanin xaltîkê. Hertim weha dilên wan bi dizan dişewitin û ji polîsan vedişêrin. Dû re jî xanî tên vekirin. Yê diz derxîne!

Bi vê gotinê re devançeya xwe kişandibû. Diya min di guhê min de hêdîka got:

- Em bi tu awayên din xelas nabin, ka em te di şûna yê diz de teslîm bikin. Dû re, gava hûn biçin qereqolê, dê bê fahmkirin. Tu ê bibêjî, ji bo ku em bikaribin ruhên xwe xelas bikin, me weha kir.

Hîn min dengê xwe nekiribû, polîsê birêz got:

- Çi pis pisa we ye? Hûn ji bo revandina yê diz planan çêdikin?

- Weleh na, polîs efendî, bileh na... Diz miz tune ye. Şaşiyek çêbû. Me tu heta vê derê teheband, bibuhure. Me telefonî qereqolê jî kir û me ji qomisêr beg re got. Lê tu berê ketibû rê.

- Ez carekê hatim vê derê, nehatim vê derê! Heta diz dernekeve, ez naçim tu deveran.

Em li ber ketin ku diz neketibû malê. Ez êdî hêrs bûm.

Min got:

- Diz miz tune ye, yaho...

Ez ê di derî re derketima, wî hişk bi beskura min girt:

- Qey diz di nav we de ye? Bila herkes nasnameya xwe derxîne!

Derî li ser me kilît kir. Em yek bi yek dibirin û ji bo anîna nasnameyan berdidan. Piştî ku me hemuyan jî îsbat kir ku em ne diz in, got:

- Wê gavê, êdî karê min e, ez ê niha lê bigerim û yê diz peyda bikim.

Polîs li pêşiyê, em li dû û me dest pê kir em li yê diz geriyan. Polîs bi baldariyeke ew qasî mezin li yê diz digeriya ku me jî êdî hêdî hêdî bawer dikir ku me di mala xwe de diz veşartiye.

Me meraq dikir, bê yê diz dê ji ku derkeve. Em jî bi yê polîs re li hindur malê digeriyan.

Yê polîs hemû ode, kulîn, dolab û sindoq vedikirin û li wan dinihêrî. Li bin qeryolayan, li daşiran dinihêrî, doşek tev didan. Ew zirecêba koşkê di hindurê du saetan de, li bin guhê hevdu ket. Kinc hemû tev li hevdu bûn, pirtûk, xwarin, pêlav tev li hev bûn. Heta gava li binê xalîçeyan digeriya jî devê wî qet nediket tev û her dipeyivî.

- Gava mirov karek kir, divê wek tajiyê ku mirov bi zorê dişîne seydê neke. Ger mirov ji bo pereyan kar bike, tu xêr tê namîne. Niha, ger ji berdêla min polîsekî din bûya, wî dê tavilê ji we bawer bikira. Ma ne weha? We dê ew bixapanda. Lê ez nayêm xapandin. Ji bo çi? Ji ber ku divê mirov ji dil xwe bide karê xwe. Ma ez polîstiyê ji bo meaşê wê dikim? Naa... Di kîjan karî de dibe, bila bibe, ger di hindurê însên de ruhekî amator tune be, êdî tu xêr jê çênabe. Pênc pera nake... Ruhê amatoriyê cihê ye. Pere lazim in. Lê eşqa wezîfeyê tiştekî din e. Kuro, ger ez vî dizî bigirim... Ger carekê bi hinceta ku diz heye, bangî min bikin, şewitî... Ew diz şewitî... Ew têkeve qulmişkan jî ez ê wî peyda bikim. Ev ji çi tê? Ger ruhê amatoriyê bi însên re hebe... Niha, kîjan devera ku lê nehatiye gerandin, maye?

Car carinan ji me, yê ku êdî îmana wan dihat serê bêvila wan, ger bigota:

- Ma diz dikeve wê derê jî?

Yê polîs bi konetî dikeniya û digot:

- Hiii... Me ji çi qulan diz derxistine. Ger niha di şûna min de yekî din li vira bûya, wî dê bigota "çi ji min re" û biçûya. Helbet, piştî ku tu dizê ketiye mala xwe veşêrî, ma bi serê min ketiye... Naaa, lê ev kar ne weha ye!...

- Kekê min, begê min, em rica dikin. Weleh, tu belasebeb lê digerî. Heyfa keda te. Me şaşiyek kir ku me got diz heye. Wey xwezîka me negotiba.

- Pir baş bû ku we got. Ji ber ku hûn ê bê qey diz tune ye, lê diz heye. Diz di zemanekî ku mirov qet texmîn nake de, bi derbekê re derdikeve hemberî mirov. Ez ê yê diz bigirim. Mal be û diz tune be. Ne mimkun e... Ev şopa lingên kê ye? Ka werin vê derê. Lingên xwe bînin... Devera ku diz lê tune be, tune ye, diz li her deverê heye. Piştî ku mirov xwe ji dil dabe karê xwe... Di vî meslekî de cîh ji valahiyê re tune ye... Em li jorê negeriyan, ne weha?...

Weha peyivî û peyivî û di koşkê de, qulek jî nehişt ku lê nehatibe gerandin. Alavên vê koşkê êdî di mehekê de jî nema bi cîh dibûn. Bi tenê qatê herî jorê mabû ku lê nehatibû gerandin. Apê min î Paşê li qatê banî radiza. Li pêşiyê, polîsê ruhamator, bi dû wî de jî em, gava em di nêrdewanê re derdiketin, me dengê halana Apê min î Paşê ji jorê de bihîst. Apê min î ku di xewna xwe de, di dema xwe ya eskeriyeyê de dijiya, xuya bû ku bi qerepera me şiyar bûbû. Apê min î Paşê li serê nêrdewanê xuya bû; derpiyekî dirêj û kirastaqiyekî şevê yê ku heta ser çongê dadiket, lê bû û şûrê wî yê tazî di dest de êrîşî me dikir:

- Bataryaya duyem!... Hedef... Raqim... Heqê sê kîsik barût... Berdê!...

Polîsê ruhamator di ser serê me re wek çivîkekî firiya, heyşt pêlik kirin yek û canê xwe bi zorê ji destê şûrê Apê min î Paşê xelas kir. Me dîsa dabû dû yê polîs. Me hemuyan ji koşkê bazda.

Apê min î Paşê digot qey em dijmin in û dora bataryaya wî jî ji aliyê dijminan ve hatiye girtin. Di herî dawiyê de, me baw-

eriya polîsê ruhamator anîbû ku di koşkê de diz tune ye. Lê Apê min î Paşê ji wê rojê û pê ve, qet bawer nekir ku em ne dijmin in. Ruhamatoriya Apê min î Paşê zora ya polîs biribû.

# Yepetaş

Piştî ku ez demeke dirêj bêkar geriyam, rojekê gava ez li ser pireyê dimeşiyam, min bi dengekî bilind bi xwe re minaqeşe dikir, bê gelo xwekuştin mêrxasî ye an na.

Yekî hişk bi milê min girt:

- Ma tu dîn bûyî, Nûrî?

Min hevalê xwe yê dibistanê nas kir. Navê wî bi derbekê re, nehat bîra min.

- Ez nizanim, dibe ku ez dîn bûme, hayê min jê tune ye.

Em bi hevdu re dimeşiyan.

- Tu çi karî dikî?

- Ev du sal in ku ez her sibeh saet di heyştan de ji malê derdikevim... Ez heta nehê êvarî li kar digerim.

- Karekî zor e.

- Zor mor. Kar kar e. Li Stenbûlê çi qas mieseseyên resmî û taybetî hebin, navnîşana min li ba hemûyan heye. Ez ji kê kar dixwazim, dibêjin ku tu navnîşana xwe bide me, em ê bi nameyê te agahdar bikin.

- Niha, mehê sê sed bes e?

- Tinazê xwe bi min neke!

- Ka bi min re were.

Em li teqsiyekê siwar bûn û li ber devê deriyê mixazeyeke pir mezin peya bûn. Li ser cama vîtrînê "Yepetaş" hatibû nivîsîn.

Em li qatê mixazeyê yê yekem ketin buroyekê.

Hevalê min got:

- Ez ecêbmayî dimînim. Tu di dibistana me de yê herî tembel, yê herî zexel bû. Te lîse bi zorê qedand. Te xwendina bilind jî nekir. Tu têra xwe jî bêhiş î. Tevî vê rewşê jî tu çawa

nebû xwediyê karekî?

Min got:

- Qey kêmaniyeke min heye.

- Ev Yepetaş a min e.

- Yepetaş çi ye?

- Yedek parça Türk Anonim Şirketi. Ger tu herfên serê gotinan bînî ba hevdu, dibe Yepetaş.

- Şirîkên te yên din kî ne?

- Şirîk mirîk tune ye. Li ser kaxizê, min jina xwe û dişa xwe wek şirîk nîşan dane. Gava şîrket be, hem mişterî bêtir pê bawer dibin û hêsantir dixapin û hem jî di warê bacê filan de rehetî... Ka niha dev jê berde, tu ê dû re fêrî hemû tiştan bibî!

- Tu li vira çi difiroşî?

- Qet!...

- Çawa qet?

- Qet û qet. Li vê zirmixazeyê binihêre. Ma tu tu tiştî tê de dibînî?

Bi rastî jî di zirmixazeyê de, ji derveyî palmiye û sosinên di çend qafikên mezin de, tu tişt tune bû. Refik vala bûn.

- Li Adana, Konya, Meletye, Îzmîr û Ankarayê pênc şûbeyên şîrketa min hene. Ger tu bixwazî, ez ê te jî bikim gerînendeyê şûbeyeke ji wan ji şûbeyên ku ez ê nuh vekim. Niha, sê sed. Lê kengî tu fêrî kar bû, meaşê te dê heta hezarî bilind bibe.

- Ez ê çi karî bikim?

Ji dolaba dosyeyan deftereke mezin û qalind derxist.

- Li vira, nav û bihayên alavan hatine nivîsîn.

Min li rûpelê yekem ê defterê nihêrî. Ev hatibûn nivîsîn: "Batarya, mîla tekeran, şaft, gumlegê silîndir, mexrûtê piçûk..."

- Tu dikarî tavilê dest bi kar bikî.

Em daketin jêrê. Ez û zilamê ku li ber destegaha gwîz a dirêj bi hevdu dan naskirin:

- Saîm... Nûrî beg...

Piştî wê, got.

- Nûrî beg dê li ba te stajê bike.

Û çû. Ji bo ku ez fêrî kar bibim, min çavên xwe baş vekiribûn. Saîm beg çixare pêşkêşî min kir. Hîn me çixareyên xwe ne qedandibûn, du gundî ketin hindur.

- Selamin aleykim.

- Aleykim selam, axano... Kerem bikin.

Saîm hurmeteke mezin nîşanî gundiyan dida.

- Ma emirekî we heye? Fermo, ma hûn rûnanin?

- Tu sax bî, begê min, serê me di belayê de ye.

- Traktor?

- Erê le... mîla traktorê ya hereketê şikest. Karê me li erdê ma. Em ê çawa bikin? Ma li ba we heye?

- Wax wax wax[1]... Hebû, lê me bîstikeke berê firot. Ger hûn pênc deqîqe berê hatibana...

Gundiyekî li çonga xwe xist û got:

- Wax li min!

- Dibe ku li ba yekî hebe... Ger nefirotibe...

- Gidî em di bextê te de ne, begê min... Me lê bipirsiya...

Hûn heqê wê bidin. Piştî du rojan seriyekî li vira bixin...

- Xwedê ji te razî be. Çi qas pere?

- Bi Xwedê, ev tiştekî weha ye ku... Beriya pênc deqîqeyan me bi bîst û pênc lîreyan firot. Li ba me hebûya, hêsan bû.

- Tişt nabe, ruhê min, bila hema em ji karê xwe nemînin.

- Mêrik pir bênamûs e. Ez nizanim, gelo ew ê bi du sed û pênciyî bide?

Herdu gundiyan di nav xwe de kir pise pis. Dû re du sed û pêncî lîre dan.

- Oxira we a xêrê be...

Di navberê de pênc deqîqe derbas bûn nebûn, gundiyekî din

ket hindur:

- Ma li ba we volan heye?

- Mirêkçerx heye, lê volan tune ye.

- Ji min re volan lazim e.

- Niha peyda nabe. Li ba yekî heye, lê mêrik pir bênamûs e, mîna berxê ku li maka xwe ketiye.

- Bila hebe, bila bixwaze. Ev hefteyek e ku traktor wek berateyekê di nav erd de veketiye.

- Tu hela sê sed lîreyî bide, em ê binihêrin, dibe ku em wî razî bikin. Ger hîn bêtir bixwaze, em ê bidinê, tu ê dû re bidî me.

Mêrik sê sed lîre dan.

- Sibehê were û bibe.

- Tu sax bî, begê min.

Ew derket, îcar yê li dû wî hat, mirêkçerx xwest.

Ji wî re jî got:

- Li ba me volan heye, me mirêkçerx bîstikeke berê firot.

Yê ku mîla dewrê dixwest, jê re digot, mîla şanzimanê heye, yê mîla şanzimanê dixwest, jê re digot; mîla dewrê heye.

- Ma milê pistonê heye?

- Pîston heye, lê milê pîstonê tune ye. Me bîstikeke berê firot. Lê li ba mêrikekî bênamûs heye. Ger ne firotibe...

Ew derdiket, yekî din dihat û dipirsî:

- Diranê fitêza anaryayê heye?

- Ax, me aniha firot...

- Bilyayên girover hene?

- Bilyayên masûrî hene. Lê ger tu bixwazî, li ba yekî bênamûs heye. Pir bênamûs e... Bi bihayê bazara reş difiroşe.

Yê ku diket hindur û derdiket, çend sedek datanî.

Gundiyek hat hindur û pirsî:

- Gelo aksa me hat? Min pêr heftsed û pêncî lîre dabûn we.

Saîm beg got:

- Me peyda kir, lê birayê min, mêrik ew qasî bênamûs e ku heft sed lîreyên din jî dixwaze.

Mêrik hef sed lîre jî dan. Saîm beg ji yê dezgahdar re got:

- Baz bide, biçe Apostolayê û aksê bîne.

Gava yên ku pereyên xwe berê dabûn û sîparîşa alavan kiribû, dihatin, Saîm beg yê dezgahdar dişand ba Apostola, Vasile, Avramayê.

Êvarî, hevalê min ê xwediyê Yepetaşê hat.

Ji min re got:

- Çawa ye?

Min got:

- Pir baş e...

- Tu dibînî ku li ba me qet tu tişt tune ye. Em li vira qet difiroşin. Gava me êvarî derî girt, divê bi kêmanî çend hezarek ketibin kasayê. Lê deftera me pir bi rêk û pêk e. Ma ne weha ye, Saîm beg?

- Belê, ezbenî.

- Em li gora bihayên fatûrayê, li defterê dinivîsînin. Nûrî, tu çi dibêjî, ma tu ê bikaribî ji heq derkevî?

- Belê... Min kar fahm kir. Êdî, ez dikarim bixebitim.

Di wê navberê de, du gundî ketin hindur.

- De ka em te bibînin...

Min ji gundiyan re got:

- Fermo, axano.

- Ma qayişa perwaneyê heye?

Bê ez ji Saîm beg çawa fêr bûbûm, min weha dest pê kir.

- Ax!... Qayişa perwaneyê hebû, lê me ew bîstikeke berê firot. Ger hûn bixwazin, qayişa şalan heye. Lê ka rawestin, temam... Li ba yekî qayişa perwaneyê heye.

- Bi çi qasî ye?

- Li bihayê wê qet nepirsin. Mirov şerm dike ku bibêje. Pêzevengekî ew qasî bênamûs û şîrheram e ku... Qelenê diya xwe dixwaze. Kêmî sed lîreyî nade, bêedebê heram... Însan di binya wî re çênebûye, yekî bênamûs, canbaz e, xelkê dişêlîne. Qeda pê keve!...

Gundiyan sed lîre dan. Min hîn jî xeber didan:

- Durziyê bêxîret... Ma qayişa perwaneyê bi sed lîreyî dibe? Lê mirov ê çi bike? Em di destên şîrheraman de mane. Ne dîn û ne jî îman bi vî kûçik lawê kûçikî re heye...

Gundiyan ez tesdîq kirim û got:

- Belê, weha ye beg.

Û çûn. Min digot çawa be, ez ê bêm qewirandin, ji ber vê yekê, min jî xwe tam hazir kir ku ez bidim dû wan, hevalê min got:

- Helal bi ji te re, ev çi qabiliyet e... Maşaleh tu di rojekê de fêrî kar bû. Ez meaşê te, ji niha de dikim pênc sed.

Ev şeş meh in ku ez li mixazeya Yepetaşê kar dikim. Meaşê min derket hezarî. Ji bo vî hezarî, ez ji sibehê heta êvarî, ji dê û jina patronê xwe re xeberan didim. Her ku ew dibihîse, pişta min miz dide û dibêje:

- Bijî, lo!... Tu eyn ew zilamê ku ez lê digeriyam î!...

# Mirêkên bimûcîze

Di apartmana îtxalatkarê perçeyên makîneyan Dawid Soyuvar de, ziyafetek dihat dayin. Di nav kesên dawetkirî de ev hebûn: Gerînendeyê "Banka Labadayê", jina wî ya çik î ciwan, dişa wî ya çavfireh, ji siyasetvanên me yên dijwar Hemze Yatmaz, jina wî ya nezok, Medenî begê xwedî milk û hatineke pir, sekretera wî xanima Îpekê ya çavbihîvî, ji ticarên me yên Adanayî Hecî Osman Bayir û metresa wî.

Spîkêrê radyoyê dipeyivî:

- Guhdarên hêja! Konsera me ya muzîka tirkî ya klasîk a vê êvarê, li vê derê qediya. Niha, di saeta "Îcadên Nuh" de, mihendisê bilind Mekkî Îşlev dê dest bi axavtina xwe bike.

Jina gerînendeyê Banka Labadayê ya çik î ciwan got:

- Eman, ez ji dengê vî zilamî jî qet hez nakim.

Hecî Osman Bayirê Adanayî got:

- Ez bi qurbana we bim, destûrê bidin ku em lê guhdarî bikin. Heftaya berê, behs kiribû ku bê "ji kaxizan çawa pembo tê çêkirin"...

Mihendisê bilind Mekkî dest bi peyvê kir:

- Guhdarên ezîz! Di saeta "Îcadên Nuh" a vê hefteyê de, ji vê gava ku min li ser bikaranîna atomê ya di xizmeta mirovan de dest bi peyvê kir û pê ve, li Atom-Yorka bajarê Amerîkayê, îstasyona atomê ya mezin dê dest bi xebitandinê bike. Ev îcada atoma nuh, mûcîzeyeke weha ye ku mirovan li xwe ecêbmayî dihêle. Li kîjan devera dinyayê dibin bila bibin, tîrêjên atomê dê tesîrê li hemû mirêkan bikin û ev mirêk dê ji gava ku çêbûne û heta wê cara herî talî ku we lê nihêriye, hemû xeyalên ku tê re xuya bûbûn, nîşan bide. Bo nimûne: Li mala

we mirekek heye ku ev bîst sal in, hûn wê bi kar tînin. Di hindurê bîst salan de, çi qas xeyal di vê mirêkê re xuya bûbin, gava tîrêjên atomîk dest pê bikin, hemû xeyal dê di mirêkê de merasîmê bikin. Ceribandinên heta niha, bi serkevtinê qediyane. Bi vê îcada ecêb, dê îmkan çêbibe ku hûn ê di mirêkên xwe re, ciwaniya xwe, zaroktiya xwe, bîranînên rojên destpaxilan û bi hevdu re razane, temaşe bikin.

Sibehê, piştî saet nehan li ber mirêkên xwe bin!

Jina gerînendeyê Bankaya Labadayê destên xwe li hevdu xistin û got:

- Haho, çi xweş e, çi xweş e... Mirêkek min heye ku ez wê ji dema zaroktiya xwe û vir de bi kar tînim. Ez ê li hemû jiyana xwe temaşe bikim.

Ji ser sifreya ziyafetê rabûbûn û li salonê komik bi komik li ser vê mûcîzeya mirêkên atomîk dipeyivîn.

Ji siyasetvanên me yên dijwar Hemze Yatmaz, ji Medenî Begê dewlemend î xwedîxatir re bi pise pisê ev gotin:

- Dosto, ev îcada nuh, tiştekî ecêb e... Ew ê bibe sebeb ku gelek rastî derkevin meydanê. Di wextekê de, li Gerînendeya Ewlehî, bibihure, lêxistina li kerekî li min hatibû kirin. Hema ez çawa serbest hatim berdan, min ji tiba hiqûqî raporeke panzdehrojî wergirt ku tê de hatiye nivîsîn, min lêdan xwariye. Min bi wê raporê, serî li dadgehê da. Gava li dadgehê nehat îsbatkirin, bê kê li min xistiye, weha hat fahmkirin ku min li xwe xistiye.

Medenî Beg got:

- Baş e, lê Hemze Beg, çi elaqa wê û mirêkan heye?

- Tu çi dibêjî? Ma çawa tune ye? Gava min lêxistin dixwar, min dît ku mirêkek li dîwêr daliqandîbû. Ew mirêk dê hertiştî derxîne meydanê.

Medenî Beg got:

- Bi rastî jî weha ye. Mahneya wê ew e ku ez ê bi saya van mirêkan çil-pêncî hezar lîreyî têxim bêrîka xwe.

- Tu ê vî karî çawa bikî?

- Pir hêsan e. Ev ê bi saya mirêka krîstal a li ber bufeyê pêk bê. Tu pê dizanî, ji demeke dirêj û vir de ye ku ez û Altingula keça mala Kallavîzadeyan, em bi hevdu re radizên.

- Erê... Tu kes nema ku pê nehisiyaye.

- Bavê wê ew neda min. Keçikê jî bîranînên xwe zû ji bîr kirin. Halbûkî mahneya zewaca min a bi keça Kallavîzadeyan re ew e ku ez ê li ser milyonan rûnim.

- Belê?...

- Ez û Altingul, em li apartmanê li hember mirêka bufeyê bi rojan bi hevdu re razane. Sibehê zû, hemû sahneyên evînê dê di mirêkê de dubare bibin. Ez ê mirêkê bibim ba Kallavîzadeyan. Tu fêhm dikî, ew ê ya keçikê bidin min, ya jî ew ê mecbûr bimînin ku mirêkê ji min bikirin.

- Le ger ew bibêje, nabe?

- Wê gavê hîn çêtir e... Ez ê mîna tiyatroyê wê nîşanî herkesî bidim û pereyekî pir jê qezenc bikim. Bijî mirêkên mûcîze...

Jina Dawid Soyuvarê îtxalatkarê perçeyên makîneyan jî bi metresa Hecî Osman Bayir Fistiqa Xanima çavbihîvî re dipeyivî:

- Ez dikim û nakim, nikarim wî xortî ji bîr bikim...

- Kaplan?

- Belê... Ax Kaplan...Wî ez çi zû ji bîr kirim. Niha, ez ê herim hemberî mirêkê û wan bîranînên xweş ji nû ve bijîm.

- Ez ê jî halê xwe yê berê nîşanî mêrê xwe bidim û heyfê jê hilînim. Ma gava wî ez nas kirim, ez weha bûm? Niha min naecibîne. Ma ne zilam e!...

Hemû kesên li salonê bi dilgeşî behsa îcada nuh dikir û bi kêf dikeniyan.

Fistiqa Xanimê digot:

- Ax, bila bibe sibeh...

Dişa gerînendeyê Bankaya Labadayê ya çavfireh digot:

- Em ê heta sibehê çawa bisekinin? Sebira min qet nemaye. Ax bîranînên kevin!.. Ax ciwanî...

Hin ji bo dîtina rehmetiya diya xwe, hin jî ji bo dîtina zaroktiya xwe, bi kêf bûn. Li zîla derî ket. Ê ku hat, jînekologê naskirî operator Dr. Şahap Cenabettîn Beg bû. Ruyê doktor zipîzer bû. Pir westiyayî xuya dikir.

Xwediyê malê jê pirsî:

- Çi ye doktor, ma tu nexweş î?

Zimanê doktor li hev geriya û bi nalîn got:

- Ma we nebihîstiye?

- Çi doktor? Ma xebereke xerab heye?

- Ma hîn ew ê çi bibe?...hayê we ji bayê felekê tune ye. Bîstikeke berê di radyoyê de hat gotin: Bi tîrêjên atomîk hertişt dê di mirêkan re derkeve meydanê.

Mirovên dilgeş ên ku salon dagirtibû, bi tîqe tîqê keniyan.

- Ma çi ji vêya xweştir û bikêftir heye, doktor?...

Doktor Şahap Cenabettîn qêriya:

- Hûn hemû dîn bûne!

Dû re bi milên mêran girt û ew ji jinan xewle kirin:

- Ev îcada nuh, mirina min e. Li odeya min a emeliyatê, tam li hember maseya emeliyatê mirêkek heye...

- Belê?...

- Ma hûn fêhm dikin? Ez mahf bûm. Hemû kurtaj, hemû zarok jiberkirin... Belê, hertişt, heta ên din jî dê ji sibehê û pê ve, di mirêkê re merasîmê bikin...

Zilamên ku li vêya guhdarî kir, bi tepan çûn serê xwe...

- Wey lawo!...

- Ev qet nehatibû hişê me.

- Hemû rezaletiya me...

- Heta cinayeta min a bidizî.. Çîk... Yanî qesda min tiştekî din bû.

Jinan pise pisa zilaman bihîstibû. Jina Dawid Soyuvarê îtxalatkarê perçeyên makîneyan naliya û got:

- Bextiyariya min a malbatî ya bîstsalî mahf bû. Mêrê min dê bi hertiştî bihise... Şifêr, dû re şifêrê din... Hertişt li ber mirêkê bûbû...

Fistiqa xanimê got:

- Ma mirov çi dizane ku mirêk dê rojekê peyvê bigerîne...

Jina Hemze Yatmazê ji siyasetvanên me yên xurt piştî sê caran naliya, got:

- Ax gurêxê min... gurêxê min...

Dilê wê ji bîr çû.

- Min her sibeh, ji bêrîka wî... Ax her sibeh ji cuzdanê wî... Gava ew razayî bû, min ew kar dikir. Pê nedihisiya. Niha, ew ê bi hertiştî bihise.

- Piçeke kolonyaya lîmonê... Zû keça min... Dilê wê dike ji bîr biçe.

Hecî Osman Bayir got:

- Divê min ew şixul bi navmaliyê nekiriba, şeytên ez çawa ji rê birim.

Dengê ax û waxan bi salonê ketibû. Piştî bîstikekê, salon bi yekcarî ker bû.

Doktorê bi nav û deng Jînekolog Operator Şahap Cenabettîn bi dengê xwe yê qalind ve, ev bêdengî xerab kir:

- Beg û xanimên ezîz!... Ma tu şika we jê heye ku ev îcada nuh mirêkên atomîk bextiyariya me hemuyan xerab dikin?

- Na...

- Qet...

- Ev mirêk dê me mehf bikin.

Doktor lib bi lib dipeyivî:

- Ev mirêkên ku tîrêjên atomê xwe bidin wan, dê sîstema welêt a civakî xerab bikin.

Cîh bi cîh deng bilind dibûn:

- Erê... Lê em dikarin çi bikin?

- Ma çi ji destên me tê?

- Ma çareyeke xelasbûnê heye?

Doktor Şahabettîn bang kir:

- Rêya xelasbûnê bi tenê ew e ku divê em hemû mirêkan bişikînin û perçe bikin.

Medenî Beg got:

- Ev jî ne bes e... Divê em wan perçe perçe bikin...

Sekretera çavbihîvî, Xanima Îpekê bi wî dengê xwe yê nerm î xweş, got:

- Em perçeyên wan di curnan de bikutin û hûr hûrî bikin...

Yên dawetkirî çûn malên xwe.

Wê şevê, li hemû malên bajêr şirqîn û xirecireke nedîtî hat bihîstin.

Çopavêjên ku serê sibehê, kolan paqij kirin û çopên apartmanan anîn, şaş man. Her dever bi mirêkên şikestî û hûr hûrî mişt bûbû.

Sibehê saet tam di nehan de, spîkêr di nav muzîkê re weha got:

- Hevwelatîno!... Mirêkên dinyayê ên herî xweşik, ew in ku ên nivîsandina Mûcîzeyê li ser wan hene. Bi tenê resimê we yê ku gava hûn lê dinihêrin, nîşan dide û dû re hertişt jê diçe. Bala xwe bidin merqeyê: Mirêkên bimûcîze... Mirêkên bimûcîze...

Xwediyê fabrîkeya mirêkên bimûcîze, di rojekê de bûbû

milyoner.

# Li plajê mêrikek fetisî

Di vê nivîsê de, ne piça mibalexeya pêkenînê û ne jî ya lihevanînê heye. Li plajê mêrikek fetisî. Ez ê tiştên ku min dîtine û bihîstine, wek ku bûne binivîsînim.

Garsonên restoranta plajê mêrik bi meqbûza hesêb nefetisand.

Gava qeyik gîhaşt peravê, jin, mêr û zarok marokên ku plaj dagirtibû, li dora wê civiyan. Xanimeke bimeraq a ku li dawiyê mabû, ji aliyekî ve ji bo derbasî pêşiyê bibe û baştir bibîne, bi ser ên li pêşiyê dikir bire bir:

- Lawo, ji ser serê mêrik vekişin, ew ê ji bêhewabûnê bifetise!...

Û ji aliyê din ve jî xwe di nav qelebalixê re radikir. Wan mêrik ji qeyikê derxist û serserkî kil kir

Keçeke ciwan ji meraqan, bê pêsîrdank ji kabîneyê pengizî, destê xwe bi kêfa mizgîniyekê dihejand û bang dikir:

- Yadê, yadêêê!... Baz bide, mêrikek fetisiye!

Zarokan destên xwe li hevdu dixistin û dikeniyan:

- Fetisiye, fetisiye!...

Jineke ciwan a ku ji mayoyê wê yê lasteks av diherikî, dikir qîje wîj û qelebalix ji ber xwe dida alî. Gava çav li mêrikê ku li ser qûmê dirêjkirî bû, ket, kir haho û xwe avêt ser mêrik. Li xwe dixist, porê xwe hildikir, digiriya û digot.

- Hemdiyê min, Hemdiyê min!...

Mêrikekî kin î qelew ê ku diloqiya, bazda. Jinika ku digiriya rakir û got:

- Ez li vira me!...

Jinika ciwan û xweşik xwe çeng kir himbêza mêrikê qelew î serrût.

- Ax... Min got, qey tu bû, Hemdiyê min...

Hemdî jinika xweşik bir gazînoya plajê. Li ser maseyê çend pîrekên din hebûn. Yekê ji wan got:

- Keçê, ma tu devera wî mêrikî dişibiya Hemdî?

Mêrikê ku fetisîbû, yekî bejindirêj î zeîf î ciwan î portof bû, Hemdiyê jinika ku digiriya jî yekî qamkinik î qelew î kal î serrût bû. Jinika ku digiriya, di guhê ya din de kir pise pis:

- Min dizanîbû ku ew ne Hemdî bû. Min ji dekan, weha kir, ji bo ku ew bizanibe, bê ez çi qasî jê hez dikim...

Li ser serê mêrikê ku li ser qûmê dirêjkirî, ji her seriyekî dengek derdiket:

- Doktor... Ma li vira doktor tune ye?

- Yaho, vekişin, bila mêrik bêhna xwe bide û bistîne!...

- Ev çi plaj e!... Ka parêzgerê vê derê li ku ye?...

- Gelo mêrik miriye?...

- Ji zûûûû de!...

- Sînga wî bidewisîne... Milên wî ji hevdu vekin û bigirin!

- Ezbenî, ji vira telefonî qereqolê bike...

- Qereqol dê çi pê bike?... Ne cinayet e ku... Divê mirov telefonî nexweşxaneyê bike.

- Wî serserkî kil bikin...

- Nebî nebî, milên wî tev nelivîne... Ew ê xerabtir bibe...

Di vê navê de, xwediyê plajê hat.

- Ka ew Bekirê bênamûs li ku ye?... Xwedêgiravî, me jî ew ji bo parezgeriyê girtiye... Çûye binê kîjan cehenemê?

- Ew ê li ku be... Di qulikên kabînan re, li pîrekan temaşe dike.

- Li nebza wî binihêrin!...

- Ma dilê wî diavêje?

- Serçavê rebenko reş û şîn bûye...

Jinikek bi ser zarokên xwe de radibû:

- We dît... Xwedê mirov bistirîne. Ji niha û pê ve hûn nikarin biçin devera ku qama we derbas dike.

Xebatkarên plajê bi dest û lingên mêrik girt û ew xist hindurê kabînekê.

Niha, mirov li plajê bûne komik bi komik û her li ser vî mêrikê fetisî dipeyivin:

- Êdî çû. Di binê deryayê de, tam saetekê maye.

- Keko, ma bû noqav(!), ma mirov qet saetekê di binê deryayê de dimîne.

- Dibe ku xwe kuştibe.

- Ez qet texmîn nakim... Nedişibiya mirovê ku dê xwe bikuşta. Min bi çavên xwe dît, rûyê wî ne ew rû bû...

- Bira, tu ji bo çi li ruyê wî dinihêrî?... Cîranekî me jî xwe kuştibû...

- Dûrî van deran be...

- Ger bi avjeniyê nizanibe, bila nekeve avê... Qenc bûye...

- Hiş, lawo...

- Hevalên wî dibêjin ku wî pir xweş avjenî dikir.

- Xwe tê dakiriye û careke din nema derketiye...

- Ger bi zikê birçî ketibê, ji wê jî çêdibe...

- Araq vexwariye...

- Hah, temam... Ger bi serxweşî ketibe avê...

- Dibe ku nexweşiya dil pê re hebû...

- Ma di wî emirî de, nexweşiya dil bi mirov re çêdibe?

- Kramp ketiye lingê wî...

Doktor hat. Polîs hat.

Çar jinan xwe li ser qûmê dirêj kiribû û dipeyivîn:

- Ax, divê te bidîta, yekî wek şêrekî bû...

- Çavên wî jî xweşik kesk, keskekî ku orta wî pêl bi pêl...

- Mijankin wî hebûn... Aha weha weha...
- Heyf...
- Diranên wî paqij... Sipîboz wek libên birincê.
- Ax, ger mirov bizanibe ku mirov dê bimire...

Mêrik beriya nîvrojê fetisîbû. Gava ez êvarî ji plajê çûm, hîn jî ji birûyên wî û rengê çavên wî bigirin, heta zêrbûna diranekî wî, li ser hertiştên mêrikê mirî dihat peyivîn.

# Hişê xwe bi pêş de bibin

Polîsê dedektîvê navdar Sherlock Holmes û Nat Pinkerton hefteyeke berê hatibûn Stenbûlê. Serê sibehekê li wê otêla ku ew lê diman, zîla telefonê bi dilşewatî lê ket.

Di telefonê de dengê jinikekê. Jinikê bang kir û got;

- Yarê min... Yarê min...

Û telefon hat birîn.

Di destekî Sherlock Holmes de telefon hebû û destê wî yê din jî li ser cênîka wî bû, piştî bi qasî saetekê fikirî, ji Nat Pinkerton re got;

- Min jinika ku telefon kir, nas kir.

PIRS:

1- Ya telefon kiribû kî bû?

2- Telefon ji bo çi hat birîn?

BERSIV:

1- Jinika di telefonê de yara Sherlock Holmes bû.

2- Di nêviyê axavtinê de qutbûna telefonê, li Stenbûlê bûyereke pir normal e.

Lê Nat Pinkerton hilmeke kûr li boçika çixareya xwe xist û got;

- Tu şaş î, Mister Holmes. Yara te bîstikeke berê çû masiyan, ne mimkun e ku wê telefon kiribe.

Di wê navê de telefon lê ket û dengê eynî pîrekê hat bihîstin.

- Yarê min!.. Yarê min!..

Telefon hatibû girtin.

Sherlock Holmes şewqê xwe heta ser bêvila xwe daxist û

got;

- Nat, cînayetek li ber me ye.

Lê Nat Pinkerton tiştek got û Sherloc k Holmes wê gavê fahm kir ku ev ne cînayet e.

PIRS:

Gelo Nat Pinkerton ji Sherlock Holmes re çi got?

BERSIV:

Nat Pinkerton got;

- Ev jinik di telefonê de li yarê xwe digere. Lê li Tirkiyeyê gava mirov li numarayeke telefonê bigere, mitleqe ew devera ku mirov lê nagere derdikeve.

Di wê navê de, jinekeke ku porê xwe hil dikir, di derî re ket hindur û got;

- Hûn ji bo çi bersiva telefona min nadin? Yarê min mir...

Sherlock Holmes piştî ku qalûna xwe di nava diranên xwe de sê caran bir û anî, pirsî;

- Xanim, yarê te li ku miriye?

- Serê sibehê ketibû serşokê. Ez heta nîvê şevê li bende wî mam, gava derneket, min meraq kir. Wexta min deriyê serşokê vekir, min dît ku di serşokê de fetisiye.

Nat Pinkerton hingî ecêbmayî ma, dev li destê xwe kir û got;

- Bawer neke, Holmes. Bi namûs, ev jinik derewan dike!

PIRS:

Gelo Nat ji bo çi weha gotibû?

BERSIV:

Nat Pinkerton dizanîbû, li Stenbûlê ava bi qasî ku têra feti-

sandinê bike, ji kaniyan **nedihat.**

Sherlock Holmes got;

- Himmm!...

Dû re berê xwe bi jinikê vekir;

- Xanim, ne mimkun e ku yarê te di avê de fetisî be!...

Pîreka ciwan bang kir;

- Kê ji we re gotiye ku ew di avê de fetisiye? Musluxa gazê vekiriye!...

Pirqîniyeke wek dengê ku di temsîlên radyofonîk de caman dihejîne, bi Nat Pinkerton ket.

PIRS:

Nat Pinkerton ji bo çi keniya?

BERSIV:

- Esabên wî tev li hevdu bûne.
- Na.
- Çav li tiştekî ketiye.
- Na, we tê dernexist.

Nat Pinkerton dizanîbû ku ji musluxên gazê ji berdêla gazê, hewa paqij dihat.

Sherlock Holmes û Nat Pinkerton çûn mala jinikê. Mêrikek li serşokê dirêjkirî bû. Nat Pinkerton piştî ku bi destmala xwe nav lingên mêrik nixumand, got;

- Mister Holmes, musluxa gazê veke, bila hebekî hewa paqij bê.

Sherlock Holmes ji navmaliyê pirsî;

- Beg kengî hat malê?

- Gava ku mêrê xanimê ne li malê be, tê. Ji pireyê saet di heft kêm çarîkekê de li keştiyê siwar dibe, saet di heft û nîvan de

digihêje vira.

Nat Pinkerton got;

- Xanima Domestik tu derewan dikî.

PIRS:

Nat Pinkerton ji bo çi ji navmaliyê bawer nekiribû?

BERSIV:

Ji ber ku Nat fêr bûbû ku li Stenbûlê keştî tu carî di wextê xwe de hereket nakin.

Sherlock Holmes îfadeyên sekreterên mêrik girtin:

- Hûn dikarin bibêjin, bê we beriya mirina beg, ew cara dawî kengî û li ku dît?

Ji sekreteran yekê got:

- Terbiyeya min rê nade ku ez bersiva pirsa we bidim.

Nat Pinkerton bi diranên xwe simbêlên xwe kurisandin. Di vê navberê de, yeka din got:

- Ya ku herî talî ew dît, ez im. Em saet di çaran de ji Taksîmê li minîbusê siwar bûn û di pênc kêm çarîkekê de hatin Beyazitê. Dû re ez jê veqetiyam.

Nat got;

- Hevalê, tu derewan dikî!

PIRS:

Nat Pinkerton ji bo çi weha gotibû?

BERSIV:

Édî hûn fêr bûnin, hûn ê bibêjin, ji ber ku li Stenbûlê minîbusek di çil û pênc deqîqeyan de, ji Taksîmê nayê Beyazitê.

- Na!

- Ji ber ku wê rojê hejmartina nifûsê hebû û minîbus nedixebitîn.

- Na!... Nat ji bo ku jinikê şaş bike û ji îfadeya ruyê wê, rastiyê fahm bike, weha gotibû.

Nat Pînkerton di cîhê xwe de, hebekî fikirî û got:

- Min mesele fahm kir, Mister Holmes.

Dû re ji bêrîka xwe mercekek derxist, da ber tavê û çixareya xwe pêxist.

Sherlock Holmes di wê navberê de got;

- Ma hayê te jê heye ku cînayeteke gelek girîng li ber me ye?

Nat Pinkerton bang kir û got;

- Mister Holmes, min di dawiyê de, delîlek zevt kir.

Mêrikê mirî ji cîhê xwe got;

- Mister Nat Pinkerton, tiştê ku te zevt kiriye, doxîna min e, ez rica dikim nekişîne!

Sherlock Holmes ji mêrikê mirî re got;

- Dengê xwe bibire! Li gora delîlên bicîh ên ku di destên me de hene, divê tu miribî!...

PIRS:

Yê mirî çawa peyivî?

BERSIV:

Nivîskar jî ji bo vêya li qulpekê digere, lê peyda nekir.

# Fabrîkeya beroşên bipispîsk

Paraztina endustriya welêt, wezîfeya me hemuyan e.

Gava fabrîkeya beroşên bipîspisk bangî çapemeniyê kir, kêfa min pir hat. Em gelek rojnamevan li wê derê bûn. Hîn li ber derî diçûn pêşiya mêvanan. Gerînendeyê fabrîkeyê miroveki devliken bû. Ji cîhê xwe radibû, li ber deriyê hêwanê bi destên rojnamevanan digirt, diket milên wan û ew li ser qoltixên rehet didan rûniştandin.

Ez pir kêfxweş bûm ku endustriya neteweyî li welatê me, bi qasî ku beroşên bipîspîsk çêbike, bi pêş de ketibû. Gerînende piştî ku yek bi yek çixare îkramî me kir, pê li bişkoka zîlê kir. Ji zilamê xwe yê kincpaqij re got:

- Ji began bipirse, binihêre bê çi emir dikin...

Dû re, berê xwe bi me vekir û got:

- Ava me ya çîlekan heye, tahma wê pir xweş e.

Hejmara me rojnamevanan li dora sîhî bû. Ji me hinan re çay û qahwe û ji hinin din re jî ava çîlekan hat. Em berê li ser rewşa hewê peyivîn. Em ji wira hatin ser sînemaya me ya welêt, dû re jî karên ku ji bo pêşdebirina masîgiriyê divê bên kirin. Di nav re çend pêkenînên mistehcen hatin gotin û hemû keniyan. Ji ber ku di nav me de, zilamên ku her henekên ne di cîh de dikirin hebûn, hêwan bûbû wek sahneya tuluatê. Tew carekê, mihendizê fabrîkeyê dermanek tewsiyeyî rojnamevanekî kir ku ji hebika bawesîra xwe gazind dikir. Gerînende bi awayekî nazik em hemû dawetî firavînê kirin.

Li ser maseya dirêj, ji gunikên beranan heta havyarê, ji şîrê çivîkan heta yê devan, ji goştê nêçîrê heta goştê devan, hertişt hebûn.

Dema xwarinê ew qasî bi ken û henekan derbas bû ku heta, hevalekî me yê ku hêta mirîşkê di dev de keniya, tu nema bû bifetisiya.

Piştî xwarinê, qahwe hat vexwarin, çixare hatin kişandin. Piraniya nivîskarên rojnameyan ên beşa ekonomiyê, ji ber ku

karin wan ên din hebûn, doza lêbihurînê kir û got:

- Malûm e, rojnamevanî...

Û ji fabrîkeyê çûn.

Ji ber ku me hemûyan hertişt dizanîbû, em ji muzîkê heta bombeya atomê, ji tiyatroyê heta balafirên jet, di her babetî de bi desthilatdarî peyivîn.

Saet bûbû pêncê êvarî.

Yê gerînende got:

- Kerem bikin werin bufeyê.

Bufe ew qasî bi rêk û pêk bû ku ji ber firavîna ku me xwaribû hîn nehatibû ferikandin, em li ber ketin. Ji bo madê me lê vebe, me zor da alkoholê. Me bi mezeyên sar re votka, bi mêweyên teze re şerab, bi şekirokan re lîkor, bi mêweyên hişk re araq, bi gelek celebên penêr re bîra û bê meze jî vexwarinên biyanî ên wek vîskî û cînê vexwarin.

Hin hevalên din jî çûn. Ji ber ku min bi xwe qîmeteke zêde dida endustriya neteweyî, ez li bende bûm ku bê di derheqê fabrîkeya beroşên bipîspîsk de, me dê kengî agahdarî werbigirta.

Ber bi saet heyştan ve, em sê kes mabûn. Yek nivîskarekî sporê, yê din jî hevalê ku di rojnameyekê de xaçerêza çapraz çêdikir û ez, nivîskarê pêkenînê.

Gava yê gerînende mîna ku bibêje; "Me ew bi xwarin û vexwarin kirin, ma ev zilam hîn li benda çi ne?" li çavên me nihêrî, min hêdîka ji nivîskarê sporê pirsî:

- Ew ê çawa bibe?

- Gerînendeyê birêz dê min bi erebeya xwe bigihîne malê, ez li benda wî me.

Yê din jî gerînende hevalê wî ye kevin e. Tu tiştê ku diviyabû bihata axavtin jî nemabû...

Min bi fediyokî ji yê gerînende pirsî:

- Gelo ez dikarim di derheqê fabrîkeya we de, agahdariyê werbigirim?

Gerînende bi awayekî şaşmayî, pênûsa xwe ya qurşûn di nav diranên xwe de eciqand û got:

- Haaa, fabrîke? Hûn dizanin ku ev fabrîke... pîspîsk... yanî... fabrîkeya beroşên bipîspîsk e. Li fabrîkeya me, rojê bîst û heft beroşên bipîspîsk tên çêkirin. Gava ez hatim, randimana rojane pênc beroş bû. Hêviya min ew e ku em ê di nêzîk de, vê hejmarê derxîne çil beroşî. Hûn pê dizanin, hikûmetê xistiye programa xwe ku digel divê her hevwelatî bibe xwedî xanî, divê bibe xwedî alav jî. Ji ber vê sebebê, em ê randimana fabrîkeya xwe bilind bikin. Lê em pêrgî hin dijwariyan dibin. Ez tika dikim ku tu ê van dijwariyan di rojnameya xwe de nenivîsîne, ez bi taybetî ji te re dibêjim. Alavên ku ji bo fabrîkeya beroşên bipîspîsk lazim in, yanî beroş, qapaxa beroşê, burxe, pîspîsk û hemû perçeyên din ji Amerîkayê tên. Lê em li vê derê, wan pev dixin û beroşên bipîspîsk çêdikin. Yanî ev bi saya xwêdana karkerên tirk çêdibe. Em etîketeke madenî ya ku "Malê welêt" lê hatiye nivîsîn jî li ser dixin. Ev etîket jî ji Amerîkayê tên. Fabrîke bi sermayeya tirk û amerîkiyan a hevbeş hatiye avakirin. Pere ji me û aqil ji wan!

Lê di van demên dawiyê de, ji ber ku perçe nayên, em di çêkirina beroşên bipîspîsk de, zehmetiyê dikişînin. Beroşên me yên bipîspîsk ji her aliyî ve, di ser ên Ewrûpa û Amerîkayê re ne. Beriya hertiştî, dengê pîspîskên me pir şêrîn e. Mesela, em bibêjin ku we fasûlî xist beroşa xwe û keliya, ne weha? Pîspîsk ew qasî şêrîn, ew qasî bi aheng lê dixe ku hûn ê bibêjin, qey di radyoyê de grûpeke sazan lê dixe. Halbûkî, beroşên bipîspîsk ên Amerîka û Ewrûpayê ji nişka ve, dengekî weha zirav derdixîne ku ji ber wî dengî, çend pîrekên avis tirsiyane û ber

avêtine. Wekî din jî pîspîskên me hîn dirêjtir lê dixin. Yanî ji her aliyî ve, di ser malên biyaniyan re ne. Lê wek min got, em nikarin alavan peyda bikin. Şikir ji Xwedê re, li welatê me pîspîsk pir in, lê beroş tune ne. Niha, me ji bo vê, çareyek peyda kiriye. Em bi tenê pîspîskan çêdikin û pêşkêşî piyaseyê dikin. Kesê ku dixwaze, bila beroşa xwe bi xwe bikire û xwarina xwe çêbike. Bila carinan biçe lê binihêre, ger xwarin çêbûbe, ji bo xeberê bide, bê xwarin çêbûye, bila li pîspîskê bixe. Ew ê bi vî awayî, bibe xwediyê beroşa bipîspîsk.

Feydeyên wê yên wekî din jî hene: Yê ku bixwaze, dikare ji berdêla pîspîskê, borî, keman an defê bi kar bîne. Wê gavê, beroşên bikeman û bidefê dê çêbibin ku ev îcad bi tenê mexsûsî me ye. Ger beroşên bidefê çêbibin, li malê û li taxê, yê nebihîse ku xwarin çêbûye, dê nemîne.

Min ji ber agahdariyên ku hatin dayin, spasiyên xwe pêşkêşî yê gerînende kirin û ez ji fabrîkeyê derketim. Roja piştî wê, rojnamevanên di ziyafetê de bûn, di derheqê fabrîkeya ku em lê geriyabûn, weha nivîsîbû:

"Endustriya me ya ku bi pêş de diçe"

"Beroşên me yên bipîspîsk ji her aliyî ve, di ser ên Ewrûpayê re ne"

"Em salê bîst û pênc milyon beroşên bipîspîsk çêdikin."

Û hîn çi û ne çi...

# Ez şelafiyê naxwazim

Ket hindurê servîsa weşanê. Li servîsa weşanê, em neh heval dixebitin. Ev cara yekem bû ku min ew didît. Gava ew ket hindur, heval hemû rabûn ser xwe. Bi dû tevan re jî ez rabûm ser piyan. Ji ber ku min nizanîbû, bê ew kî bû, ez ê qet ranebûma.

Ji hevalan yekî niqurçand min û got:

- Şişşş, Cazim Beg...

Gava min navê "Cazim Beg" bihîst, ez çeng bûm ser xwe. Pereyên mêrik ji 20-30 milyonî zêdetir in. Bi ser de jî patronê me ye.

Bi dengekî bilind got:

- Rûnin!

Em hemû bi hevdu re rûniştin, bi tenê Şewkî li ser piyan ma.

Cazim Begê gotê:

- Ev rabûna ser piyan çi ye... Ez ji şelafiyê hez nakim...

Şewkiyê ku hîn li ser piyan bû, digot:

- Li ser seran ezbenî, li ser seran. Em ê rûnin, ezbenî! Heqê cenabê te yî mezin û hêja heye, begefendî...

Lê dîsa li ser piyan çik sekinibû. Ger bi tenê weha çik sekinîba, dîsa baş bû, destên xwe danîbûn ser bişkoka çakêt a pevxistî, situyê xwe xwar kiribû, duta bûbû.

Şewkî beg şêfê servîsa me ya weşanê ye. Ev tiştekî eşkere bû, Cazim begê nedixwest ku ji ber dewlemendbûna wî, şelafî jê re bê kirin.

Eferim ji mêrik re. Ez li Şewkiyê ku li hember wî destên xwe dane ser hevdu dinihêrim, lê qet fêhm nake.

Hercar peyvên Cazim begê dubare dike û dibêje:

- Belê, begefendî. Herkes bila li karê xwe binihêre.

Cazim begê bi taybetî ji wî re jî bi dengekî hêl got:

- Rûne!

Şewkî got:

- Tu emir dikî, ezbenî, ez ê rûnim.

Lê dîsa rûneniştt. Rezaletiya weha nehatiye dîtin. Mêrik eşkere dibêje ku ez ji şelafiyê hez nakim û ew hîn jî situyê xwe xwar dike û dibêje, belê ezbenî.

Ger li ba min ba, min ê bi dawa wî bigirta, bikişanda û bi ser de bikira bire bir:
- Rûne kuro, rezîl!

Cazim beg bi yekcarî hêrs bû.
Got:
- Rûne, yaho! Ez ji tiştên weha hez nakim... Rûne û karê xwe bike!
- Li ser seran, ezbenî, tu emir dikî...
Dibêje, lê rûnane. Dibe ku Cazim beg biçûya, an jî tiştek ji yekî ji me bipirsiya, lê hingî li Şewkiyê ku situyê xwe û pişta xwe xwar kirine, dinihêre, şaş maye. Ne dikare biçe û ne jî tiştekî ku dixwaze bipirse.
Vê carê bi dengekî nerm got:
- Rûne, birayê min. Ez rica dikim, rûne... Xwe eciz neke.
Şewkî jî got:
- Ez rica dikim, ezbenî, estexfurulah... Eciziya çi... Bila em di hurmeta li hember cenabê te yê mezin de qusûrê nekin...
Cazim begê xwe negirt û keniya, lê kenekî xerab bû. Pir eşkere bû ku hêrs bûbû.
- Navê te Şewkî beg bû, ne weha?
- Belê, ezbenî.
- Şewkî beg, ez ne ji axavtinên weha û ne jî ji merasîmên weha hez dikim.
- Ez tika dikim, ezbenî, çawa dibe, estexfurulah... Ez tika dikim, ma qet weha dibe.
Şeytan dibêje ku rabe û bi pişta destê xwe du şîrmaqan biavêjê, bi milê wî bigire û wî bi rûniştkirin bide! Hevalan ji bo Şewkiyê şêfê servîsa me ya weşanê digot, şelaf, lê min bawer nedikir....

Hîn meheke min jî çênebûbû ku min li vira dest bi kar kiribû.

- Rûne, birayê min!

- Ma qet çêdibe, ezbenî, ez di hizûra cenabê te de fedî dikim ku rûnim. Destûrê bide min ku ez li ser piyan rawestim. Ez weha bêtir rehet im.

Li ber digere, hema tu nemaye ku bigirî...

Cazim beg hêrs bû. Gava fahm kir ku ew ê nikaribe Şewkî bi rûniştkirin bide, piştà xwe da wî û berê xwe bi me vekir û got:

- Ez ji şelafiyê hez nakim, we fahm kir? Careke din, gava ez têkevim hindur, divê tu kes ranebe ser piyan. Bila herkes bi karê xwe mijûl bibe.

Gava Cazim beg bi wê hêrsê di derî re derket, Şewkiyê ku hîn li ser piyan bû, bi dû wî re got:

- Belê ezbenî, li ser seran...

Em çûn firavînê. Min ji hevalan, ji Kerîm re got:

-Yaho, ev çi zilamekî şelaf e... Min yekî weha ne dîtiye û ne jî bihîstiye!

Kerîm got:

- Modeya şelafiya weha hilat. Jê re dibêjin, şelafiya rojhilatî.

- Ma şelafiya rojhilatî û rojavayî jî heye? Ji xwe, ev şelafî mexsûsî rojhilatê ye.

- Naaa... Weha nebêje... Şelafiya ewrûpayî jî heye. Modeya şelafiya rojhilatî derbas bû, kevin bû... Te fahm kir? Modeya wê hilat. Pêwîstiya her miroveki bi şelafekî heye. Tu hîn nuh hatiyî, tu nizanî. Heçî Cazim beg e, dibêje ku ez ji şelafiyê hez nakim. Lê bila têkeve destê şelafekî ewrûpayî, tu wê çaxê wî bibînî. Tew gava mirov dewlemend be, divê ileh ji xwe re

şelafekî peyda bike. Cazim begê me mirovekî pir reben e. Bîstsîh milyonên wî hene, malê wî, milkê wî, çiftlika wî, apartmanên wî, erebeyên wî, jina wî, metresên wî hene, lê qet ne bextiyar e. Ji ber ku şelafekî wî tune ye. Gava hertim dibêje "Ez ji şelafiyê hez nakim", mahneya wê ew e ku "Ez şelafekî li gora dilê xwe peyda nakim". Dilê min pir bi vî rebenî dişewite. Ma karê sekreterên ku li ba milyonerên emerîkî dixebitin, çi ye? Şelafî. Lê şelafiya wan, şelafiya rojavayî ye...

Min got:

- Kerîm, te ev ilim xitim kiriye.

Got:

- Min xitim kiriye... Min hem ilimê vî karî xitim kiriye û hem jî felsefeya wî... Tu ê bibînî, di nêzîk de gelek tişt dê çêbibin.

Hîn di ser axavtina me re hefteyek derbas nebûbû, gelek tiştên ku Kerîm digot, ew ê di nêzîk de çêbibin, dest pê kir. Meaşê min du sed û pêncî lîre bû. Meaşê Kerîmê ku berî min bi sê mehan dest bi kar kiribû jî bi qasî yê min bû. Piştî wê axavtinê bi hefteyekê, meaşê Kerîm bi derbekê re bû sê sed lîre. Yên ku ev du-sê sal in dixebitîn û hîn jî sê sed û pêncî lire diket destên wan, dest pê kir û di ber xwe de peyivîn. Hîn ew di ber xwe de dipeyivîn, meaşê Kerîm bû çar sed. Meaşê Şewkiyê şêfê me jî çar sed bû.

Ha ha, Kerîm bi pênc sed lîreyî li ser serê me bû şêf û Şewkî jî bû cîgirê wî. Tew Kerîm ji hefteyê rojekê, an du rojan dihat kar. Pir neçû, Kerîm bi heft sed û pêncî lîreyî tayinî servîseke din bû.

Her ku meaşê Kerîm zêde dibû, mesafeya di nav me û wî de jî zêdetir dibû. Hevalên wî yên kevin jê re digot; Kerîm beg. Tew gava Şewkiyê şêfê servîsa me yê kevin, Kerîmê ku berê li ba wî dixebitî, dibîne, bişkokên xwe pev dixin û bi wî re weha

dipeyive; "Begefendiyê min, cenabê te yê mezin".

Me carekê bihîst ku Kerîm bi Cazim begê re çûye Ewrûpayê gerê. Piştî ku ji gerê vegeriyan, bi qasî ku me bihîst, meaşê Kerîm bûbû, du hezar lîre. Lê di du hezaran de jî nesekinî. Tiştê ku min cara talî bihîst, pênc hezar bû. Tu kesî pê nizanîbû bê wî çi kar dikir... Dihat gotin ku ew sekreterê Cazim begê ye, alîkarê wî ye, wekîlê wî ye... Gava Cazim beg ne hazir bûya, Kerîm ji berdêla wî hemû karên wî dikirin. Dû re, ev hat guhertin. Êdî gava Kerîm ne hazir bûya, Cazim begê ji berdêla wî karên wî dikirin.

Ev Kerîm ne yekî weha jîr û jêhatî, ne jî zane ye, çi hunerên vî mêrikî hebûn, tu kesî fahm nedikir. Min dizanîbû ku ew bi saya şelafiya rojavayî weha bilind bûye. Lê min nizanîbû, bê ev şelafiya ewrûpayî karekî çawa ye. Min di dawiyê de, ew jî fahm kir.

Pênc-şeş mieseseyên Cazim begê hebûn. Devera ku me lê kar dikir, karê wî yê herî kevin bû. Ji herkesê ku li mueseseyê dixebitî re hat gotin ku salvegera damezrandina mieseseyê ya bîstî dê bê pîrozkirin. Heryekî ji me meaşek îkramiye stend. Wê şevê, bi ser de jî li restoranta otêleke ji wan otêlên mezin, ji bo heyştê kesî ziyafetek jî hat dayin.

A, ez di wê ziyafetê de fêr bûm ku bê şelafiya ewrûpayî, wê sira biserkevtina Kerîm çi ye. Li serê maseya ziyafetê Cazim beg rûniştibû û li kêleka wî jî Kerîm. Ez li aliyê Kerîm î çepê û bi sê kursiyan jê wê de rûniştîbûm. Min pir meraq dikir, ji ber vê yekê, min guhê xwe dida her gotina Kerîm û min bala xwe baş dida her tevgera wî. Tam gava Cazim begê bi mebesta noşkirinê rahişt qedehê, Kerîm bi destê wî girt û got:

- Nabe! Tu dizanî ku tu pê diêşî...

Cazim begê got:

- Ez rica dikim, qedeheke bi tenê...

Kerîm sert bû:

- Gava mirov got; nabe, nabe... Tu dizanî, ger tu dixwazî vexwe... Lê dû re, neke sûcê min. Tu dizanî ku ji bo dilê te ne baş e!

Cazim begê qedeha ku ji bo noşkirinê rakiribû, danî cîhê wê û li ser kursiya xwe rûnişt.

Carekê, Cazim begê got:

- Hindur germ e, wê pencereyê vekin!

Bi gotina wî re, Şewkiyê şelafê rojhilatî berî garsonan ji maseyê çeng bû. Ji aliyekî ve bang dikir û digot:

- Tu emir dikî, ezbenî.

Û ji aliyê din ve jî ber bi pencereyê ve dilezand.

Dengê Kerîm î sert hat bihîstin:

- Bihêle! Pencereyê veneke!

Dû re, berê xwe bi Cazim begê vekir û got:

- Yaho, tu çi dikî? Weleh, tu wek zarokan î... Te xwêdan daye, ruhê min... Ma tu dizanî ku ger niha pencere bê vekirin, dê çi bibe?

Cazim begê got:

- Weleh, min xwêdan nedaye.

- Çawa te xwêdan nedaye. Ma qey ez nizanim bê te xwêdan daye, an na, ruhê min...

Cazim begê av dixist qedeha xwe. Kerîm bang kir:

- Êêêêê!... Tu çi dikî, ji bo xatirê Xwedê, ma qey tu dîn bûyî?

Cazim begê got:

- Qet. Ez avê dixim qedehê.

Kerîm serê xwe vir de û wê de kil kir:

- Hela, hela... Bi navê Xwedê, tu ecêb î... Ma ez dihêlim ku tu avê vexwî? Madem tu tî bûyî, ji bo çi tu ji min napirsî?

Garson! Zû, şûşeyeke sodayê bîne!...

Cazim begê bixwesta çi bike, Kerîm nedihişt. Kerîm çi bigota, wî jî wek berxikan bi a Kerîm dikir. Car carinan, wek zarokên şûm delaliyê xwe li Kerîm dikir û digot:

- Destûrê bide, ez qedehekê vexwim, ez rica dikim...

- Nabe, me got nabe, nabe, ruhê min... Tu qet guh nade siheta xwe...

Kerîm bi reheti dikarîbû berevajiya tiştê ku bîstikeke berê kiribû, bikira. Kerîmê ku bîstikeke berê, nehişt pencere bê vekirin, niha tevî ku herkesî xwêdan dabû, ji Cazim begê re got:

- Ma ne germ e? Tu eciz bûyî...

Cazim begê got:

-Naaa... Ez eciz nebûme!

- Tu eciz bûyî, eciz bûyî... Ez dizanim. Bila wê pencereyê vekin.

Şelafê me yê rojhilatî Şewkî kêr û çetel ji nişka ve ji destê xwe avêtin û pengizî.

Got:

- Tu emir dikî, ezbenî!

Û ji bo vekirina pencereyê baz da.

Cazim begê got:

- Yaho, min çend caran got!... Ez ji şelafiyê hez nakim!... Bihêle, ezbenî, garson dê pencereyê veke. Çi ji te re?

Şewkî got:

- Li ser seran, tu emir dikî. Ez ê rûnim. Ez rica dikim ku tu ê xwe eciz nekî!

Cazim begê ji Kerîm pirsî:

- Ma destûr heye ku ez çixareyekê bikişînim?

Kerîm got:

- Lê bi tenê yekê. Ger tu bixwazî yeke din jî bikişînî, ez

nahêlim... Îro, ev bû çixareya çaran.

Guhên min û çavên min wer li wan bûn.

Carekê Kerîm got:

- Yaho, min çend caran ji te re got ku gava tu diçî ziyafetan, van kincên sport ên rengê qahweyî li xwe neke... Îlelah... Mû bi zimanê min ve şîn hat. Tu ji zewqê qet fêhm nakî... Ger ez te deqîqeyekê bi tenê bihêlim, tu ê ilehî çewtîtiyekê bikî.

Min li Cazim begê nihêrî. Zirmilyoner bûye zarokekî şûm.

Got:

- Bibuhure, min ji bîr kir...

Kerîm ji yên li ser maseyê re got:

- Weleh, ev zilamekî wek zarokan e! Hûn pê nizanin.

Şelafê rojhilatî Şewkî xwe avêt ortê:

- Ez rica dikim, ezbenî, estexfurulah!

Cazim beg bi ser wî de rabû:

- Hiş, tu dengê xwe meke! Ev çi zilamekî şelaf e, ya rebî. Ez wek zarokan im, hi... Helbet, ez wek zarokan im... Ger ne ji Kerîm begê bûya, ez heta niha, çend caran nexweş ketibûm û miribûm...

Kerîm li saeta xwe ya destan nihêrî û got:

- De heydê, rabe ser xwe! Wexta te ya razanê hat. Heydê rabe...

Cazim begê situyê xwe xwar kir û got:

- Em piçekî din jî rûnin!

- Naaaabe... Saet neh û nîv... Heta em bigihên malê, ew ê bibe deh. Tew em dereng jî man... Saet tam di dehan de, divê tu têkevî nav nivînan. De heydê, rabe...

Gava Kerîm rabû, destê xwe avêt qedehê. Min tavilê bi destê wî girt û got:

- Tu çi dikî, ji bo xatirê Xwedê... Ev demek e ku ez bala xwe didimê, ev bû qedeha pêncan. Ma tu li siheta xwe qet nafikirî?

Destê xwe hilîne!

Ez baş bi ser wî de rabûm. Kerîm li ber min geriya:

- Ez rica dikim, ez ê vêya jî vexwim!

- Vê carê tişt pê nayê, lê ez careke din nebînim.

Kerîm destê xwe danî ser girmilê min û ez xewle kirim û got:

- Eferim! Te ferqa navbera şelafiya rojhilatî û rojavayî tavilê fahm kir... Hîn gelek ders hene ku divê em ji rojavayê bistînin. Em hîn nizanin şelafiyê jî bikin. Meaşê te çi qas e?

- Du sed û pêncî...

- Min meaşê te kir pênc sed. Sibehê, ji berdêla Şewkî tu ê bibî şêf, ew ê jî bibe alîkarê te...

Şewkî bazdabû û hatibû ber derî û ji Cazim begê re şelafî dikir.

- Xwedê emirê dirêj bide, begefendiyê min... Tu sax bî, her hebî. Te di ziyafeta îşev de, em bextiyar kirin.

Min bi ser wî de bang kir:

- Xwe ji wira bide alî, ya ya şelaf!...Te şelafî jî rezîl kir, xwe bide alî!... Bicehime, bila çavên min careke din bi te nekevin.

# Doktorê esaban

Doktorekî esaban î ciwan gelek rê bi kar anîn û li orta bajêr muayenexaneyek vekir. Lê sedem çi bû, mişterî, bibuhurin yanî nexweş nedihatin. Ne li Ewrûpayê îxtîsaskirina wî, ne jîrbûna wî û ne jî zanebûna wî bi kêrî qezenckirina pereyan dihat.

Toqa malê, bi hemû giraniya xwe ve ketibû situyê wî. Fikirî û dîsa bi alîkariya zanebûna xwe ya di warê doktoriyê de, rêyek peyda kir. Li ser lewheyekê "Rojên yekşeman mişterî tê qebûlkirin" nivîsand û bi deriyê xwe ve daliqand. Eynî îlan da rojnameyan jî.

Li gora ku mirov rojên yekşeman li malê bê kar rûdiniştin, wê rojê dê esabên wan ji rojên din bêtir xera bibûna. Ma li vî zirbajarî, îmkan heye ku esab xerab nebin? Piraniya doktoran rojên yekşeman, li nexweşan nedinihêrî.

Tiştên ku doktorê esaban ê xort difikirî, pêk hatin. Roja yekşema yekem a ku îlan di rojnameyan de derket, zîla derî lê ket. Mêrikek bi qêrîn ket muayenexaneyê û got;

- Doktor beg, esabên min xerab bûne, dermanekî tevizandinê bide min.

Dest û lingên wî dilerizîn.

Doktor got;

- Çi bû? Çi derdê te heye? Bibêje!

Mêrikê biesab dest pê kir û got:

- Êdî hat vira min. Êdî bes e! Mirov nikare rojeke yekşemê jî li mala xwe bêhna xwe berde. Ev çi ezab e ku ez dikşînim?

- Tu ji kê gazinan dikî?

Dê ji kê be... Ji jina xwe, helbet. Xwedêgiravî ew êdî nema

dikare tehamulî vê jiyanê bike. Hingî li jêrzemînên birutûbet dijî, hestiyên wê riziyane. Ew jî mirov e... Dixwaze bigere. Xwedêgiravî li vê dinyayê du roj emrê însên heye. Piştî ku mirov vî emrî jî bi ax û waxan derbas bike... Ez jî zirzamote mim, min jina xwe rojeke yekşemê jî nexistiye milê xwe û min ew ne biriye sînemayê û ne jî tiyatroyê... Doktor beg, ez rica dikim, ez ketime derdê ruhê xwe û ew jî li benda kêfa xwe ye. Ez difikirim, bê ez ê çawa zikê zarokan têr bikim, bê ez ê çawa bikim da ku ez bikaribim, kumê Elo bidim serê Celo, jinik jî dixwaze biçe tiyatro û sînemayê... De hêrs nebî, ez te bibînim...

Her ku yê nexweş mîna zembereka ku xwe vala dikir digot, çavên doktor dadigeriyan. Doktor êdî li wî guhdarî nedikir, li jiyana xwe ya malbatî difikirî. Bîstikeke berê, wî û jina xwe şerekî eyn wek ê vî nexweşî kiribû. Jina wî gotibû ku em ê di vê hewa xweş de, ileh bigerin.

Di vê navberê de, nexweşekî din ket hindur û got;

- Doktor beg, dest û lingên min wek pelên çilo dilerizin û nexweşiya min a dil jî heye. Ez di bextê de me, tu ruhekî din didî min, tu çi dikî bikî... Ay, dilê min dike ji bîr biçe. Xwedê min ji derdê kirê xelas nekir. Ma ev xwediyên xaniyan! Ax, ax!.. Yekşem yekşema Xwedê ye... Rojeke yekşemê jî nahêlin mirov li malê, xwe rehet bike. Zirrr derî... Çi ye? Kirê... Hem jî Xwedêgiravî em bi erzanî tê de rûdinin, ne însaf, ne dîn û ne jî îman bi me re heye û em heqê herkesî dixwin... Hîn çi û ne çi... Piştî ku min surahî di serê wî de şikand, min rast berê xwe da vira.

Doktor got;

- Fermo, rûne, ez ê reçeteya te binivîsînim.

Lê hişê wî li ba xwediyê xaniyê wî bû. Du roj berê, wî jî ji

doktor re gotibu ku ew dixwaze heqê kirê zêde bike. Yan na, wî dê doktor bida dadgehê. Ji ber esaban, destên doktor dilerizîn.

Gava reçete dinivîsî, nexweşê sêyem ket hindur. Vî rebenî jî bê rawestan niqrîsk vedidan û xwe radihişt û li erdê dixist.

- Ez qediyam... Tişt di min de nema!... Êdî mirov nikare bijî...

- Çi bi te bûye?

- Naaa... Kêr gîhaşt hestî. Êdî bes e, çi dibe, bila bibe. Doktor beg, ez ketim bextê te, derziyekê li min bixe. Dilê min diêşe... Ax, ev şifêrên ha, ev şifêr!

Gava yê nexweş ji şifêran gazin dikir, hişê doktor jî çûbû ser wê bûyera do. Do bi şev, wî û şifêrekî dest xistibû qirika hevdu. Ger wî du lumînal li ser hevdu nexwaribûna, ew ê do bi şev nîkarîba raketa. Wek ku ew şifêr dîsa li hember wî bû, esabên doktor rakişiyan. Ji bo çi hutukek tam li orta bêvila wî nexistibû?

Jineke navsere hema çawa ket mûayenexaneyê, li erdê rast bû. Doktor jinik bi zorê anî ser hişê wê.

Jinikê çavên xwe vekirin venekirin, dest bi girî kir û got;

- Ev çi azab e ku ez tê de me?

Li gora ku jinikê behs dikir, rebenê jî ji lawê xwe yê bêxêr gazin dikir.

- Doktor beg, taqeta min nema...

Gava doktor ji bo tevizandina esabên jinikê, derzî li wê xist, îcar hişê wî çû ser birayê wî . Bûbû wek zamoteyekî, hîn jî bi kêrî tu tiştî nedihat. Bi ser de jî diçû û dihat û pere dixwest. Wî jî eyn wek lawê vê jinikê her digot ku ileh, ez ê bibim artîst.

Gava doktor wek ku şîrmaqekê li ser çavên birayê xwe dixe, xwe livand, şiringe ji destê wî ket û perçe perçe bû.

Nexweş li dû hevdu dihatin. Salona payînê heta ber dev tije

bûbû. Hin kesan bang dikir, hin diqîriyan, hinan li xwe dixist, hinan jî xwe li vî alî û wî alî li erdê dixist.

Mêrikekî ciwan digot:

- Min xelas bikin, an na, ez ê hinan bi ser xwe de bikujim.

Û pê re porê xwe hildikir û serê xwe li dîwaran dixist.

- Jina min, doktor, jina min... Belê. Tu nabêjî, min di paxila xwe de dijminê xwe xwedî kiriye.

Jina wî? Ruyê doktor pê re zer bû. Gelo?.. Dinya ye... Jina wî bi xwe jî çend caran gazind kiribûn û gotibû:

- Tu bi min re elaqadar nabî!

Ji devê nexweşê ku xwe radihişt û li erdê dixist peyvwergirtin, pir zehmet bû. Xwediyê deynan rebenko dabû îcrayê. Wan dê sibehê, alavên wî heciz bikirana.

Gava doktor li wan guhdarî kir, porê wî gij bû. Eynî felaket dikarîbû bihata serê wî jî.

Yê nexweş got:

- Bifikire doktor, xelkê xerîb, polîs, memûrên îcrayê dê têkevin mala min, odeya min a razanê... Ew ê alavên min...

Doktor ji bo vekirina vê muayenexaneyê ji çend deveran bi sened deyn kiribû. Tevî ku faîza wan dida jî xwediyên deynan zor dida wî. Ji hêrsan, heta serê bêvila doktor sor bû.

- Çi derdê te heye?

- Ma xuya nabe? Ma tu fahm nakî, doktor beg?.. Li min binihêre, bê ez di çi halî de me? Qahwe tune ye, çay tune ye, ma mirov dibe çi? Niha mîxê nalan jî tune ye, mîxê nalan!.. Bifikire doktor beg, ez rica dikim, bifikire, ger li welatekî mîxê nalan jî tunebe, pêşeroja wî welatî dê çawa be?

Doktor jî dermanên ku lê digeriya peyda nedikirin. Tew aletên tibî qet tune bûn.

Nexweşê biesab diqîriya:

- Ger mîxê nalan tune be, dê çi bibe? Welat dê têk biçe. Em

ê av û av herin. Çareserkirina pirsa mîxê nalan...

Ruyê doktor ji nişka ve hat guhertin. Awirên wî bûn ecêb, devê wî xwar bû. Porê xwe hilkir, xwe li erdê xist û dest bi qêrîn û wahjînê kir:

- Mîxê nalan!.. Mîxê nalan!.. Mîxê nalan!.. Em mîxê nalan ê baş dixwazin!.. Em mîxê nalan ê saxlem dixwazin!.. Em gelek mîxên nalan dixwazin!..

Doktorê esaban bi qêrîn û wahjîn ket kolanan.

- Mîxê nalan!.. Mîxê nalan!.. Mîxê nalan!..

# Dizan ji dizan dizî, erd û ezmanan lê pirsî

Wî serî li hemû buroyên kar û karker peydakirinê, dabû. Di kîjan rojnameyê de, kengî îlaneke ku digot; li memûr û karkeran tê gerandin, didît, di cîh de bazdida.

- Navnîşana xwe bide me, em ê xeberê bidin te.

Ger li teqwîma maseyê navnîşan carekê hat nivîsîn, mahneya wê ew bû ku êdî hêvî tune ye.

Her êvar, gava dihat malê, pirsa ku jina wî pêşî jê dikir, ev bû; "Ma te kar peyda kir?".

Di vî zemanî de, peydakirina pereyên ku ji xelkê ketine erdê, ji peydakirina kar hêsantir e.

Jina wî bi vê gotina xwe ya pêşî dest pê dikir û gome bi ser wî de gêr dikirin:

- Min di jiyana xwe de, zilamekî wek te tiral, bêkêr û jihevdeketî nedîtiye!

- Hevalekî soz da, got ku sibehê were, em ê miheqeq bikin.

- Ew ê çi bike?

- Kar, keçê!...

Jina wî ew bi zorê kiribû derewîn.

- Karekî çawa?

- Karekî pir baş, pir xweş, karekî mikemel!

- Me fahm kir, karê çi ye?

- Çîk... Karê lingan, lê rûniştî.

- Ma karê lingan rûniştî dibe?

- Dibe, le... Ez ê bi makîneya lingan dirûnê bikim.

- Ew ê çi qasî bidin te?

- Sê sed...

Pirs û derew bi saetan dom dikir.

Êvara piştî wê, pîreka wî dîsa dipirsî:

- Te dest bi kar kir?

- Ez çûm... Şens... Jina wî miribû, heval nehat. Dibêjin; ew ê roja çarşemê were.

Dawiya çarşem û pêncşeman, derew û merewan qet nedihat. Di dawiyê de, jinikê êvarekê ultîmatoma xwe ya bidevkî da:

- Ya ya zexel, tu tu hu!... Tu tam fêrî tiraliyê bûyî. Ji sibehê û pê ve, ger te kar peyda nekir, lingê te di vî deriyî re derbasî hindur nabe.

Wî wê rojê jî navnîşana xwe da çar-pênc deveran. Gava êvarî vegeriya malê, derî lê venebû.

Piştî ku wî got:

- Keçê, mizgîniya min li te!... Min kar peyda kir, ez ketim kar, ez dixebitim.

Derî vebû. Ji jina xwe re bi kêf, behsa karê xwe yê nuh kir, hingî weha li ser zêde dikir û xweş digot, wî bi xwe jî bi rastî bawer dikir ku ew di devereke weha de dixebite.

Jina wî got:

- Gidî, zû rakeve, tu sibehê dereng neçe karê xwe!

Serê sibehê jî mêrê xwe bi rê kir. Mêrik li kolan û parkan geriya. Serî li her devera ku wî hêviya kar jê dikir, da. Gava êvarî vegeriya malê, wek her mêrê ku dixebite, bi ser jina xwe de rabû, kir bire bir.

Vê jiyana bihêvî bîst û pênc rojan dom kir. Her ku roja meaştendinê nêzîk dibû, taswasa mêrikê reben zêdetir dibû û nema dizanîbû bê wî dê çi bikira. Gotibû ku ez ê sê sed lîreyî bistînim. Jina wî her şev hesab dikir, bê ew pere dê çawa bê xerckirin.

Ji jina xwe re got:

- Tu rahêle zarokan û biçe mala diya xwe. Di yekê mehê de,

gava min meaş stend, were!

Jinikê negot kirt û rahişt zarokan û çû. Mêrik biryara xwe dabû, wî dê dizî bikira. Bi şev, apartmana ku ew ê têketayê jî di çav xwe re rakir. Şeva wê mehê ya dawiyê ye... Bi şev, dest pê kir û li pêşiya apartmana ku ew ê têketayê çû û hat. Elektrîka qatê duyem ê ku ew ê têketayê vemirî. Piştî bîstikekê, ên ku li wî qatî rûdiniştin, xuya bûn. Malbat hemû di wê saetê de, ya diçû sînemayê, ya jî mêvantiya cîranekî. Şensa wî alî wî kir! Ew dikarîbû, bê tirs têketa malê. Li paş apartmanê zîvirî, tu kes tune bû. Xwe di ser dîwarê bexçe yê nizm re avêt. Xwe bi derabeyên pencereyê ve girt û bi boriya avê re hilkişiya. Bi hêsanî hilkişiyabû balkonê. Çi şens!... Deriyê balkonê jî vekirîbû. Gava ket hindur, bi carekê re cesaret hatê. Bişkoka elektrîkê zîvirand. Wî qet texmîn nekiribû ku dizî dê ew qasî hêsan bûya. Hema weha li dora xwe niherî. Li vê derê jî tiştekî bi tenê tune bû ku nehata dizîn. Di bufeyê de, di hindurê zerfên zêrînî de, fîncanên biqîmet hebûn. Destê xwe dirêjî çakêtê di portmantoyê de daliqandî bû, kir. Gava cuzdanê zepitî vekir, çavên wî qulipîn, desteyên sed sed û pêncî pêncî... Çaviya dolaba li odeya razanê kişand. Lîreyên wek ku ji Darpxaneyê aniha derketibin, nuh î top, pakêt bi pakêt... Serê xwe bi ku de dizîvirîne, pere. Ji nav pereyên cuzdên, bi tenê rahişt sê sed lîreyî.

Li ser maseyê rûnişt. Li kaxizê weha nivîsî:

" Begê birêz,

Ez ji bo diziyê ketim mala we. Min rahişt sê sed lîreyên ku pêwîstiya min pê hebûn. Bawer bike ku gava pereyên min çêbibin, ez ê wan li te vegerînim. Bi rêzdarî."

Kaxiz danî ser maseyê. Di rêya ku tê re hatibû, bi hêsanî ji malê derket. Ew ê meheke din jî ji zimanê jina xwe xelas bibûya. Ev çend meh in ku ew ê cara yekem rehet raza. Hat

ber malê, di pencereyê re ronahî xuya dikir. Ne xwe, jina wî hatibû. Wî dê sê sed lîre biavêtana ber wê, piçekî vir de û wê de bikira bire bir û mêrantiya xwe nîşanî wê bida.

Kilît ji bêrîka xwe derxist û derî vekir. Du namluyên devançeyan ji nişka ve ketin sîngê:

- Destên xwe bilind bike!

Ji wan zilamên bidevançe, yekî got:

- Kuro, tu çi zilamekî ji xwe fedî nakî! Ma însan bi mebesta ku gava rojekê diz têkevin malê, fedîkar dernekeve, çend alav malavan li malê danîne? Ev du saet in ku em lê digerin, me tiştekî ku mirov bikaribe bi xwe re bibe, peyda nekir.

Dû re, li wî geriyan, sê heb sedên nuh î top birin û çûn.

Mêrik heta ku roj derket, li derewên ku ew ê li jina xwe bike, fikirî. Serê sibehê, li derî ket. Bi îhtimaleke mezin, dê jina wî bûya. Dirikrikî û derî vekir. Dît ku du polîs û ew dizên ku bi şev sê sed lîre jê stendibûn, dest kelepçekirî li hember wî ne. Ji kêfa çavên wî şewq da. Ne xwe, diz hatibûn girtin.

Ji polîsan yekî, sê heb sed lîreyên nuh î top nîşanî wî dan û pirsî:

- Ma ev pere yên te ne?

Agir bi hindurê wî ket. Wî jî agir bi hindurê hinekî din xistibû û ev pere dizîbûn. Qet nebe, ji bo ku van herdu rebenan xelas bike, dikira bigota "Na, ne ên min in", lê polîsekî berî wî got:

- Ev herdu mirovên bisabiqe li xwe mikur hatin ku ew do bi şev ketine xaniyê te û ev sê sed lîre bi zorê ji te stendine.

Ne xwe, ev sê sed lîre bûbûn qismetê wî.

Şensa jina wî hebû.

Got:

- Belê, ên min in.

Îcar, yê polîs pirsî:

- Te ev ji ku anîne?
Reng li mêrik qulipî. Gelo diziya wî jî hatibû fahm kirin?
Got:
- Tu ji bo çi dipirsî?
Yê polîs got:
- Ji ber ku ev pere qelp in.
Mêrik di cîhê xwe de hejhijî.
Yê polîs got:
- Bi me re were qereqolê!

# Kilît

Birahîm got:

- Heydê em têkevin hindurê barê.

Min got:

- Em ê têkevin hindur, lê Birahîm, ew ê dû re derpiyên me jî ji me bikin û me di derî re biavêjin derve.

- Tu zarok î, yaho!... Ma qey gurên wek me jî dikevin feqê!...

Dibêjin, li yê kawik eyan dibe. Îşev dilê min lê dixe.

Em di nêrdewanê re du qatan daketin binê erdê û ketin jêrzemîneke ku li ber deriyê wê ronahiyên neonê yên rengîn vêdiketin. Em li ser maseyekê rûniştin. Wê gavê, cazê dest pê kir. Zilamên li ser maseyan mîna bînerên fûtbolê yên ku ji bo li hakiman bixin dadikevin sehayê, xwe çeng kir ser pîrekan.

Garson hat.

- Du votka...

Ji maseya kêlekê, pîrekek ku çixare di dev de, got:

- Bibuhure, agirê te heye?

Ez pê dizanim, ger ez êgir bidimê, bi dû de, dê tiştekî din bê û em ê ji sedî sed derbekê bixwin. Min berê xwe guhert, Birahîm heste vêxist.

- Ez spas dikim, ezbenî.

- Estexfurulah.

Min qurincokek da Birahîm.

- Dirêj meke!...

Vî Birahîmî jî li baran gelek pere xwarine, ne xeşîm e. Tew ez, bila wek pesindayinê neyê hesibandin, ev bîst sal in ku hîn ji dema keçikên macarî û vir de, min deftera pîrekên baran girtiye.

Birahîm got:

- Ma em ên ku fen li me bibin, kuro?

- A fenan, fen li me dibin, lê'niha ne wexta wê ye...

Pîreka li maseya kêlekê, kesereke kûr kişand.

- Bitenêbûn çi qas zor e, ma ne weha, ezbenî?

Min serê xwe bilind kir û berê xwe da binzikê xênî.

Ma Birahîm jî nebêje:

- Bitenêbûn mexsûsî Xwedê ye, xanima delal!

Min ji bîr kir ku ez behs bikim. Ev bar ne ji wan barên erzan ên ku mirov bi du kaxet û nîvan kokteylekê lê vexwe û heta sisiyê sibehê keçikekê bigire û yekê berde û kêfê bike. Her konsomatrîsa ku di şevê de sed lîreyî neîne, şerefa meslekê xwe dadixe, xwe nerehet his dike. Em vê jî dizanin, le.

Pîreka li maseya kêlekê ji Birahîm re got:

- Ez ê di guhê te de tiştekî bibêjim.

Gava Birahîm serê xwe bi ser wê de xwar kir, min di dilê xwe de got:

- Temam. Birahîm ji dest çû. Lê qet nebe, ez di ber xwe de bidim.

Birahîm jinik xist milê xwe û herdu derbasî "bar Amerîkan"ê bûn. Ez li ser maseyê, bi tena serê xwe mam. Ji bo ku çavên min û ên jinan li hevdu nekevin, serê min li jorê û çavên min ziq li binzikê xênî dinihêrî.

- Ez dibêjim ku min tu li derekê dîtiyî.

Min çavên xwe ji binzikê xênî dagerandin. Du çavên "melûl û xemgîn", lêvin ji qewla Fecrîatperestan, dawetkar î şil î nîvvekirî ku çirûskên diranên sedefî tê re xuya dibin...

Min got:

- Ez bawer nakim.

- Ma destûr heye ku ez bêm ser maseya te?

- Ger tu cîhên din tune bin, kerem bike...

Jinik li ser kursiya kêleka min a vala rûnişt. Ma qey eyb e, her mirovek xwedî tebhekî ye; jinên ku dengên wan dişibin dengên zilaman; ên zerhimî, awir bisir ku digirîn an dikenin mirov tê dernaxe, min perîşan dikin.

- Navê min Alîs...

- Ez spas dikim, navên min Hesen...

- Ez pir kêfxweş bûm.

Tam di wê navê de garson hat. Wê berî min, ji garson re got:

- Em tiştekî naxwazin!

Hela hela... Ev cara yekem e ku ez li jineke barê ya ew qasî çavtêr rast têm.

Îcar min got:

- Te tiştek vexwara.

Wê got:

- Ez spas dikim. Ez qet fêrî vî muhîtî nebûm. Orta min û vexwarinê zêde tune ye.

- Waaa!...

- Ez dixwazim bi yekî re bipeyivim ku bikaribe derdê min fahm bike. Ji derveyî vê, kêfa min ji tu tiştî re nayê.

Dû re dest bi çîroka xwe kir. Xwedêgiravî, bavê wê ermenî, diya wê rûm û ew bi xwe jî tirk bû. Ew piştî serpêhatiyeke xemgîn ketibû nav vê jiyanê. Yarekî wê hebû, tam dirûvê min dida. Ne bi tenê rû, bejin û bala wî, herweha dengê wî jî û tevgerên wî jî eyn wek ên min bûn... Mêrik ew terk kiribû û çûbû. Ji ber vê yekê, ew hatibû ba min.

Wê got:

- Ez ne wek wan pîrekên din ên baran im. Ez ji vê jiyana xwe nefretê dikim.

Her ku wê digot, tu nedima ku ez bigirîm. Ma li ser ruyê dinyayê, jinên weha jî hene? Kuro, ez di temamê emirê xwe de,

li jineke weha digeriyam.

Îcar min israr kir:

- Ez tika dikim, em tiştekî vexwin...

- Ger tu bihêlî ku ez heqê wê bidim, em vexwin.

Waweylê!... Qey dilê jinikê ket min... Ê, ma qey dilekî jinikê jî heye, ruhê min. Ez fikirîm, tu ruyê ku evîndar bibe jî li min ne xuya ye...

Min Alîs hema hema bi zorê bir 'bar Amerîkan'ê. Min dît ku tew Birahîmê me û zeriya bîstika berê xwe li hevdu pêçaye, eyn wek axtapotan, bi hevdu zeliqîne, mirov dibêje qey herdu bûne yek...

- Hûn ê çi vexwin?

- Kokteyl...

Alîs dibêje:

- Ma ev çavên te? Çavên herî xweşik ên ku min di jiyana xwe de dîtine.

Ev Alîs jineke weha ye ku ji zewqê fêhm dike, ruhê min. Di zemanekî de, jinek hebû ku ez bi ser de dîn dibûm.

Wê hertim ji min re digot:

- Ez nikarim tehamulî lênerîna çavên te bikim.

- Ji kerema xwe re were vira, barmenê birêz. Kokteyleke din bide me...

- Ez heyranê çavên te me.

Ev Alîs pîrekeke pir nazik e!...

- Cînfîsê ji me re bîne!...

- Ger ev çavên te yên xweşik ji min pê ve, li tu jineke din binihêrin, bi navê Xwedê ez ê wan derxînim!...

- Alîsa min, ger çavên min ji te pê ve, li hinin din binihêrin, bila kor bibin... Garson, ji me re herkê vîskiyekê!

Min li Birahîm nihêrî, çavên wî çûbûn. Xuya ye, jinik tam

derban lê dixe.

Alîs dibêje:

- Xwezî, ez bikaribim heta mirinê çavên xwe ji çavên te veneqetînim!

- Veneqetîne, delala min.

- Xwedê veneqetîne...

Bûk jî ji çavên min qet kêm nabin û piçekî sor in jî. Lê, gava ez li mirêkê dinihêrim, ez bi xwe wan diecibînim.

- Garson!... Tu ê çi vexwî, Alîsa min? Bol... Belê, bolekê bîne.

Di wê navê de, Alîsê ji çenteyê xwe kilîtek derxist û got:

- Ruhê min, tu vê kilîtê bigire... Ev kilîta apartmana min e. Îşev saet di çaran de were. Tarlabaşi, kolana Salkimsaçakê, nûmaraya 14an, apartmana Şerefê. Qatê duyem. Ez ji ber van pîrekên vira, dilxerabiyan ji te dikim.

Çi jineke xwediya hisên bilind e!

- Garson!... Hesab!...

Hesab danî ber min, 285 lîre... Min xwe bi ser hevdu de guvaşt. Min li Birahîm nihêrî, li ortê nexuya bû.

- Alîsa min, sed û heftê lîreyên min hene. Hesab 285 lîre ye...

Rûyê Alîsa reben bi carekê hat guhertin.

Got:

- Me ji bo çi ew qasî zêde vexwar? Ev zilam bê însaf in. Heta ku mirov pereyan nede wan, mirov bernadin. Bi Xwedê, li ba min jî panzdeh lîre hene.

Wê gavê hat bîra min.

- Gidî Alîs, ez rezîl bûm. Bi Xwedê, min ev saeta xwe ya destan bi sê sed û bîstan kiriye, hîjdehkevirî ye.

- Li vê derê, sed lîreyî jî tê nadin.

- Pênûsa min a hubrê heye, zêr e. Min ew bi sed lîreyî kiriye.

Got:

- Îmkana wê tune ye.

Min qemçikên zendikan ên zêr jî derxistin. Alîs rahişt hemuyan û ew birin ba patron.

Piştî çarîkekê vegeriya.

Got:

- Deynê te pêncî lîre ma, ez ê bidim.

- Ez spas dikim, tu çi dilpak î... Ez ê sibehê ji te re bînim...

- Ez îşev li benda te me, bivê nevê, divê tu bê... Ax, ew çavên te!...

Ez ji barê derketim. Heta saet çaran li kolanan vir de û wê de geriyam. Saet bû çar... Kilît di destê min de û ez li kolana Salkimsaçakê digerim. Min ji bekçiyan pirsî, nizanin. Bû sibeh.

Ez çûm malê û razam. Ez êvarî şiyar bûm. Divê ez Alîsa xwe ileh peyda bikim. Ez li hemû kolanên Tarlabaşiyê yek bi yek geriyam. Heta nîvê şevê, ez di kolanan de, vir de û wê de çûm û hatim. Ez di wê navê de, li Macîdê me rast hatim.

- Wey Macîdê min, tu li van deveran çi digerî?

Got:

- Keko, ez îşev çûm barekê. Ez li pîrekekê rast hatim. Bi Xwedê, ger tu wê bibînî, tu ê qet nebêjî ku pîreka baran e... Kilîta mala xwe da min. Ew ê saet di çaran de were malê.

- Navnîşana wê?

- Kolana Salkimsaçakê, nûmaraya 14an, apartmana Şerefê.

- Navê wê?

- Alîs.

- Te li barê pir pere xerc kirin?

- Ne ji wan pîrekên baran e, ew ên ku tu nas dikî.... Bi Xwedê, min bi zorê pê da vexwarin. Min çar sed lîre dan, lê xweş helal bin...

Yekî ku di kêleka me re derbas dibû, xwe nêzîkî me kir û got:
- Bibuhurin, kolana Salkimsaçakê li kî derê ye?
- Ma tu li kîjan devera wê kolanê digerî?
- Nûmaraya 14an, apartmana Şerefê!...
Min ji bêrîka xwe kilît derxist û got:
- Kilîta apartmanê li ba min e!...
Ger hûn bixwazin, piştî nîvê şevê, di kolanên Tarlabaşiyê de piçekî bigerin. Hûn ê bi kêmanî li panzdeh-bîst kesên ku kilît di destên wan de û li kolana Salkimsçakê û apartmana Şerefê digerin, rast bên.

# Divê serokê belediyeyê çawa be

Li qezayê hilbijartinên belediyeyê hebûn. Du namzedên xurt ên herdu partiyên li hember hevdu, namzedên din li dû xwe hiştibûn. Propagandayên li qahwexane, dikan û malan qediya bûn û niha dora axavtina li meydanê hatibû. Ji dijberan Beşîr Efendî li eskeriyeyê tezkere avêtibû û bûbû Başefendî. Dû re, li vê qezayê, ji sîh salî bêtir wekîltiya daweyan kiribû. Li hember Beşîr Efendî, Kazim Efendiyê beqal hebû. Kazim Efendî gelek salan mixtarî kiribû, di warê xwendinê de cilika xwe ji avê derdixist, lê nizanîbû binivîsanda. Hesabê dikana xwe, bi hin îşaretên ku wî bi xwe ew îcad kiribûn, dikir.

Kursiya mamoste ji dibistana destpêkî ya qezayê hatibû anîn, qedeh û surehî jî li ser, li hember seraya hukûmetê hatibû danîn.

Ji ber ku navbera partiyan pir baş bû, herdu raqîbên dijminên hevdu yên mezin; wekîlê daweyan Beşîr Efendî û Kazim Efendiyê mixtarê kevin û beqal ketibûn milên hevdu û hatibûn ba kursiyê. Rûniştevanên qezayê û gundiyan meydan dagirtibû. Wekîlê daweyan Beşîr Efendî ji ber ku di qezayê de, yê herî zana bû, ji xwe ewle bû ku çawa bibûya ew ê berê derketa ser kursiyê, ji ber vê yekê got:

- Fermo Kazim Efendî, berê tu bipeyive!..

Kazim Efendî got:

- Estexfurulah, çi hedê min e, hela tu berê kerem bike.

Beşîr Efendiyê ku sê dewreyan seroktiya belediyeyê kiribû, xwe vir de û wê de bir û anî, lê di dawiyê de derket ser kursiyê. Bi wê şêweya wekîlê daweyan a ku ew qas sal in, wî di dadgeha qezayê de bi kar dianî, dest bi peyvê kir:

- Hevwelatîno!... We seroktiya belediyeyê, sê dewreyan da min. Ji bo ku ez bikaribim layiqî vê wezîfeyê bibim, min jî dîsa bi alîkariya we, hewil da. Em niha diçin hilbijartinan. Ez nabêjim ku ileh min hilbijêrin. Ji xwe, karên min pir in û ez westiyame jî... Lêê, min bi israra hembajariyên xwe, xwe kir namzed. Hûn dixwazin min hilbijêrin, an jî yekî din... (bi kiraxa çavên xwe li Kazim Efendî nihêrî.) Niha, ez ê hewil bidim û bi qasî ku aqilê min bigihêje û zimanê min bigere, ji we re bibêjim, bê serokê belediyeyê divê çawa be. Serokê belediyeyê divê yekî weha be ku bi tecrube, têgîhiştî û dinya dîtibe... (Ji derveyî Beşîr Efendî û Kazim efendî hemû namzedên din ciwan bûn.) Seroktiya belediyeyê karekî weha ye ku mirov diwestîne. Ji ber vê yekê, ev kar ne karê yekî pir kal, porweşiyayî, dirantaxim û xwedî zarok û neviyan e. (Raqîbê wî Kazim Efendî ji Beşîr Efendî çardeh salan mezintir, porê wî weşiyayî û diranên wî taxim bûn.) Divê emirê wî bi ser pênciyî neketibe. (Ew tam pêncîsalî bû.) Ger Hûn yekî ku ji qanûn û nîzamê fêhm neke hilbijêrin, ew ê nikaribe karê we bimeşîne. (Di qezayê de, tu kesê ku bi qasî wî ji qanûnan fahm dikir, tune bû.) Ez nabêjim ku min hilbijêrin. Gidî, bala xwe bidinê û yekî ku bi zorê dixwîne, lê nikaribe binivîsîne, hilnebijêrin! Serokê belediyeyê dikeve her deverê û derdikeve. Ger hûn yekî ku şalê wî neûtîkirî û krawatê naxe situyê xwe hilbijêrin, şerefa qezaya me dê dakeve. (Li qezayê ji derveyî wî, tu kesê ku şalê wî ûtîkirî û krawat di situyê wî de tune bû.) Ger hûn yekî ku şewqê wî weha wek ê min (ji serê xwe derxist û nîşanî wan da) ne şewqê tar be, hilbijêrin, em ê rezîl bibin. (Li qezayê ji wî pê ve, tu kesî şewqê tar nedida serê xwe.) Ez nabêjim ku min hilbijêrin. Lê, zilamê ku hûn ê wî bikin serokê belediyeyê, divê yekî wek ku min ji we re behs kir, be.

Beşîr Efendî ji kursiyê daket. Gundiyên ku meydan dagirtibû, dest bi peyvê kir:

- Rast dibêje!..

- Heqê mêrik, ji vira û heta ba Xwedê heye!..

Kazim Efendî derket ser kursiyê.

- Axano, ez nikarim du gotinan xweşkî bînim ba hevdu. Beşîr Efendî ji we re hertişt got. (Beşîr Efendiyê raqîbê xwe nîşan dide) Divê diranên qîl ên serokê belediyeyê yê ku hun ê hilbijêrin, zêr bin. (Diranên Beşîr Efendî yên qîl zêrkirî bûn.) (Dîsa bi destê xwe Beşîr Efendî nîşan da) Divê çavên serokê belediyeyê şîn bin.

Pirqînî bi gundiyan ket. Bi tiliya xwe Beşîr Efendî nîşan da û dewam kir:

- Divê li gepa wî ya çepê şahnikek hebe. (Beşîr Efendî ji hêrsa sor î kur bû.) Divê serokê belediyeyê, tam a wek viya be, gopalê wî di destê wî de û berçavika wî daketibe ser bêvila wî. (Gundî dikira ji ken bifetisiyana.) Divê navê serokê belediyeyê jî Beşîr be.

Kazim Efendî ji ser kursiyê daket. Gundiyan bi zikên xwe digirt û dikeniyan, Beşîr Efendî jî ji hêrsa, bi diranên xwe simbêlên xwe dikurisandin.

Propagandayê dê roja din jî dewam bikira. Gundî bûbûn du grûp. Piraniya wan li aliyê Beşîr Efendî bûn. Beşîr Efendî êdî dev ji nezaketa siyasî berdabû, hemû tiştên dijberên xwe yên veşartî derxistibûn ortê. Niha, bê Kazim Efendiyê beqal çi mal bû, xelk li ser dipeyivî. Roja piştî wê, qelebalixa ku meydan dagirtibû, bûbû du qat. Beşîr Efendî bi hêrsa roja berê, bêhn vedida û derket ser kursiyê.

- Hevwelatîno! Êdî, ez mecbûr bûm ku tiştên di bin zimanê xwe de derxînim. Tu kes heye ku nizanibe, bê vî mêrikî di dema mixtariya xwe de, çi dikir? Ger miroveki mezin ji derve

were qezayê, dê biçe ku? Ma ne ew ê raste rast biçe mala mixtar Kazim Efendî? Ji bo çi?... Hûn hemû bi sedema vê dizanin... Gava par, sê kes bi erebeyeke taybetî hatin mala wî, ma yê ku Emîneya kewijî du şev û du rojan li nav rez reqisand, ne ew bû?

Gundiyan got:

- Weleh, rast e...

- Rast e, lo...

- Hevwelatîno!... Ma hûn dizanin, bê wî di cejna qurbanê de, ew çermên ku ji bo fitreyan stendin, bi ku de şandin? Ma tu kes heye ku nizanibe, bê li mala vî mêrikê ku dixwaze bibe serokê belediyeyê, çar jinên wî yên bêmahr hene?

Ji nav gundiyan deng bilind bûn:

- Helal be ji mêrik re!...

- Hevwelatîno! Hûn hemû dizanin ku beriya ev mêrik bibe mixtar, ji dikaneke wî ya beqaliyê pê ve, tu tiştekî wî tune bû, lê di nava deh salan de, bû xwediyê nêviyê qezayê.

Di nav re, dengên weha bilind dibûn:

- Ev mixtar çi jîr e, lo!...

- Hevwelatîno!... Hîn gelek tiştên ku bêne gotin hene. Lê ez dengê xwe dibirim. Niha, êdî hûn dixwazin min hilbijêrin, an jî wî!...

Meydan bi çepikan hejiya. Dora Kazim Efendî bû. Ew di bin simbêlan re dikeniya û hêdî hêdî derket ser kursiyê. Wek ku li qahwexaneyê dipeyivî, rehet rehet peyivî.

- Hemû tiştên ku Beşîr Efendî dibêjin, rast in. Beşîr Efendî sîh salan wekîltiya daweyan kiriye. Ne du donim erdê wî heye û ne jî cotek gayên wî... Mêrikekî pir bi namûs e, deh pereyên wî tune ye. Ger mêvanekî xerîb bê mala wî, cîhê wî yê ku lê rûne û rakeve jî tune ye. Ger em bên ser meseleya min, wek ku

ew dibêje, heta ku ez bûm mixtar, pênc qurişên min tune bûn. Niha du sed û pêncî donim erdê min heye. Elhemdûlilah, pereyên min jî pir in... Şalekî wî yê ûtîkirî heye, şewqeyekî wî yê tar heye, berçavikeke wî heye û qirawata wî heye. Ez bi nivîsandinê nizanim... Êdî, hûn dizanin.

Nutûq qediyabûn. Herkes belav bû. Piştî du rojan, hilbijartin dê çêbibûna. Dostên mixtar Kazim Efendî li dikana wî civiyan.

- Te çi kir, lo Kazim Efendî? Ma peyva weha dibe? Te ev Beşîr kir milyaket... Ma pereyên wî tune ne? Ew dikare te bikire, lo...

Pix pixa Kazim Efendî bû, dikeniya û digot:

- Hela ka em binihêrin, bê di hilbijartinan de çi dibe?...

- Yaho... Em dizanin ku te çermên qurbanê şandin Miesseseya Hewayê. Te ji bo çi negot ku ew derewan dike?

- Hela ka em li hilbijartinan binihêrin, bê çi bibe?

- Yaho, du sed dewarên te li kî derê ne? Sî donim erd û coteke gayên te yên ku ji bavê te mane, hene... Yê ku Emîneya kewijî li nava rez reqisand, esil ew qebrax e...

Kazim Efendî bi van gotinan dikeniya û digot:

- Hela rawestin... Em berê hilbijartinan bibînin!

Hilbijartin çêbûn. Wekîlê daweyan Beşîr, bi qasî ji çara yekê Kazim Efendiyê Mixtar jî deng wernegirtibûn. Gundiyên ku diçûn ser sindoqê, ji hevdu re weha digot:

- Ji me re rê lazim e, av lazim e, heywanên ji bo dolê lazim in, krêdiya bankeyê lazim e... Toxim lazim e. Ev bêkêrê Beşîr ew qas sal bi kêrî xwe nehatiye, çi xêra wî dê bigihêje qezayê... Bêkêrekî dera hanê ye!... Ne dizane pîrekan bireqisîne, ne mahzûbaniya zilamekî mezin bike û ne jî tu kar ji destan tê. Dengên xwe bidin Kazim Efendî...

Piştî wê hilbijartinê, heçî kesên ku ji bo seroktiya belediyeyê bûn namzed, axavtinên xwe yên propagandayê weha kirin:

- Hevwelatîno!... Pêncsed dewar, çar cot ga û çar jî jinên min hene. Pêncsed donim erdê min heye. Ez ji hefteyê carekê pîrekan direqisînim. Min ev hemû bi saya jîrbûna xwe û di şeş mehan de bi dest xistin...

# Çete

Li iskeleya Kadikoyê jineke ciwan kir qêrîn:

- Haho!... Çentê min, çentê min!...Bigirin, direve!...

Qelebalix li bin guhê hevdu ket. Serseriyekî pêxwas, her sê pêlikên pireyê dikirin yek û xwe çeng dikir.

Jina ciwan a xweşik li ber ên dora xwe digeriya û digot:

- Ji bo Xwedê, wî bigirin!...

Bi qasî pênc deqîqeyan piştî ku yê diz ji ber çavan wendabû, polîsek destê wî li ser girmilê dizê çente, xuya bû.

- Ev çente ê kê ye?

Çenteyekî mezin î reş î birqokî bû. Jinika ciwan a xweşik di nav qelebalixê re bi kêfeke mezin xwe çeng kir çentê xwe.

- Yê min e... Ax, ez pir spas dikim.

Ji ber ku tu tişt li dizê pêxwas tunebû, polîs ji bo ku ew nereve, hişk bi porê wî yê dirêj girtibû. Di tîş û zîtolên şalê wî yê kevin î malê eskeriyê re, laşê wî yê tazî û hêtên wî yên qirêjî xuya dibûn.

Yê polîs ji jinika ciwan re got:

- Ji kerema xwe re, were qereqolê.

- Ji bo çi?... Çente ê min e. Herkesî dît ku vî zamoteyî ji destê min revand.

- Ji bo ku em yê diz bidin dadgehê, divê em îfadeya te bistînin...

Yê diz û polîs li pêşiyê û jinik jî li dû wan, ketin hindurê qereqolê... Piştî ku qomisêr li jinikê guhdarî kir, bi awayekî binefret li dizê ku bêhna beratan jê dihat, nihêrî.

- Kuro, ma tu fedî nakî? Tu bi qasî kerekî yî... Bixebite!...

Serê yê diz di ber de, guhdarî dikir.

- Tu ji bo çi diziyê dikî?...Hi?...

Yê diz serê xwe hêdî hêdî bilind kir û got:

- Ma ew bi xwe çi dikin?

- Hiş!... Ez ê niha...

Qomisêr ji jinika ciwan pirsî:

- Xanimefendî, çi di çenteyê de heye?

- Pereyên min tê de ne... Rûja min, mirêka min, bodra min...

- Çi qas pereyên te di çente de hebûn?

Jinikê dengê xwe nedikir. Gava qomisêr destê xwe dirêjî çenteyê li ser maseyê kir, jinikê ji nişka ve got:

- Ez tika dikim, di çente de, alavên min ên mahrem hene...

Qomisêr çente vekir û tiştên tê de derxistin. Ji derveyî tiştên ku jinikê gotibûn, di çenteyî de hin pereyên hûr û du sed dolar hebûn.

Qomisêr pirsî:

- Te ev dolar ji ku anîne?...

- Tu doza min bi kesî re tune ye. Çenteyê min bidin min, ez ê biçim...

- Ez dolaran dipirsim.

- Eman, ez çente jî naxwazim. Bila ji we re be.

- Tu nikarî biçî... Te ev dolar ji ku anîne?

Jinika xweşik serê xwe bera ber xwe da.

- Madam Eleniyê ew vê sibêhê dan min.

Yê diz serê xwe rakir, li qomisêr nihêrî û di bin simbêlan re keniya.

- Ev Madam Elenî li ku ye?...

Jinika ciwan bi pise pisê navnîşana wê got.

Qomisêr, polîs, diz û jinik li erebeyeke polîsan siwar bûn û çûn apartmana Madam Eleniyê. Di odeya yekem a ku ew ketinê de, tiştê ku wan dît; pîrekek û zilamek di ser hevdu de bûn.

Piştî ku qomisêr di şeş odeyên din de jî eynî rewş dît, bang kir:

- Ne xwe, Eleniya patrona jinfiroşiyê a ku ev şeş meh in, em bê rawestan lê digerin, tu yî ha?... Te ev dolar ji kê stendin?

- Mişteriyekî min ew dan min, mişteriyekî min î ku navê wî Riza Beg bû.

Zilamên ku di ser de hatibûn zevtkirin, ji ber ku zilam bûn, serbest hatin berdan. Pîrek jî ji ber ku ne zilam bûn, şandin nexweşxaneya Ahirkapiyê. Dû re polîs, qomisêr, diz, jinika xweşik û Elenî bi erebeya polîsan çûn apartmana Riza Begê. Riza Begê ser apartmana xwe lê dikir.

- Hûn çi dikin?

- Qet...

- Qet? Ev kesên ku dîwaran lê dikin, ev hoste kî ne?... Ne xwe, hûn avahiyên qaçax lê dikin.

Yê diz serê xwe rakir, li qomisêr nihêrî û di bin simbêlan re keniya. Piştî ku ji bo avahiya qaçax zebt hat girtin, qomisêr ji Riza Begê pirsî:

- Te ev dolar ji ku stendin?

Elî Begê ew dan min.

Qomisêr telefonî qereqolê kir û qemyoneke sergirtî xwest. Ên berê û Riza Beg ketin qemyonê û çûn mala Elî Begê.

Qomisêr ji Elî Begê pirsî:

- Ma te ev dolar dane Riza Begê?

- Belê...

- Te ji bo çi danê?

- Hesinê avahiyan firot min...

Qomisêr berê xwe bi Riza Begê vekir:

- Hesinê avahiyan? Li ku?... Ma beyannameya we heye? Tune ye, ha?... Ne xwe, hûn ticareta hesinan a reş dikin...

Dû re, vegeriya ser Elî Begê:

- Te ev dolar ji ku anîn?...

- Min ew, şeva berê li mala Hisên qezenc kirin.

Yê diz serê xwe yê ku hertim di ber de bû rakir, li qomisêr nihêrî û di bin simbêlan re keniya. Polîs, qomisêr, diz, Elenî, jinika xweşik, Riza Beg û Elî Beg li qemyonê siwar bûn û çûn mala Hisên. Li ser maseya ku bi çoxê kesk hatibû nixumandin, 10 hezar lîre, zar û kaxizên leyistikê hebûn. Qomisêr piştî ku herşeş qumarbazên hatin girtin, şandin ba dadgir, ji Hisên pirsî:

- Te ev dolar ji ku stendin?

- Keştiya "Çemîşgezek"ê ji sefera Amerîkayê vegeriyabû, Nûriyê makînîstê wê, ew dan min.

Ên berê û Hisên ketin qemyonê... Çûn mala Nûriyê makînîst. Li mala Nûriyê makînîst deh kîlo eroîna saf hat girtin. Nûrî li xwe mukur hat ku wî ev dolar ji Ihsên stendine. Îhsan li Boxaziçiyê, li koşka li ser girekî di fabrîkeya eroînê de, di ser sûc de hat girtin.

- Te ev dolar ji kê stendin?

- Ji Rezan...

- Ev Rezan kî ye?

- Ji Beyrûdê kincên jinan ên naylon bi qaçaxî tîne.

Yê diz serê xwe hêdî hêdî rakir, li qomisêr nihêrî û di bin simbêlan re keniya. Hemû li qemyonê siwar bûn. Çûn mala Rezan. Rezan got ku wî ev dolar ji Nevînê stendine ku wî kincên qaçax, mayoyên lasteks firotinê. Lê ji ber ku ev xatûna ha, ji Parîs û Romayê tu carî têr nedibû, li cîhê xwe nehat peydakirin.

Yê polîs jî got:

- Ji xwe, di qemyonê de cihê vala nemabû...

Yê diz serê xwe ji erdê rakir, li qomisêr nihêrî û di bin sim-

bêlan re keniya.

Qomisêr bang kir:

- Me fahm kir, kuro! Bes weha bikene... Me fahm kir ku tu li gora wan bi namûs î, ha...

Ji ber ku sûcê yê diz di halê teşebisê de mabû, heyşt mehan di hefsê de ma û derket. Niha, wek hevwelatiyekî dirust dixebite. Û li ku çenteyekî pîrekan bibîne, wek cinê ji hesin ditirse, jê direve.

# Cenewarê Babialiyê

Hey efendîno! Di ferhengan dè gotinek heye ku navê wê şerm e, ma qey çavê we qet lê neketiye? Dibêjin ku însaf nêviyê dîn e... Me dev ji nêvî berda, ger çaryekê dîn be jî weha nayê nivîsandin. Ma min kiş kiriye mirîşka kê ji we ku hûn ew qasî li min hatine xezebê?

Ji ber pirtûka min a navê wê "Azîzname", li min dihat gerandin. Di dawiyê de ez hatim girtin. Ez ji ber mahkemeya ku serokdewletên Ingiltere, Misir û Îranê li min vekiribû, şeş mehan di hefsê de razam û derketim.

Ka em roja polîsan ez girtibûm, rojnameyên ku ev nûçe weşandibû, bixwînin.

Yekê weha nivîsiye:

"Polîsên sivîl do bi şev girtibû ser her deverê û Azîz li qahwexaneyekê, di rewşeke weha de zevt kiribû ku por û rîha wî tev li hevdu bûbûn. Her çi qasî Azîz Nesîn li hemberî polîsan rabûye jî rê nehatiye dayin ku tu bela jê çêbibe!"

Yeka din weha dinivîse:

"Azîz Nesîn di îfadeya xwe de gotiye ku ew bi şevan li parkan, li çolê û li qahwexaneyên ku heta sibehê vekirî bûn, dima."

Em yeka din bixwînin:

"Hatiye gotin; îhtimala ku Azîz nesîn reviyaye derveyî welêt jî heye... Asoxî, gava Azîz Nesîn li Kadikoyê dikeve hindurê meyxaneyekê tê girtin."

Hela em vêya jî bixwînin:

" Sûcdarê ku li Kasimpaşa, Beyoglu, derûdora Taksîmê û taxên bajêr ên din xwe li ba kesên meylçep vedişart û hertim

cîhê xwe diguhert, tevî ku polîs li her deverê lê digeriya jî nedihat zevtê. Polîsan cîhê Azîz Nesînê ku ev çar meh in firar kiriye, keşif kir û gava yê firar li meyxaneyeke li dora perava Kadikoyê bi sê kesên din re vedixwar, di halekî weha pir serxweş de ku nikarîbû li ser piyan rawesta, hatiye girtin."

Wey Xwedê bela we bide we... Tu nabêjî, ez çi me? Gava min rojname xwendin, ez ji xwe tirsiyam. Wek Cenewarê Ankarayê, Cenewarê Adapazarê, Cenewarê Nigdeyê, niha jî Cenewarê Babialiyê... Berî niha bi demekê jî hin rojnameyan nivîsîbû ku "ji ber ku min heqaretî tirkîtiyê kiriye", li min tê gerandin. Hûn helbet tê digihêjin, bê ev ji bo çi weha tên nivîsîn. Ka ez jî rastiya meseleyê bibêjim:

Ez direviyam. Min li dadgehê got, bê ez ji bo çi û ji ber kê direviyam. Min li Kadikoyê odeyeke xaniyekî kirê kir. Bêyî ku ez tu kesî bibînim û bi tu kesî re bipeyivim, min dixwend û ez dixebitîm. Heşayî haziran, min bi fikira ku bê şeytan çawa naçe mizgeftê, polîs jî naçe kitêbxaneyê, hemû rojên xwe li kitêbxaneyên Stenbûlê bi xwendinê derbas dikirin.

Ji ber ku ez bi tenê bûm, bi tu kesî re nedipeyivîm û bê rawestan dixebitîm esabên min xerab bûbûn, ez dikira bifetisayama. Ez di kolanan de digeriyam û weha difikirîm: Ma qey di maleke xweş de rûniştin, xebata bihuzur û bê tirs nivîsîn dê qet tu carî nebûya qismetê min? Ma qey ez ê wek ku dilê min dixwaze nejîm û kêfê nekim?

A, ez bi van fikiran hatibûm Muhurdarê. Derya bi xuşîneke hêdî û nerm xwe li kendalên çik dide, bayekî tîngerm porê min miz dide, tava heyva li çardehan, di deryayê de dibiriqîne... Bajarê Stenbûlê, li hember çirûsk bi çirûsk... Min bala xwe dayê, gazîno li ber min, di radyodê muzîkeke nerm...

Min ji xwe re got:

- Ma ne te dixwest ku tu li gora dilê xwe kêf bike, a tam firset e!

Li gora ku min ji berê de bihîstiye, Ahmet Rasîm, Mahmut Yesarî jî dihatin vê gazînoyê. Min li bêrîka xwe nihêrî, panzdeh lîre hebûn. Ez tavilê ketim hindurê wê.

- Bîrayek, penêrê hilandî û petêx...

Êdî, kêf kêfa min e! Ev demeke dirêj e ku cara yekem ez tiştekî weha dikim. Heyv, derya, muzîk, bîra... Ox!...

Bi tenê tiştek kêm maye, yara min jî li ba min bûya... Ez di nav xeyalan re çûbûm. Min milê xwe dirêjî piştekа kursiya kêleka xwe kir, min milê xwe lê pêça û min weha hesiband ku yareke min li kêleka min e. Guhên min li muzîkê, çavên min li perava hember, li şewqa rengîn a Stenbûla li ber çavan raxistî û milê min li ser girmilê yara min...

- Garson, bîrayeke din!

Min ji xwe re digot "Îro tu tam tolaz î, lawê min, ev hertim nabe qismet". Tam di wê gavê de, di bin wî milê min î ku li kursiyê rapêçayî de, livandinek çêbû. Min destê xwe dayê, tiştekî germ û biruh bû... Ji bo xeyala min xerab nebe, min serê xwe nedizîvirand û lê nedinihêrî. Ne xwe, yara ku min dixwest, hatibû kêleka min.

Dengekî xweş di guhê min de kir pise pis:

- Azîz Beg!

- Ruhê min!

- Azîz Beg!

- Berxa min!

Lê dengê yara min her ku diçû, qalindtir dibû:

- Azîz Beg!

- Emir bike, kezeba min!

- Em ê heta muduriyetê biçin!

Min serê xwe zîvirand, ez çi bibînim, tu nabêjî, ew mirovê ku min yara xwe hesibandibû, polîsê Şûbeya Yekem bû.

Min jê rica kir:

- Îro şemî ye, ez di muduriyetê de du şevan nemînim, destûrê bide, da ku ez roja duşemê werim.

Got:

- Nabe!

Min got:

- Wê gavê, ez vê bîraya xwe vexwim...

Dîsa got:

- Nabe!

Heta, bi ser de bi qasî ku ji bo dana heqê bîraya min israr bike jî nezaket nîşanî min da. Helbet, min qebûl nekir û em bi rê de hêdî hêdî û ji xwe re peyivîn û çûn. Mesele giş ev e.

A, Cenewarê Babialiyê weha hat girtin. Ez tu tiştî nabêjim, hema bila çavên Felekê birijin! Min jî got ku ji ew qas salan û vir de, ez ê şevekê ji te bidizim, te ew jî li min kir jahr û di bêvila min re anî!

# Îlawe:

Ev bûyera rast, di 1948an de di serê min re derbas bû. Em di bin zilma birêvebirina CHPê ya yekpartîtiyê de, rojên herî dijwar dijiyan.

Dû re, sîstema pirpartîtiyê ava bû. DP bû îqtidar. Tam di wê demê de, îcar zilma îqtidara DPê dest pê kir. Ji ber ku karê me, şerê li dijî çavsoran û çavsoriyê ye, me îcar berê pênûsa xwe da çavsoriya nuh.

Sal 1959... Di wan rojên ku zilm pir bûbû de, em bi çavsoran re di şerê herî dijwar de bûn. Rojekê, li mewkiya luks a keştiya ku ji Kadikoyê diçû Stenbûlê, min ew polîsê dengqalind dît, ew ê ku min di vê buyera jorê de behsa wî kiribû. Min xwe lê nekir xwedî û ez li salonê li deverekê rûniştim. Ji ber ku di ser re deh sal derbas bûbûn, min digot; ev polîs divê niha ya bûbe alîkarê qomisêr, ya jî qomisêr bi xwe.

Mêrik ez dîtim û hat li paldanka kêleka min a vala rûnişt. Dest bi axavtinê kir. Bi awayekî ecêb pesinê nivîsên min û têkoşîna min a li dijî îqtidarê dida, ez derdixistim ezmanan. Ez "ew şêr bûm ku min welat rizgar kiribû". Ew jî CHPyiyekî temam bû û çi dihat ber devê wî ji îqtidarê re digot.

Ez pir şaş mabûm, pir...

Lê tiştekî ku ji vêya hîn bêtir ez şaş kirim, çêbû.

Min got:

- Ma tu niha qomisêr î?

Got:

- Na ruhê min, ez ji zû de, ji polîstiyê veqetiyame... Ma mirov ji van rezîlan re polîstiyê dike? Ez miteahîd im...

Li ser navê xwe avahî çêdikirin. Apartman çêdikirin çêdikirin û difirotin... Lê alavên avahiyan ew qasî biha bûn ku... Bi hêsanî jî nedihatin peydakirin...

Gava ez ji pireyê bi dûr ketim, ez bi dû vî polîsê kevin û muteahîtê nuh re, bîstikekê fikirîm.

Vê bûyera ku ez ecêbmayî hiştim, kî dizane dibe ku bi we qet ecêb neyê.

# Bêhn û berata Neveserê tune ye

Xortek ket odeyê. Bi awayekî pir kubar got:

- Ezbenî, em cenabê te yê mezin î hêja, li Boxazê dawetî gera "Komeleya Akasyayan ji Sipiyan diparêze" dikin.

Berî hertiştî, vê gotina "cenabê te yê mezin î hêja" kêfa min ecêb anî. Ne xwe, em jî zilam hesibandine û vexwendine.

Min got:

- Ez pir spas dikim, gera we kengî ye?

Dawetnameyek danî ser maseyê û got:

- Li vira hatiye nivîsîn.

Min rahişt dawetnameyê, ev lê hatibûn nivîsandin:

"Ez bi hurmet rica dikim ku hûn ê tevî xanima xwe li Boxazê beşdarî gera Komeleya Akasyayan ji Sipiyan diparêze bibin ku di bin bilindhîmayeya Birêz Waliyê Serokê Partiya Yuksekkaldirimê yê Nehiyeyê de, bi mebesta alîkariya kesên ku temenên wan di biniya hîjdehan re ne, tê amadekirin.

Du kes - 15 lîre"

Gava min di bin dawetnameyê de 15 lîre dît, min fahm kir ku ne şixulê henekan e. Gelo vî xortî dixwest dawetnameyê bi pereyan bifiroşe? Na na?... Hin zen bi min re çêbûn, min got; hebe tune be, xort dixwazin ez jî di nav wan de bim.

Gava ev tişt çêdibin, Celalê me li ser maseya hember bi awayekî bêdeng, bi tinaz û bi dizîka dikeniya. Em herdu jî nivîskarên eynî rojnameyê ne.

Min dawetname bi paya zilamekî mezin xist bêrîka xwe.

Min got:

- Spas, ji bo ku we ez di bîra xwe de anîme. Ez pir mijûl im, lê ez ê ji bo hatinê hewil bidim.

Ez bi qoziya çavan li Celêl dinihêrim, bi dizîka dikene. Ji xwe ev zilam ji min diheside.

Yê xort pirsî:

- Ma yek bes e? Hûn tu dawetnameyên din naxwazin?

Min xwe di nav şexsiyetên girîng de hesiband û got:

- Hin şexsiyetên din ên ku hûn ê wan jî dawet bikin, hene.

Got:

- Me gelek çap kirine. Tu çi qasî bixwazî, ez dikarim bidim te.

- Êh, wê gavê, ger tu du hebên din jî bidî min, ez ê kêfxweş bibim.

Xorto du dawetnameyên din danîn ser maseyê.

Min got:

- Ez spas dikim.

Min li ruyê wî nihêrî, lawik li ser piyan bû û wî jî li çavên min dinihêrî. Bi qasî deqîqeyekê du deqîqeyan me li çavên hevdu nihêrî. Ez fikirîm, min got dibe ku ev xort dixwaze bi nivîskarekî navdar re piçekî sohbetê bike.

- Kerem bike, ma tu rûnanî?

- Ez spas dikim, ez te eciz nekim...

- Estexfurulah.

Xort li hember min li ser kursiyê rûnişt. Gava ew ji vira biçe ba hevalên xwe, mirov nizane, dibe ku ew ê ji wan re xweş bike, hezarî bi ser veke û behsa sohbeta ku bi min re kiriye, bike û bipesine... Ez hatime bîrê, heta vira tehebiye, sê dawetname jî dan min. Divê ez li hember vêya tiştekî bikim.

- Ma tu qahweyekê venaxwî?

- Ez spas dikim.

- Vexwe, qahweyekê vexwe...

Celal hîn jî bi dizîka dikeniya. Ji bo ku ez wî bibehecînim, ma ne înad e, min qahweyek ji wî re jî xwest. Qahweyên me

hatin û me ew vexwarin. Xort rabû ser piyan û got:

- Êdî, ez ê destûra te rica bikim.

Ez jî rabûm ser piyan.

Min got:

- Estexfurulah, ez spas dikim ku we ez anîme bîra xwe. Ger karekî min î girîng dernekeve, ez ê hewil bidim bêm. Oxir be... Kerem bike, dîsa were...

Yê xort hîn jî li hindurê çavên min dinihêrî.

Got:

- Ma ez ji bo heqê wan dû re bêm?

Bû pix pixa Celêl, destmala xwe da ser devê xwe û kuxiya. Wey lawo, sê dawetname, heryek bi panzdehan, dike çil û pênc...

Min dawetname ji bêrîka xwe derxistin, bi vî alî û wî alî de qulipandin û ji yê xort re got:

- Weyyy!... Tu bala xwe bidê, min nedîtibû; we li vê derê weha nivîsiye; "tevî jina xwe". Lê ez azib im. Ji ber vê yekê, mixabin ku...

- Ne şert e ku ileh jina te be, jineke din jî dibe.

- Weleh tu jina ku ez nas dikim jî tune ye...

- Tu dikarî bi tenê jî werî.

- Ev ger kîjan rojê bû?

- Vê yekşemê.

- Îmkana wê tune ye. Min ji bo roja yekşemê, soz daye devereke din.

- Xem nake ezbenî, tu dikarî bidî yekî din, bila ew were.

Min situyê xwe xwar kir û got:

- Wê çaxê, du dawetname bes in.

Min yek dirêjî wî kir. Destê min li hewa ma. Yê xort naxwaze wê jî bi paş de bistîne. Wek ku ez ê eydaniyê bidimê, min li bêrîka xwe nihêrî. Sîh lîreyên ku min wê sibehê ji bo

dana heqê elektrîkê awans stendibûn, dan yê xort.

Însan mexlûqekî xerab e... Bextiyariya xwe bi kesî re par ve nake, lê ger bobelatek bê serî, dixwaze herkes para xwe jê bistîne.

Min got:

- Celal, tu jî bistîne!..

Got:

- Karê min heye, ez nikarim bêm.

Min berî yê xort got:

- Armanc ew e ku mirov alîkariya komeleyeke qencîxwaz bike...

Neket feqê. Yê xort çû.

Celêl got:

- Tu pir kawik î!

- Ruhê min, ma kawiktiya vêya heye? Bi hinceta ku ez nivîskarekî mezin im, lawik heta vê derê tehebiye...

- Yaho, ew nizane bê tu kî yî, tu çi karî dikî, heta nizane bê navê te çi ye.

Êdî, min tehamul nekir. Ji bo ku ez bidim xuyakirin, bê ew mêrikekî çawa çavnebar e, min got:

- Ger weha bûya, ew ê bihata ba te jî. Rast hat ba min.

- Tu weha zanibî!...

- Tu jî weha zanibî!...

Gava min dawetname li malê nîşanî jina xwe da, bang kir:

- Ma te sîh lîre di vana de dan?

Min got:

- Na keçê, ma ez pereyan di vana de didim? Ji ber ku ez nivîskarekî bi nav û deng im, xortan ez dawet kirime.

Jina min rast çû ba cîranan. Ez dizanim ku cihê wê bûya, ne cihê wê bûya, wê minasebetek peyda kiribû û bi vî awayî

xebera ku dibêje; "Vê yekşemê, mêrê min hatiye dawetkirin. Em ê biçin Boxazê", li hemû taxê belav kiribû. Ya rastî, min jî ev dawetname êvarî li qahwexaneyê nîşanî hevalan dabû, bi rê de min pêş kesên ku ez li wan rast dihatim, kiribû. Heta min rêyek peyda kiribû û di dolmîşê de, nîşanî yên kêleka xwe jî dabû. Ez ji we venaşêrim ku ez pesinîbûm û bi awayê xwedê-giravî, ji bo min qet ne grîng e, min gotibû:

- Xortan ez dawet kirime... Meslekê me yê rojnamevaniyê weha ye, em ji dawetan nikarin serê xwe rakin!...

Ên ku malbata me nas dikir û nas nedikir, hemû pê hisiyabûn ku em wê yekşemê dawetî gera li Boxazê ne.

Yekî me heye, navê wî Ihsan e. Hîn ji dibistanê hevalê min e. Hertim min piçûk dibîne û dibêje ku tu bi kêrî tu tiştî nayê. Çawa be, du dawetname hene... Min ew jî wê yekşemê dawet kir.

Li paşiya karta dawetnameyê, weha hatibû nivîsîn: "Divê mirov saet di heyştan de, li keştiya Neveserê ya ku dê ji ber pireyê rabe, siwar bibe!" Bi rastî jî em rast çûn mala Îhsên û me ew jî bi xwe re hilanîn. Em saet di heft û nîvan de hatin ber pireyê. Êdî ez ji Ihsên re bi erîna malê têmê:

- Birayê min, karê min jî pir e... Sîparîşa du romanan di destê min de ye, min hîn jî ew neqedandine. Ez nikarim ji dawetan serê xwe rakim ku... Ez neçim, nabe, ew ê xwe bixeyidînin...

Di navberê re çend deqîqe derbas dibin:

- Meslekê me weha ye. Do êvarî, Serokwezîr rojnamevan dawetî Parkotelê kiribûn, min zêde vexwaribû, ez sibehê bi zorê rabûm...

Saet tê heyştan. Neveser xuya nabe. Gidî, ma ne li îskeleya Uskudarê be... Ne li wira ye jî... Ne li îskeleya Adayê ye jî...

- A weha Ihsanê min, pêr, Walî rojnamevan dawetî nav

xerzên Buyukdereyê kiribûn. Me xoxin weha xwarin ku baweriya te bi Xwedê hebe, heryek bi qasî serê min bû.

Saet heyşt û nîv... Êh, ma hayê te ji tarîfeyên ba me tune ye, ruhê min?

Bila ev Ihsan baş fêhm bike, bê ez zilamekî çawa me...

- Şeva berê, sefîrê Haîtiyê ez dawetî Yeşîlkoyê kiribûm. Di eynî êvarê de, ez dawetî civîneke navneteweyî jî bûm. Ma ger tu bûya, tu ê biçuya kîjanê, Ihsan? Min jî weha kir. Ez nîv saetê li yekê mam û nîv saetê jî li ya din.

Yaho, saet deh... Ev Neveser li ku ma? Zarokan dest bi min minê kir... Ez di navbera hemû îskeleyên ber pireyê de, bi bazdan diçim û têm, behn û berata Neveserê li meydanê tune ye... Min weha li qelebalixê nihêrî. Di destên hemuyan de, dawetnameyên wek ên me. Herkes li benda Neveserê ye. Hin dibêjin; "Weha xuya ye ku em hatin xapandin!...", hin xeberan didin, hin hîn dipên, hin jî vedigerin.

Saet yek û nîv... Ez bi carekê hêrs bûm. Çawa be, em rojnamevan in. Ez ê niha rê wan bidim. Ger em hatibin xapandin, bi navê Xwedê, ez ê bavê wan bişewitînim. Ez bi xezebekê ketim odeya Gerînendeyê îskeleyê. Gava mêrik çav li dawetnameya di destê min de bû ket, hîn berî ku ez devê xwe vekim, keniya û got:

- Ma ne Neveser e, begê min?

Min got:

- Belê, hîn bêhn û berata Neveserê tune ye!...

Gerînendeyê îskeleyê got:

- Keştiya Neveserê, berî niha bi panzdeh salan bûye xurde. Mekîneyên wê jî firotin Holandayê, bingeha wê li Xelîc e, li pêşiya Ayvansarayê ye...

Ez derketim derve.

Ihsên pirsî:

- Çi bûye?

Min got:

- Saet heyştê wan, heyştê êvarî ye. Ew ê bi keştiyê derkevin temaşeya mehtabê.

Dawetiye di destên wê qelebalixê de bûn û ew hîn jî li hêviyê bûn.

Gava mirov ne bi tenê be, kawiktî li mirov sivik dibe. Kêfa min hat ku ji derveyî min jî kawik hebûn.

Em li keştiyeke din siwar bûn û çûn Kuçuksuyê. Heta ku em gîhaştin malê, min ji Ihsên re her çîrokên dawetnameyan gotin.

Gava ez êvarî hatim buroya rojnameyê, Celêl ji min pirsî:

- Ger çawa bû?

- Te çi kawiktî kir ku tu nehat... Haho, me çi kêf kir, çi kêf... Çardeh kesên bi sazên dengzirav li aliyekî, cazeke peyv jê re heram e, dans, sitran, xwarin... Hemû dengbêj li wê derê bûn. Sîh lîre xweş helal bin... Bi Xwedê, mirov nikare bi sed lîreyî wê kêfê bike...

Celêl got:

Nûçegîhanekî ev xeber anî, ka serikekî jê re peyda bike, em di rûpelê yekem de biweşîne.

"Sextekariyeke nuh. Şebekeyekê navê komeleyeke qencîxwaz bi kar aniye û di bin navê gera Boxazê ya bi keştiya Neveserê ku bîst sal berê xurde bûye de, bi hezaran hevwelatiyên kawik xapandine. Li ser giliyê gel..."

Min nikarîbû dawiya wê bixwenda. Min xwe ji Celêl vedizî û ji alîkarê sekreterê re got:

- Ez nexweş im, ez ê nikaribim îşev bixebitim!

Ez çûm malê.

# Bextiyariya min bi saya serê te ye

- Ezîzê ber dilê min, min pîrekek nas kir, qet ne pirse...
- Ma pir xweşik e?
- Tu çi dibêjî, keko... A va, binihêre, sûretê wê jî heye.
- Bi rastî pir xweşik e!.. Ji destê xwe nerevîne.
- Ma ez ji destê xwe direvînim, lo!.. Tu li çavên min binihêre.
- Ma rû dide te?
- Heta tu bibêjî bes...
- Hewil bide, da ku dilê wê têkeve te!..
- Ez ê hemû hunerên xwe bi kar bînim.

***

- Xeber çawa ne, çi heye, çi tune ye?..
- Weleh, başî... Min wê rojê behs kiribû ku jinikek heye...
- Êêêê?..
- Agir bi kezeba min ketiye. Ez bi ser wê de dîn dibim.
- Ma ew jî ji te hez dike?..
- Ez nizanim.
- Xwe bide hezkirin!
- Ez ê çawa xwe bidim hezkirin?
- Tu dizanî ku tecrubeyên min gelek in. Diyariyan bikire. Jin ji kulîlkan hez dikin. Nemaze qerenfîl, tew ên sor... Dû re ezbenî, diyariyên biha jî bikire... Ha, di nav re carê bibêje ku ew pir bi aqil e. Jin ji pesinandinê pir hez dikin.
- Ez ê bi a te bikim.

***

- Ax... Ez nizanim, bê ez ê çawa spasî te bikim.

- Çi bû?...

- Ezîzê min, tu ji ruhê pîrekan fahm dikî. Min reçeteya te tetbîq kir. Jinikê dest pê kir û rû da min. Ji bo xatirê Xwedê, bibêjî, bê ez wekî din çi bikim?

- Wê bibe sînemayê, lê nebî nebî, bila ne filîmekî cidî be. Bila an filîmekî pir dilşewat, an henekên besît û ne di cîh de, an jî muzîkal be. Gava tu ji sînemayê derket, mitleqe rêya xwe bi pastexaneyekê bixe. Dondirmeya bivanîlya bixwaze. Bila miheqeq bi vanîlya be. Dû re, ji bo îkramkirinê, bila libên çîkolota hertim di bêrîka te de hebin, ji bîr neke!

- Tu bibêjî çi, ez ê wek te bikim. Ez bi ser vê jinikê de, dîn dibim.

***

- Min do ew bir sînemayê. Min li sînemayê, libên çîkolotayê danê, ew bi ser de dîn bû. Piştî sînemayê, em çûn pastexaneyekê, min dondirmeya bivanîlya xwest. Ji min re got; "Tu mêrekî weha ye ku tu tahma devê xwe dizanî". Em ê vê hefteyê ji bo gerê biçin deverekê, ji bo xatirê Xwedê, bibêjî, ma ez wê bibim ku?

- Ger tu ji min dipirsî, wê bibe Buyukadayê. Bi kerê bigerin. Dû re, bireqisin. Lê wê bi tenê di valsan de rake reqisê.

- Ax Xwedêyo... Ger ez vê jinikê carekê bi dest bixim!..

- Wek min bike, tu ê wê bi dest bixî.

- Weleh, ez nizanim, bê ez ê çawa spasî te bikim.

- Estexfurulah... Ez bi tenê, ji te re behsa tecrubeyên xwe dikim, ew qas.

***

- Çawa bû, hûn hefteya berê, çûn gerê?

- Em çûn... Haho, me çi kêf kir. Lê ez nikarim bigihêjim netîceyê.

- Ji bo çi?

- Zewicî ye! Em bêyî ku tu tiştî bikin, bi tenê digerin.

- Ma ji mêrê xwe hez dike?

- Na lo, li gora ku ew dibêje, mêrekî wê yê wek keran heye. Bêaqilekî dera hanê ye. Ji ruhê pîrekan qet fahm nake, yekî dinyanedîtî ye.

- Wax, li jinika reben! Ji bo çi xwe nade berdan?

- Ji min re dibêje ku ger min bikarîba bawerî bi te bianiya, min ê îro xwe bida berdan. Ax, ez ê çawa bikim, ez nizanim...

- Dev jê bernede.

***

- Çi bû? Ma we karê xwe piçekî bi pêş de bir?
- Nepirse... Min hîn ew carekê jî maçî nekiriye. Pir şermokî ye. Lê ez his dikim ku ew ji min hez dike.
- Kirîna diyariyan bidomîne. Mesela, losyonên xweş bikire. Nemaze ya navê wê Skandal e, bikire. Dû re, mesela ez çi dizanim, perçeyekî qumêş bikire. Piraniya pîrekan ji rengê şîn hez dikin, şînê vekirî.
- Lê, ger mêrê wê bê?
- Ew ê ji ku bê? Tu nabînî ku jinik dibêje, yekî ehmeq e... Ger tu bixwazî, ez ê qumêş biecibînim.
- Bila... Ez ê tavilê bikirim!...

***

- Rewş çawa ye?
- Pir baş diçe. Gava çav li losyonê ket, got ku ev e, ew bêhna ku ez jê hez dikim. Rengê qumêş pir eciband. Lê keko, em hîn wek zarokên dibistanê ne... Ji min re bibêje, bê ez ê vê jinikê çawa bi dest bixim?
- Ji Yahya Kemal helbestan jê re bixwîne... Jê re bibêje ku ji mêrê xwe veqete û em ê bizewicin...

***

- Tu ji zû de nexuya yî, tu li kî derê bû?

- Ez nikarîbûm bihatama. Kar mezin bû. Jinikê xwe ji mêrê xwe da berdan.

- Ma hûn ê bizewicin?

- Ji xwe...

- Gidî, bila wext derbas nebe. Çi dibe, çi nabe...

***

- Ez nizanim, bê ez ê çawa spasî te bikim. Em do zewicîn. Bextiyariya min bi saya serê te ye. Ez bi saya te zewicîm.

- Ya rastî, ez spasî te dikim, birayê min. Bextiyariya min jî bi saya serê te ye. Ji ber ku ez jî bi saya te, ji jina xwe veqetiyam.

- ..............!!!

# Naverok


Bazarek 5

Maşaleh ji kirêdêr re 9

Xaniyê li ser sînor 37

Fîl Hemdî çawa hat girtin 46

Basriyê Strîp-tîz 52

Keçikek roja mahrbirînê reviyabû 59

Polîsê ruhamator 65

Yepetaş 74

Mirêkên bimûcîze 80

Li plajê mêrikek fetisî 87

Hişê xwe bi pêş de bibin 91

Febrîqeya beroşên bipispîsk 96

Ez şelafiyê naxwazim 100

Doktorê esaban 110

Dizan ji dizan dizî, erd û ezmanan lê pirsî 115

Kilît 120

Divê serokê belediyeyê çawa be 127

Çete 133

Cenewarê Babialiyê 138

Îlawe 142

Bêhn û berata Neveserê tune ye 144

Bextiyariya min bi saya serê te ye 152

# Fîl Hemdî · Azîz Nesîn



Qet bila gumana we jê tunebe ku ev werger di çêja kurdî de ye. Azîz Nesîn bi vê wergerê bûye kurd. Pêdiviya kurdî jî bi nivîskarekî weke wî hebû. Em hêvîdar in ku ev werger dê di dahatûyê de Azîz Nesîn'ên nû biafirîne. De ka em jî bi nivîskarê xwe re bibişirin û biponijin.

ISBN 975-6876-10-7